DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

**https://rantey.org**

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

YAŞAR KEMAL

# ÇÎYAYÊ AGİRÎ



Weşanxana Çanda Kurdî

YAŞAR KEMAL

# ÇÎYAYÊ AGIRÎ

Wêne: Abidin Dîno

Kurdiska Kulturförlaget / Weşanxana Çanda Kurdî
Box: 161 39, 103 23 Stockholm - SWEDEN

© Yaşar Kemal
Wêne: Abîdîn Dîno
Wergêr: Şerefnaz
Çapa Kurdî: Weşanxana Çanda Kurdî 1990 - Swêd

ISBN 91 861 46 31 9
Bohusläningens Boktryckeri AB, Uddevalla 1990

YAŞAR KEMAL

# ÇÎYAYÊ AGİRÎ

Weşanxana Çanda Kurdî





Li navsera çiyayê Agirîyê di bilindahiya çar hezar û dused mîtroyan de, bi navê Gola Kûpê, goleke biçûk heye. Gol di kûranî dê ye û firehiya wê bi qasî cihê bênderekê ye. Ne gol e çal e. Çarmedora golê ango çalê bi kevirên birqonekî sor û wek devê kêrê tûj hatîye pêçandin. Di nav axa qehweyî de a ku ji aliyê zinaran berbi sarincê teng dibe û tê, şivarêk çêbûne. Li ser axa rengxwedî cîh cîh çîm şîn bûne. Piştî wê, şînayiya golê destpêdike. Ew , ne mîna şînayiyên din e. Li tu avan û li tu şînaniyan, şînayiyeke ûsa nehatiye dîtin. Şînekî tarî nerm û qedîfeyî.

Hersal gava berf dihele, bihar destpêdike, û li çiyayê Agirî tezebûnekî mezin bejn dide, dora golê bi kulîlkên kin û qalîn ên ku ji bin berfê derdikevin, dixemilin. Rengê kulîlkan heya tu bixwazî birqonek in. Biçûktirîn kulîlk jî, li wir di rengê xwe de, wek ronahiya rengan ji dûr ve, şîn, sor, zer û mor dibiriqe. Û bîhneke giran difûrîne. Ji ava golê a şîn û axa qehwerengî bihnek difûre ku meriv pê bêheş dikeve. Ji dûr ve, ew bêhn tête pozê merivan.

Û hersal gava li çiyayê Agirî, bihar têt, bi kulîlkan, bi axa qehwerengî, bi bêhn û rengê xweş ve, şivanên çiyayê Agirî ên çeleng çavreş û çavxemîn û girs jî bi tiliyên xwe ên zirav û dirêj radihêjin bilûrên xwe, û tên ser gola Kûpê, li bin zinarên sor, li ser axa qehwerengî û li ser pişta bihara hezar

salî, kulavên xwe radixînin û li çarmedora golê rûdinin. Hîna beriya ku tîrêjên rojê bavêjin di bin çurusîna ronahîya stêrkên Agirî ên kombûyî de bilûrên xwe ji milên xwe dadixin, dest bi lêdana strana hêrsa Agirî dikin. Ev ji berbangê heya roj diçe ava dem dike. Di vê navberê de, tam dema ku roj diçe ava çûkekî biçûk, mîna berfê sipî li ser golê difire, doş dibe. Çûk zirav û dirêj e û dûrvê hechecikê dide. Li ser golê pir bi lez dizivire, li ser hev xelekên sipî û dirêj çêdike. Ew xelekên sipî têl têl dikevin nav şînayiya golê. Dema roj diçe ava bilûrvan dev ji lêdana bilûrê berdidin, bilûran davêjin ser milên xwe û radibin. Çûkên ku li ser golê difire jî, bi hemî hêza xwe, wek brûskê xwe bera ser avê dide. Baskên xwe li ava şîn dixe, radibe û bi wî awayî sê caran dikeve avê û derdikeve. Piştre jî difire û diçe, ji ber çavan wenda dibe. Piştî çûyîna çûkê, Şivan jî bêdeng yeko-yeko, dudo-dudo ji golê bi dûr dikevin û di nav tariyê şevê de winda dibin.

Ji êvarê ve hespekî boz li devê deriyê Ehmed rawestiyabû. Stuyê xwe dirêj kiribû, bi firnikê pozê xwe ê fireh mîna ku textê deriyê ku cîh cîh qelişî bû, bihn dikir. Berî herkesî, Sofiyê rîh sipî û rîh dirêj ew hesp li ber deriyê Ehmed dît. Li ser pişta hespê zînekî çerkezan ê bi zîv neqişandî hebû. Zengûyên wî bi zîv neqişandibû. Sofî bi xwizika pişta xwe berbi hespê ve çû û nêzîkî wî rawestiya.







Hevsarê hespê bi sîm neqişandibû û ji xelekan zîn a ku ji zêr û sedef çêkirîbû, derbas kiribû. Di bin zîn de kulavekî ku xweşbûna neqişa wî ji dûr ve diyar dibû, li ser pişta hespê bû. Li ser wî kulavî bi tayekî reng portaqalî wêneyekê kevin a royê çêkiri bû. Li paş wêneya royê, jî dareke kesk a jiyinê bilind dibû. Li aliyê çepê jî her waha wêneyên ro û darê hebûn. Kêm zêde dihat bîra Sofî ku wî ew ro û dar li bin ciyan dîtibû. Diviya ew wêneyên han, nişana êl malbe-

tekê navdar bibûna.

Sofî demekî, bi tirs û terilî û bi şaşmayî nêzîkî hespê bû, bêdeng rawestiya. Gelo ev mîvanê mezin û bişan ê ku hatibû mala Ehmed kî bû? Di bîra xwe de ew damxe bir û anî, lê peyde nekir ku ev nîşan a kîjan ezbet, beg û paşayî bû? Hew, wê nîşanê tirs xistibû dilê wî. Nîşanên welê herdem bê xêr dibûn. Û herdem bi tirsekê dihatin bi tirsekî diçûn.

Li wan doran kesekî ku xwediyê hespekî ûsa bûna, tunebû. Paşê Sofî nîşana hemî ezbetên vê hêremê jî dinasîn.

Bahar bû, û berfa çiyayê Agirî dest bi helînê kiribû. Li jêr, cîh cîh serê zinarên sor ji bin berfê derdiketin, kulîlkên berfê ên zer zîl dabûn. Li ezmên refên qulîngan li pey hev derbas dibûn û berbi gola Wanê ve diçûn.

Haya Ehmed ji tiştekî tunebû. Di ronahiya berbangê de ji hundur dengê bilûrekê dihat. Sofî ji kevin ve dengê vê bilûra xweş dinasî. Bapîrê Ehmed Sultan Axa jî, bi vî awayî li bilûrê dixist. Bavê wî Resûl jî... Hîna kesekî ku ji mêrên vî malbatê xweştir li bilûr xistana ne hatibû Çiyayê Agirî. Dibe ku ne hatibû cîhanê jî. Heger Sofî waha bigota, dê di cîh de bibûna ji ber ku sofî bi xwe jî bi bilûrvanîya xwe, li vê Rohilatê, Qefqasê, Îran ve Tûranê nav dabû.

Sofî hinekî din nêzîkî hespê bû. Hîn pirtir ji nêzîk ve bala xwe da nîşanê. Weke ku hespê gudariya dengê bilûrê ê ku ji hundir dihat, dikir, guhê xwe pel kiribû. Ehmed ji straneke kevin ya Agirî dixist. Sofî ew strana fêrî hemî bilûrvanên Agirîyê kiribû.

Hespê stûyê xwe baş ber bi deng ve dirêj kir. Sofî jî... ji demeke dirêj ve, ne li wê stranê xistibû ne jî guhdarî kiribû. Çiyayêkî ewçend mezin çawa dikaribû ji dengê bilûrekê ev çend hêrs bibûna. Sofî di nav van ramanên seyr de mabû, diramiya û digot, heş û mejî nagihê karê mirovan. Çawa dikarin bi bilûrekê ewçend biçûk û zirav dengê çiyayekê xumxumîn û ewçend mezin derxînin. Heya ku ev

mirovên ha, li vê cîhanê bijîn, ji firîna qertelê bigire heya Moristanê, ji derketina heyvê, rojê heye çûna wan a ava, ta mirin û mayinê dê bikaribin hertiştî binasin. Dê aqil bigihênin rohnî û tariyê dê bigihênin hemî tiştî, hemî tiştî, lê hêza wan dê têra mirovan neke. Lê nikaribin bigihên sirra wî.

Û ciya di nav bilûrê de diherikî, zinarên bilind, şîp, şevên sayî û stêrik diteqîyan. Rohniya heyvê, diteqîya û çiya bi hemî heybeta xwe dimeşîya. Xwêdayî û bêhnçikyayî... Agirî mîna dêwekî girs bêhn dikişand. Sofî hilmkişîna Agirî ji pir kûr ve dibihîst. Berbi navçeyê cîhanê; dengekî pir kûr û dûr dihat. Her ku Ehmed lêdixist, hêrs û bêhnkişîna çiyê bilindtir dibû. Di demên waha de Sofî guhê xwe datanî ser axa çiyayê kelgirî. Her bi her çiya hîn bêhtir hêrs dibû. Bêhna wî kûr dibû, pir dibû, carekê radibû, carekê dadiket, parçe parçe dibû û bi hemî hêz û xişma xwe, xwe bera ser cîhanê dida. Piştre jî bêdengiyeke mezin diket nav cîhanê. Her alîyê cîhanê tenha dibû. Cîhan vik û vala mabû, çiyayê Agirî serê xwe girtibû ji vê cîhanê çûbû. Gur, teba, mirovên xwe, stêrik, heyv, roj, ba, baran, berf û kulîlkên xwe jî girtibûn, bi xwe re biribûn. Ev cîhan vala hiştibûn.Ji çolan kerîyên pêzkoviyên xwe ên çavbikil jî girtibûn û biribûn.Jidengê bilûrê de tenhanyî û bêdengiyek vejiyaû.

Piştre, ji nişka ve cîhan, bi kulîlk, stêrk, bêhn, ava Sofî, masî û bi destên ahûyan ve li ber çavên Sofî ji nuh ve hatibû guhertin. Ew hespê ku li pêş çavên Sofî bû, hatibû guhartin. Ew wêneya royê a ku li ser pişta kulêv hatibû çêkirin, bican bûbû. Dara jiyinê a ku li paş wê rojê bû, kulîlk vedan, pelên xwe vekirin.

Dengê bilûrê bîstekê hate birîn. Ro jî ji paş çiyayê Agirî mîna qursikekê sor derketibû.

Sofî hat ser heşê xwe. Carekê li hespê carekê li derî nêrî. Hêsp jî serê xwe bilind kir. Bi çavên xwe ên girs û xemgîn

li Sofî nêrî. Tirseke bêhoy ket dilê Sofî.

Sofî deng li Ehmet kir û got:

"Ehmed! Ehme!"

Ehmed dengê Sofî nasî. Ji wî re derî vekir û got:

"Fermo xalo".

Ehmed dema hesp dît, pêşî şaş bû. Paşê carekê li hespê carekî li Sofî nêrî.

Sofî got:

"Mîvanê te kî ye Ehmed? Bi xêr û xweşî hatiye"

Ehmet got:

"Mîvanê min nîne."

Herdûyan li hespê nêrî. Hesp ji ber derî çû, carekê li dora malê zivirî û hat li ber derî rawestiya. Hespekî dirêj û girs bû. Guhên wî tûj û nîç bûn. Serê xwe berbi ezmên hilda weke ku dixwest biîre lê nehiriya

Mala Ehmed li bin zinarekî bû. Bi kevirên sor, girs, û neşikyayî ava bûbû. Derîyê wê mezin bû û tenê pencereyek wê hebû.

Sofî ramiya, Ehmed ji ramiya.

Sofî got:

"Ev hesp qismetê te ye"

Ehmed got: "Belê mafir ew hatiye li ber derî rawestiyaye. Lê gelo ev hesp ê kê ye?

Sofî: "Li ser kulavê wî nîşana wî heye. Min pir ji kevn ve, li cihekî ev nîşan dîtiye. Divê, ev nîşana cîhekî belafiroş û tirsdar be. Lê ê kê dibe bera bibe, ev hesp ê te ye. Ji ba xwedê ji te re diyarî hat.

Ehmed got: "Ji ba xwedê..."

Ma gelo ev belayek bû yan kêfxweşîyek bû?

Sofî, guherîna ruyê Ehmed dît û got:

"Ê kê dibe, bera bibe, ev hesp ê te ye. Lê belê ev nîşan ji min re ne biyanî ye. Ev nîşan ji rojên pir kevn maye".

A duyim jî hespê ku xemla wî ûsa be, ne hespê herkesî



ye...

Sofî got:

"Pir mefikire, hespê bikşîne, bibe vê riya jêr berde û vegere, heger hesp vegerîya careke din bibe, sê caran waha bike, û gotina xwe ajot:

"Heger careke din hesp vegeriya ev hesp ê te ye: Xwedîyê hespê yekî mîr be, paşe be, padîşahê Osmanî, şahê Ecem, Koroglî be jî, ev hesp nayê dayin. Tu dikarî serê xwe bidî lê wî nedî. Em jî nema wî didin."

Roj derket, giloka ewrên tarî vebû. Tîrêjên ronahiyê xwe bera ser tariyê dan. Ehmed hesp girt, hesp bêdeng bû, suwarê hespê bû û berê wî da riya jêr. Li wir, hesp bera da û vegeriya, dema vegerîya ku çi bivîne, dît ku hesp li ba Sofî rawestyaye. Sê caran ew kir dûbare kir. Her sê caran jî hesp vegerya.

Ehmed got: "Tiştên ku tê serî, mirov dikşîne."

Çawa bibûna, xwediyê vî hespê dê rojekê li hespê xwe bigeriyana. Êdî xwediyê hespê kî bibûna bera bibûna Ehmed nema dikaribû hesp vegerandana. Serê xwe dida lê hesp nedida wî.

Hesp kişand axûr. Him bi kêf him jî bi tirs bû. Ji roja ku xwe nas kiribû heya nuha hespekî ûsa xweşik nedîtibû.

Sofî: "Heger xwediyê hespê yekî bêbav be û bibêje, teqes ez hespê xwe dixwazim dê şer derkeve. Dema serê Agirî germ be bi cîhanê re şer dike." Ji bo vê yekê kêfa wî hat.

Ehmed jî bi wî re got:

"Şer dike".

Berê gundîyên wan bihîstin ku hespekî kihêl hatiye li ber derîyê Ehmed rawestîyaye. Gundî hatin hesp dîtin. Paşê gundên nêzîk û hemî xelkên dora Agirî bihîstin, û hatin hesp dîtin. Di demeke kurt de navûdengê hespê gihaşt Îran û Turanê. Herkesî li gora xwe rewşa Ehmed û çûkê dewletê û ku hatibû xwe li ser serê Ehmed danîbû, şîrove

dikir. Hinekan ev tişt bi başî şîrove dikirin, hinên din jî bi şer...

Piştî li deşta jêrîn, li Qerakilisê, Gîhadîn û Ixdirê Begên Kurd bihîstin û hatin dîtina hespê. Xweziya xwe bi bextê Ehmed anîn. Demeke dirêj ji xwedîyê hespê deng derneket.

Ehmed, hogirên xwe li dora xwe dicivandin, suwarê hespê xwe dibûn ji bo talanê diçûn Îranê, talan dianîn. Te mal bigota, mîh û hesp bigota, hemî tişt dianîn, çiyayê Agirî.

Lê Ehmed di gumanan de bû. Xwediyê vî hespê kî bibûna jî dê rojekê derketana. Gelo ew kî bû? Dibe ku mîrekî çavbixwîn û serhişk bû. Dibe jî yekî tirsok û bêkerî bû.

Di ser re şeş meh derbas bûbûn. Êdî Ehmed, tirs, şik û kêfa xwe ji bîr kiribûn.

Rojekê, serê sibê, dema ku rojê tîrêjên xwe ên tûj bera ser Agirî dabû, Sofî gopalê xwe li erdê dixist, rîha wî ya sipî û dirêj dilêrizî, û dihat nik Ehmed.

Sofî pirsî: "Te bihistiye."

"Paşayê Beyazidê Mehmûd Xan, li hespê xwe digere".

Ehmed got: "Belê min bihistîye".

"Kî hespê ji paşê re bibe, paşa dê ji wî re pênc hespên kihêl û pêncî zêran bide."

Ehmed "Belê" got.

"Ew, hespê li mala kê û di destê kê de bigire dê serê wî jêbike."

Ehmed got: Ew çi bikin, hesp qismetê min e".

"Ew dê ordiya xwe bigire û were ser me".

"Hesp qismetê min e".

"Mahmût Xan paşakî zordest e.".

"Hesp qismetê min e"

Meriv bi Mehmût Xan re nikare qayişê bikşîne".

"Hesp ji min re diyariya xwedê ye."

"Mahmût Xan nizane maf û diyarî çi ye. Ew bûye Osma-

nî".

"Hesp diyariya min e".

Di ser re mehek derbas bûbû, ne bûbû peyayên Mahmût Xan hatin mala Ehmed. gotin:

"Paşa dibêje." "Çi dixwaze bera bixwaze, ji mal, ji pere çi hildiçîne bera hilçîne, lê bera hespê min bide. Mafir hespê min reviyaye, çûye ber deriyê wî rawestîyaye, ew çi bixwaze, ez dê bidimê."

Ehmed: "Ma xan nizane ku hesp ji min re diyarî ye. Hespê ku diyarî bûye, ji kesekî re nayê dayîn. Serî têt dayîn lê hesp nayê dayîn. Ma paşa vî nizanê?

"Paşa vê dizane, lê dîsa jî hespê xwe dixwaze. Ev hesp ji wî re jî diyarî hatibû. Begê Zîlan ê ku paşa bi qasî birayê xwe jê hez dikir, ji wî re diyarî kiribû."

Ehmed qutebir got:

"Paşa çi dixwaze bera bixwaze, ji malan, mal, ji canan, can, lê ez diyariya xwe nadim wî."

Peyayên paşê gotin:

"Paşe got ku bera Ehmed pişta xwe bi wî çiyayê mezin, û hîn kesên serserî ên ku li dora wî civiyane girênede. Ez dê çiyê û merivên wî ên ku li dora wî ne, bi erde re bikim yek . Bi rastî jî, ji wî têt."

Piştî wê Ehmed hîç ne peyivî, Sofî jî nepeyivî. Û peyayên paşê destvala û bi hêrs vegeriyan û çûn.

Gundên hawirdor, begên Kurd, ên çavbixwîn li dora Ehmed civiyan û gotin:

"Kê dîtiye" "Hespê ku ji bo xwedê diyarî hatiye, paşde were zivirandin. Xwedîyê vî hespê beg be, jî, axa be jî nema ew hesp têt vegerandin.

Ehmed got: "Kê dîtiye..." û hew peyivî.

Paşê ev hêvî ne dikir. Dema bersîva Ehmed girt, ji hêrsan dîn bû. Paşê tore zanîbû. Heger hespê padişahê Osmanî yan jî Şahê Ecem bihatana ber deriyê wî rawestiyana ,

wî bi xwe jî, dê mirin bigirata çavên xwe û hesp li xwediyan venegerandana. Nikaribû vegerandana jî. Lê ew Ehmed, ev çiyayîyê mirdar jî kî bû?

Wî dê hespê xwe bigirtana. Saray xist nav lêbike. Peya û serbazên xwe li hev ciwandin lê negihaştin tu biryaran. Ji ber vî hespî hemî xelkên çiyayê Agirî dê li pêşberî wî rawestiyana. Ehmed ne bi tena xwe bû.

Paşê ji hemî begên Kurd ên ku dostên wî bûn û wî nedişikandin, gazî bir. Begên Wanê, Patnosê, çiyayê Suphanê, Mûşê û Bêtlisê. Hemî beg li hespên xweşik suwar bûn û hatin. Mehmût Xan bi rumeteke mezin ew hewandin. Mêvanên xwe, bi rumeteke ku heya nuha li cîkî din ne dîtibûn hewandin. Piştre, civat gerand û bobîlata ku hatibû serê wî ji wan re got:

Mahmût Xan digot:

"Yekî çiyayî, rêbir û zarokê doh hespê min dizî û tiştên bê rê anîn serê min".

Kesekî ji wan nikaribû manayê diyariyê bi paşê bidana fêm kirin. Newêrbûn bibêjin ku, serê hemî mirovên çiyayê Agirî dikare bête birîn lê ew hesp careke din bi paşde venagere. Her bêdeng man. Her ku begên Kurd bêdeng man, paşa jî hîn pirtir bêhnteng bû, dawiyê gotina xwe girêda û got:

"Wî hespê ji we dixwazim."

Begên Kurd bê dilê xwe ji Ehmed û mirovên çiyayê Agirî re qasid şandin. Ehmed hesp neda wan jî. Tevî nedana hespê hin gotinên giran jî ji wan re bi rêkir û got.


"Ma ew nizanin ev hesp dîyarî hatiye û li ber derî rawestiyaye. Hespê ku sê caran ji malê hatibe dûrxistin û hersê caran jî vegeryabe, ji kesekî re nayê dayîn. Ev hesp ne ê min e, ev hesp hatîye serê çiyayê Agirî. Ev qismeta çiyayê Agirî ye. Ew ên ku beg in, çawa dikarin û çawa zimanê wan digere hespê me bixwazin? Ew ne beg in, ew koleyê paşê



ne.

Begên Kurd bi van gotinên Ehmed ne êşîyan û dilteng nebûn. Gotin, xelkên çiyayî rast dibêjin. Lê çara tunebû. Paşê dê ji bo hespê xwe hemî tiştî bikirana.

Gava paşê ji begên Kurd bersîveke erênî negirt, xwe ji bo êrîşê amade kir. Leşker civand, begên Kurd jî girtin nik xwe û berê xwe da çiyayê Agirî.



Dem payiz bû, kuntara çiyayê Agirî mîna êgir dişewitî. Zinarên sor, û mor, kevirê axa bej ê pûç di bin nalên hespan de mîna avê bi xuşexûş diherikîn. Rojekê ber êvarê gîhaştin gundê Ehmed, Sorikê. Gund vîkî vala bû. Canek jî li gund tunebû. Li gund rawestiyan. Paşê, ji bo şewitandina gund ferman da û agir berdanê gund. Ji nav malên ku dişewitîn kalekî ku rîha wî bi tenî reşbuyî derket. Birûyên wî ên dirêj çavên wî veşartîbûn, şal û çapikekî pir nûh bi tayê şîn neqişkirî li xwe kiribû. Derket pêşberî paşê. Ew mêrik Sofî bû. Bi awirên tûj tûj li paşê nêrî. Çavên wî ên qertelî wek brûskê pêdiketin. Kal got:

"Paşa ew tişt hemî ji bo hespekî ye?" û domand "Ji roja ku cîhan bûye cîhan, kê hespê ku hatiye li ber deriyê wî rawestîyaye bi paşde vegerandiye? Ma tu vê nizanî paşa? Tu

bûyî Osmanî? Ana na ji bo hespekî, te ev tişt ne dianîn serê me, me ne dişewitandin û wêran nedikirin. Nalet û xezeba Agirî li serê te be paşe. Ez bavê te dinasim. Ew begekî mêr bû. Tu bûyî paşa. Te xwe ji bîra kir paşa. Bavê te hespê diyarî ji kesekî nedixwest. Heger hesp biçûna ber deriyê jinebîyekê, zarokekî yan, dizek û xizanekî rawestiyana, dîsa jî ji wan nedixwest. Bavê te beg bû. Tu bûyî paşa. Xwelîyê Agirî li serê te be."

Paşa bersîv neda hew got:

"Destên wî girêbidin, lalekê derbasî hustyê wî bikin û wî bavêjin zîndanê."

Li kuntar û binê çiyayê Agirî pir gund hebûn Mehmût xan, begên Kurd, peyayên begên Kurd û leşkerên Mehmût Xan gund bi gund digerîyan. Digihaştin kîjan gundî, gund vala dîditîn. Mirov digot qey lingên mirovan bi van gundan nebûye. Paşê her ku gundekî vala didît, har dibû û digot:

"Ala serhildanê vekirine" û kef bi devê wî diket.

Paşa mervekî pir dirêj bû. Rîha wî reş û xelek xelekî bû. Pozê wî wek dimikê qertelê nikilxwar, çavên wî reş bûn. Ji her rewş, helwest û peyiva wî, ji hejandina destên wî, bi xwe bawerbûnek diyar dibû. Pir kêm dipeyivî û her diramiya. Bi gavên xwe ên dirêj wek kabûsekî dimeşiya. Di nav kurkên samûr de her xwedan dida.

Ji deşta Ixdirê derbasî Başköy bûn. Newala Ahûrî derbas bûn, çûn deşta Ahûrê. Rastî kesekî, şivanek, rêwîyek û rêberekî jî nehatin. Heya rastê tebayekî bican hirc, rêwî û pilingekî jî ne hatin. Weke ku cîhan nuh saz dibû. Vizîna mêşan jî nedihate bihîstin.

Paşê bi hêrs got: "Ez dê wan peyda bikim. Heger zemîn vebûbe, ketibinê jî, ez dê wan derxînim. Birevin aliyê cihanê din jî ezê wan bibînim. Çûbin Îran, Hînd, Çîn û Maçinê jî ez ê wan bibînim.

Begên Kurd, devên xwe venekirin. Hemî weke ku lal bû-

bûn.

Zivistan hat. Êdî ew, hespên wan û leşkerên wan westiyabûn. Li çarmedora Agirî doş bûbûn, hatibûn kuntara Agirîyê biçûk. Paşe ji hal ketibû û rengê wî zer bûbû. Ji ber ku rastî tiştekî bican nehatibûn, dîn bûbû. Êdî nema ji kesekî re tiştek digot û nedipeyivî. Ên ku bi wî re bûn, dixwestin ji helwestên wî bizanibin ka paşa çi dixwaze, û bêhêvî, bêrawestîn li dora Agirî digerîyan.

Ji begên Kurd Melle Kerîm, hat nik paşê û jê re got:

"Paşe em ji nuha heya hezar salan li vî çiyayê Gîrîdê bigerin, nikarin kesekî peyde bikin. Ew çiyayî dema xwe veşêrin xwe ûsa vedişêrin ku şeytan jî nikare wan bibîne. Xwelî li serê min".

Paşe bi çavên xwe ên xemgîn lê nêrî, lê tiştek negot.

Li Agirîyê lêgerîna xwe berdewam kirin. Paşa diramiya û di dilê xwe de digot: Ez ji vî Sofîyî pêve, ji van çiyayîyan yekî bivînim, têra min dike.

Dawîyê begên Kurd di nav xwe de civîyan. Ev kar dê bigîhiştana ku? Bigere, bigere, dê çi bibûna? Paşê jî tiştek fêm nedikir. Dema gundên vala didîtin, dibû weke dînan. Vê rewşê dê ûsa berdewam nekirana. Ji xwe nikaribûn ji vê zêdetir li Agirî bigeryana. Babazokî xurt û aşîtekê dikaribû wan hemîyan bikûje. Ji xwe begên Kurd ji paşê re ev rewş gotibûn. Lê paşê guh nedabû wan. Begên Kurd li ser vê rewşê dûrûdirêj peyivîn. Dawiyê biryar dan ku ji paşê re pêşniyarîyekê bibin.

Mele Kerîm, li pêşberî paşê dest û milên xwe girêda biryar began ji paşê re got:

"Paşayê min, em civiyan û me biryar girt. Di nav sê-çar mehan de, berî bihar û havînê em dê Ehmed û hespê peyde bikin û bînin.

Paşê got: "Derdê min ne Ehmed e ne jî hesp. Ev çend çiyayî çûn ku? Ji Sofî pêve me kesek li ew çend gundên



çiyê nedît. Me merûyek jî peyde nekir. Beriya biharê û beriya helîna berfê ez gundiyan jî dixwazim.

Beg di navbera xwe da dîsa civîyan û li ser rewşê dûr û dirêj axaftin. Carake din Mele Kerîm hat nik paşê û got.

"Belê, begê min. Berî destpêka biharê em dê gundiyan jî, ji te re bînin. Ew reviya bin, çûbin kîjan aliyê cihanê jî em dê wan peyda bikin".

Û vegeryan seraya Beyazîdê. Paşê careke din civat gerand ji her begî re cihê cîhê bertîlên hêja dan. Ji vî helwesta paşê hemî begên Kurd dilşah bûbûn. Lê wan dê çawa Ehmed peyda bikirana? Denıa çiyayiyan, bixwestana xwe veşartana, dikaribûn heya roja qiyametê xwe biparêzin.

Paşa miroveki pir xwenda bû. Bi Osmanîya û bi şanê Osmaniyan ve girêdayî bû. Bapîrê, bapîrê, bapîrê wî jî ji vî çiyayî bûn. Paşe nizanîbû kalên wî kengî ji wî çiyayî daketine jêr. Tenê dizanibû, piştî ku bavê wî xwendina xwe li dibistana Erzurumê temam kiribû, çûbû Istanbolê li serayê ma bû. Piştre ew bi rutbeya paşatiyê şandibûn Beyazidê. Bavê wî yaman bû. Meriveki wek qertelan bû. Li Beyazidê, li ser wan zinaran ew seraya mezin dabû avakirin. Çûqas kesên zaniyar, dengbêj û hozan hebûn li seraya xwe dihewandin. Begên Kurd ên Qersê, heya Wanê, ê ji Wanê heya Erzurumê, ji paşê ditirsiyan. Bavê wî demeke dirêj jiyabû. Heya bi gava mirina xwe ji ser hespê daneketibû. Havînan diçû zozanên xwe yên Agirî. Konê xwe yê mezin ê ku ji serayê bêhtir rûmet didayê li rasteki fireh vedigirt. Deşta ku konê xwe lê vedigirt, dest pêka qeşa çiyê bû. Çiyayiyan pir rûmet didan bavê wî. Dibe ku ji tirsan...Bavê wî jî rûmet dida çiyayiyan li gor toreyên wan dimeşiyan. Dihat bîra Mehmût Xan ku bavê wî çel-pêncî bilûrvan li hev dicivandin û di çadira xwe de li wan guhdarî dikir. Heger hespeki bavê wî bi vî awayî bireviyana û biçûna li devê meriveki wek Ehmed rawestiyana, gelo dê hesp lê vegerandana? û

heger paşde nezivirandana dê bavê wî çi bikirana? Mehmût Xan ev tişt ji hev dernedixistin.

Van Begên Kurd dê çawa kesên çiyayî peyde bikirana?. Yan, heger pir dûr çûbûn û gihaştibin Îranê, Xorasanê yan heger pişta xwe sipartibin çiyayê Qafqasê? Began dê çawa ew peyda bikirina?

Paşe jî wek bavê xwe pêşî li Erzurumê xwendiye, piştre çûye Istanbolê, li serayê maye û xwe bi wan dabû qebûl kirin. Bi Ordiya padişah re beşdarî şeran kiriye. Bi mêramî, jêhatibûna xwe nav dabû. Çûye Şamê, Helebê û Qahirê. Li wan deran demekî maye. Sofîya û Delî orman jî dîtibû. Li Rojhilat û Roava baş geriyabû. Berî mirina bavê xwe, bi 12 salan hatiye Beyazidê. Li seraya bavê xwe bicîh bûye. Dema bavê wî mirîye, cihê bavê xwe girtiye. Bavê wî xwestibû ew were Beyazidê, yan na wî Îstanbol bernadida û ne diçû cîhekî din.

Pêşî, bi mirovên vir ên hovane û bi van çiyayiyan neguncîya. Tevî ku sarayeke wek a Beyazidê li Îstanbolê tûnebû, lê her tişt bi sarayê tenê neqediya... A duyim jî jinên van çiyayîyan pir xweşik dibûn. Mirov li tu cîhê cîhanê nikaribû wek jinên vir narîn bidîtana. Mehmût Xan, pêşî keçeke Ermenî anî. Piştre keça begekî Kurd anî. Jina xwe ya sisîyan ji Qafqasan anî. Jina wî ya çaran ji dora gola Urmiye bû. Sê keç û heşt lawên wî çêbûn. Pênc birayên wî jî hebûn. Merivên wî û êla wî li deşta Ixdirê bi cîh bûbûn. Pêwendiyên Mehmût Xan ew çend bi wan re tunebûn. Bi çavekî biçûker li wan dinêrî. Birayê wî yê herî biçûk dev ji serayê berdabû û çûbû deşta Ixdirê. Li Ixdirê ji nav êla xwe ji xwe re jinek anîbû. Li wir bicîh bûbû û nema vegeryabû sarayê. Ji birayê xwe dilteng bûbû.

Meraqa paşê a mezin nêçîra pezkoviyan bû. Hersal biharê, derbên baş digirtin nik xwe, ji bo nêçîra pezkoviyan diçû çiyayê Esrûkê ê ku li jora Gola Wanê bû, diçû

geliyê sor û zîl. Derdiket çiyayî Suphanê, bi sedan postê pezkoviyan bi xwe re dianîn û vedigeriya.

Navê keçek paşê Gulistan, navê a didûyan Gulriz û a sisiyan jî Gulbahar bû. Diya Gulistanê Ermenî bû. Bejna Gulistanê zirav û dirêj bû. Porê wî sor, çavên wî girs û qehweyî bûn. Mijankên wê dirêj bûn, cilên wî ji Îstanbolê dihatin. Wek keça serayê li xwe dikir. Porê Gulrîzê kej bû,. qirik dirêj, mijank xelekî û çavşîn bû. Wî jî wek xwişka xwe cilên xwe ji Istanbolê dida anîn. Gulrizê ji hemî xwişkên xwe bêhtir bala xwe dida xwendinê. Helbestên Ehmedê Xanê jiber kiribû. Gulrîz hîndi zaroktiya xwe da, diçû oda bavê xwe û ji wî re helbest dixwendin. Bavê wê jî hemû zarokên xwe pirtir hez ji Gulrîzê dikir.

Gulbahar ne kin ne dirêj bû, dagirtî bû. Genimgûnî bû. Tenê wê mat bû. Li xwişkên xwe ne hatibû. Wekî jinên çiyayê Agirî, fîstanên qatqat li xwe dikir. Porê xwe dihona, dikir, çel kezî. Gerdanlixa wê zêr bû. Wê jî wek jinên çiyayî Agirî payanên zêr, încî, zumrût dixistin lingên xwe. Pir bi aqil bû. Hindik dipeyivî û nerm dikeniya xwişk û birayên wê ên mayî kêm caran ji serayê derdiketin û diçûn nav xelkê. Lê Gulbahar ne waha bû, ew her dem di nav xelkê de bû. Hez ji çûyin-hatinê dikir. Ji dawet, mêvanî û şînayiyan bi şûnde ne dima.

Xelkê bajarê Beyazidê û gundiyên çiyayê Agirî ji Gulbaharê pir hez dikirin. Bi çavên pêrîzadekê li wê dinêrîn. Li ku derê, nexweşek, kalek, pîrek yan jî hejarek hebûna Gulbahar li nik wan bû. Ji suwariyekî ûsta hîn çêtir li hespê siwar dibû. Û Paşa ji dûr ve çavdariya keça xwe dikir; têkîlê wê nedibû. Di dilê xwe de digot, heger ev keç law bûna dê bibûna padişahê çiyayê Agirî.

Gulbaharê qet hez ji serayê nedikir. Bi xwişk û birayên xwe re jî nedigunciya.

Gundîyan tu caran bi navê wê bang ne dikirênê. Ji wê re

digotin; keça devken. Dema dikeniya, hinarkên wê diketin kortê. Çavên wê ên germ û xemgîn bi hesreta daxwazeke dûr diçirisîn, îsal nûh ketibû bîst û duduyan.

Di sarayê de Gulbahar ji herkesî pirtir bi doza hespê bavê xwe bendewar bûbû. Vî hespê tiştek vedişart. Gulbaharê çîroka hespê ji devê Sofî bihîstibû û ji Sofî pir hez kiribû. Heroj bidestên xwe ji bo Sofî xwarin dibir zîndanê û ji wî tişt dipirsîn.

Sofî digot: "Wellehî şîrîna min rast e. Min bi destên xwe sê caran ew hespê bir jêr û min ew bera rê da. Hesp her sê caran jî vegeriya, hat li ber deriyê Ehmet rawestiya. Ev hesp, diyariya Ehmed e. Xwedê ew ji Ehmed re diyarî şandiye. Ehmed nema dikare wî hespî bide hinekan. Heger bide nabe. Henıû kesên çiyayî dikarin bimirin, lê wî hespê paşde nadin.

Rojekê Sofî ji Gulbaharê bilûrek xwest. Gulbaharê, hema jê re bilûreke pir kevin, dibe ku bilûreke sed salî anî, dayê. Gulbahar ji vê daxwaza wî re şaş ma. Sofî dê çawa bi vê pîrbûna xwe li bilûrê bixistana? Ji bo lêxistina bilûrê divê diran û hilma mirovan baş be. Hew xort tenê dikarin, xweş li bilûrê bixin. Gulbaharê bala xwe dayê ku diranên wî kalê piştexûz hemî saxlam in û sipî dikin.

Sofî çawa bilûr girt destên xwe dest bi lêdanê kir. Gulbaharê ji dengê bilûrê sermest bûbû. Hêdîka li ber deriyê zîndanê rûnişt, pişda xwe da hêta dîwêr. Sofî lêxist wê guhdarî kir. Kerba Sofî rabûbû, ne west dihat bîra wî, ne jî rawest. Her lêdixist.

Dema dengê bilûrê hate birîn, Gulbahar weke ku ji xewneke kûr şîyar bûbe, hişiyar bû. Bi dengêkî pir nizm pirsî: "Sofî ev strana kê ye?"

Sofî gotê: "Ev strana bîntengiya Çiyayê Agirî ye. Wextekî Agirî pir hêrs bûye, piştre bav û kalên me, li ser hêrsa Agirî ev stran gotine."



Gulbahar heroj bi berbangê sibê re dihat ber pencar Sofî. Sofî jî heroj li wê stranî dixist. Gulbaharê çi dikir û çend dipirsî, Sofî ji wê re bi devkî çîroka Agirî nedigot. Hoya vê xezabê ji wê re ne digot. Her digot:

"Hema, ji xwe hatiye xezebê". "Ew xeyidî ye, bavûkalên me jî li ser vê xeyda wî stran çêkirine. Ez hew dizanim bi bilûrê li wê destanê bixim. Ez ne dengbêj im. Gotinên vê stranê dengbêj dizanin. Ez bilûrvan im, ez ne dengbêj im.

Gulbaharê, çiqas xwest ji Sofî rastiya çîroka Agirî fêr bibe, lê bi serneket.

Sofî ji Gulhabarê re digot:

"Sultana min! qey bilûra min nikare te serwextî serpêhatiya vê xezebê bike. Wey xwelî li serê min. Xûya ye ez pir kal bûme".

Gulbaharê li van çiyayan, ev strana navdar ji devê gundî, jin, zarok, dengbêj û bilûrvanan pir bihistibû. Lê wek a Sofî ne bihîstibû. Heger, wî ev xezeb bigotana xwedê dizane dê çawa bigota?

Paşê ji dûr ve çavdariya keça xwe dikir û dizanibû ku keça wî bi Sofî re bendewar e. Ji wî re xwarinê dişîne û bilûra wî guhdarî dike.

Rojekê Sofî anî nik xwe û got:

"Sofî, heya Ehmed û hesp neyên ez te ji zîndanê bernadim. Dixwazî here Ehmed û hespê bîne".

Sofî bi hêrs gotê:

"Hesp jî, Ehmed jî dê neyên ber te. Ev hesp ji Ehmed re diyariya xwedê ye. Dibe ku Ehmed were, lê hesp nayê. Ez jî, ji te re nayînim."

Paşa pir aciz bû. Sofî paşde şand zîndanê. Bangî Gulbaharê kir û got: "Gulbahar" careke din têkilîya xwe bi Sofî re daneynî."

Di sarayê de her gotina paşê ferman e.

Piştî çend rojan ji begên êla Heyderan nûçevan hat,di-

got: "Bera paşa meraq neke. Me cîhê hesp, Ehmed û çiyayiyan peyde kir. Di nêzîk de hesp û Ehmed dê bigiyên destên wî".

Ehmed hemî çiyayî komkiribûn û çûbû jêr, Haqarîyê. Nik Kurdên Şemdinan.

Beg kom bûn û lawê Begê Milan şandin Şemdînan. Lawê begê Milan, Mûsa Beg, li jora çiyê li deştekê, di nav konên zêde de, konê Ehmed û ku bi mar neqişandîbû, dît. Ehmed li wir bû.

Ehmed bi dil û can, bi rumetdaneke mezin, pêrginiya wî kir. Mûsa Beg, tiştên ku çêbûne ji Ehmed re gotin û domand.

"Paşa dixwaze te bibîne,", "ji te tiştekî din naxwaze. Hespê jî naxwaze. Paşa dixwaze gundî vegerin, Agirî. Began jî bo efûkirina te û gundiyan, ji paşê tika kirine. Paşa tenê te meraq dike. Dibêje, ew Ehmed merivekî çawa ye? Paşê ji begên me re gotiye; bera çavên min wî mêrxasî bibînin, ez jê panzdeh hespên din jî bidimê. Tenê bi çavê xweşiyê, mêrxasêkî welê bibînim. Began ew gotin ji min re gotin û ez şandim nik te".

Begên Şemdînan, pêşkeşên Agirîye, beg û axa li hev çiviyan. Dûr û dirêj raberizîn, Hinan digotin ev dek e. Hinên din digotin, evçend begên mîna şêran ji bo pêkanîna dekeke waha, ma xwe biçûk dikin?

Paşakî Osmanî û ew çend begên, ma dikarin, ji bo hespekî welê, xwe biçûk bikin? Xûya bû, paşa xwestibû Ehmed bibîne. Meraq dikir ku ka hespê wî çûye li ber deriyê kê rawestiyaye.

Ehmed, ji Mûsa Beg bihist ku Sofî di zîndanê de ye. Pir li ber Sofî ket. Dema dev ji çiyê berdabûn û çûbûn, Ehmed pir li ber Sofî geriyabû, lê Sofî ji çiyê dûr nexistibû. Sofî, mîna zinarê ku xwe bi çiyê bigire, xwe bi çiyê ve zeliqandibû, wî çi dizanibû ku paşa dê wî bavîje zîndanê.

Mûsa Beg got: "Meraq nekin karê Sofî baş e." û dostenîya Sofî û Gulbahar xanim got. Hemî bi vî yekê şa bûn."

Ehmed got: "Mûsa beg" "Mafir tu hatiyî ez xatirê te naşkînim. Ez dê vegerim Agirî û herim nik paşê, êl dê jî vegere. Lê belê paşa careke din rûyê hespê nabîne".

Mûsa Beg careke din gotina xwe got:

"Paşa dixwaze, te bibîne, tenê dixwaze te bibîne."

Û di rojeke biharê de çiyayî vegeriyan Agirî.

Hemî begên Kurd bi hev re Ehmed girtin nik xwe û hatin sarayê. Paşê bê diltengî û bi çavekî biçûker, pêrgîniya Ehmed kir û got: "Were siltanê Agirî, ka hesp li ku ye?"

Ehmed got: "Hesp li mala min e".

Paşê bi ken got: "Te hespê min dizî, ma tu dizanî cezayî dizîna hespê jî çi ye?

Ehmed qet paşde venekişiya û got:

"Min hespê te ne dizîye xwedê ew hespî diyarî daye min. Hesp nema ji te re tête dan. Bavûkalên te jî ji vî çiyayî ne. Ma tu bi vê torayê nizanî?"

Dema paşê ew bersîv girt, har bû:

"Ez nizanim yan tu dê hespê min bînî yan jî ezê serê te jêkim. Vî bavêjin zîndanê."

Begên ku Ehmed anîbûn bêdeng man.

Ehmed di çûyina xwe de bang kir û got:"Paşe, paşa, serê min biçe jî tu wî hespê nabînî. Ew careke din nayê saraya te".

Mûsa beg ew hêvî ne dikir. Ji lew re dij derket û got:

"Paşa,ev tiştên ku hûn dikin, ne mirovî ye.Min, Ehmed girt anî,ne tu bavêjî zîndanê.We derew kir û em xapandin".

Paşa qîrya û ferman da: "Vî jî bavêjin zîndanê".

Mûsa beg birin zîndanê.

Paşa vegeriya ser begên Kurd:

"Tiştê ku we dê ji min re bikirana ma ev bû? Hespê min li ku ye? Ehmed hat. Hespê min li ku ye? Ez hespê xwe

dixwazim. Ez vê lekeyî nayinim ser malbata xwe. Ez nahêlim ku xelk bibêje, paşa nikaribû hespê xwe ji yekî çiyayî bistîne".

Gotin: "Dijwar e, lê em dê hespê jî bînin."

Serpêhatiya hespê, Ehmed, Sofî, û Mûsa Beg, ji Wanê heya Melatyayê, ji Melatyê heya Qafqasan, ji wir jî heya nav Enedolê belav bû. Dengbêjan li ser Ehmed û li ser hespê stran çêkirin û li hemî cîhî ev stran gotin:

Çiyayî bi vê dekê pir êşiyan. Ew dek bi êla Milan jî ne xweş hat.

Dema Mûsa Beg çû zîndanê ket destê Ehmed û got:

"Li min megire, min nizanibû. Min biborîne, yan na min tu nedianî. Heya, serê min jênebe ê te jênabe."

Sofî bi hatina Ehmed pir şa bû. Ew hembêz kir. Piştre rahişt bilûra xwe û dest bi lêdana çîroka Agirî kir. Lêxist, lêxist... ji çavên Mûsa Beg û Ehmed, hêsirk bariyan. Ji lêdana bilûrê têr bû îcar bilûr da Ehmed. Dilê Ehmed dişewitî. Ehmed di dil xwe de digot, hêvîya min ji xwedê heye ku laneta Agirî li serê paşa û serê began bibare û li bilûrê xist. Bilûr bi awakî nuh û bi dengekî nuh hatibû zimên. Gulbahar ev dengê nuh bihîst, ev denga ne wekî ê din bû. Wê jî çîroka Agirî digot. Digot, lê dilê çiyê, zinar û keviran pê dişewitî. Zinar û çiya diheland.

Gulbahar hat zîndanê. Ji bavê xwe jî ditirsiya. Lê çi dibû bera bibûna diviya xwediyê vê hunera bêpayan bidîtana. Bi mahna dîtina Sofî hat Ehmedê bilûrvan dît. Di dilê wê de daxwazeke germ û dostane ku berê pê re çênebûbû derbas bû. Ji kira bavê xwe dîn bûbû. Li ber dîwer rûnişt û li bilûra Ehmed guhdarî kir, sermest bû. Diviya tiştekî bike. Hin tişt. Tiştekî ku ne miroviya bavê wê bidana ji bîr kirin. Mêraniya Mûsa Beg jî ew dilxweş kiribû.

Wê rojê Gulbahar ket aşpêşxanê, bi jinên karker ên ku ji wê hez dikirin, xwarinên pir xweş çêkirin û bi peyayên xwe

re şand zîndanê. Diya wê ew tişt bihîst û gotê:

"Paşa vê kira te bibihîse, serê me hemiyan dê bide jêkirin."

Gulbahar bersîva wê da.

"Piştî ku paşe ev çend xwe biçûk kirîye, êdî çi dixwaze bike, bira bike."

Roj derbas dibûn. Begên Kurd ne dikaribûn hespê peyda bikin û bînin ne jî dikaribûn xeberekê rê bikin. Mûsa Beg û Ehmed jî li zîndanî bûn. Gulbahar bi dizî ji wan re xwarin dişand, carna jî diçû zîndanê, ji dûr ve çavdariyê wan dikir.

Rojekê xwe nema girt û ji Sofî re got:

"Divê ez bi Ehmed re biaxifim. Ji Ehmed re bibêje, ez dê şevekê werim zîndanê."

Rîha Ehmed a zerê zêrinî xelek xelekî û dirêj bû. Mijankên wî ên dirêj ji çavên wî ên şîn re, rengekî xemgînî û kildar didan. Ehmed bejin dirêj bû. Porê wî ê xelek xelekî diket seranîya wî. Rûyê wî ê zirav û dirêj rengê rûyê pezkovîyeke birîndar û xemgînî dida. Mirov digot qey hemî êş, daxwaz û hêviyên mirovan di wî rûyî de civiyabûn û rûyê wî di nav xewneke avsînî de wenda bûbû. Di nêrîn û sekina wî de tama agirê cîhaneke nependî hebû, ku kê ew bidîtana xwîna wî dê bi Ehmed bikeliya, fena ku Gulbahar ji pir mêj ve Ehmed dinasî. Weke ku bi hev re çêbûne û bi hev re mezin bûne. Ew çend xwîna wê bi Ehmed dikeliya... Dibe li dawet, şahî, zozan û nêçîran... dibe ku, di xewn û xeyala xwe de dîtibû... Ewende nas, ewende dost bû.

Sofî got: "Ezbenî dê çawa be? Ma dergevanê zîndanê destûr dide? Di ji paşê re bibêje, ew dê jî serê me hemiyan bide jêkirin.

Dilê Gulbaharê dişewitî û ranediwestiya. Êdî xewa şevê wenda, kiribû. Rûyê Ehmed mina rohnayiyeke zer dihat ber çavên wê û diçû. Dikeniya di çavên wî ên girs û çîn de

kulên herî giran û bêçare diyar dibûn. Diviya derd û kulekî Ehmed ê mizin heba. Derdekî bêderman... Dibe ku kesekî wî, dê, bav, bira û delaliya wî tunebû. Weke ku di wê cîhana mezin de bi tena xwe û sêwî mabû. Tenê, tipûtenê. Gulbahar dema waha diramiya êşeke pir dijwar diket dilê wê. Bêrawest di dilê xwe de digot, divê bipeyivim û ji tenê bûna wî û kulê wî ne bibim derman. Rebeno bi ser de jî di zîndanê de ye.

Çima ew her di heşê wî de bû? Ji bo çi ew dihat ber çavên wê? Di xewn û xeyala wê de her ew hebû. Li çi dinêrî Ehmed li ber çavên wê bû. Destên xwe dida kê û dida çi, digot qey berê destên xwe dide Ehmed. Bi xwe sey bûbû. Diçû ku, dilê wî ew berbi zîndanê ve dikişand. Gulbaharê çend caran zîndan dîtibû. Derîyê zîndan ji hesinekî giran û pir mezin bû. Kilîta wî a bi zincîr û pir mezin pêve bû. Doraliya derî ji kevirên şikandiyên saxlam çêkiribûn û kevir xirxire jê bûbû.

Dergevanê zîndanê Memo bû, merivekî ku bavê Gulbaharê pir pê bawer bû. Bi qasî zarokên xwe jê hez dikir. Bavê Memo jî, merivekî ku bi sarayê ve girêdayî bûye û yek ji mêrxastirîn peyayên sarayê bûye. Hîn dema ku Memo du salî bûye, bavê wî di şerekî de hatiye kuştin.

Memo xort û pirî mêr bû. Çavên xwe ji mirinê ne dida alî... Merivek bû ku, dikaribû ji bo paşê canê xwe bidana. Ji xwe dergevanên zîndanê herdem ji mirovên îsa dihatin hilçinandin. Memo bi kesekî re nedipeyivî. Gava kesekî jî wî re tiştek digot, mîna keçan sor dibû. Ji dema ku xwe naskir û bi şûnde ne dihat bîra Gulbaharê ku rojekê Memo li çav û rûyê wê nêrîbe. Çuqas çavên wî li Gulbaharê diketin, sor dibû levên wî mor dibûn, xwîna wî dimiçiqî, dest û lingên wî dihejiyan. Gulbaharê herdem ev tişt bi şermezariya Memo ve girêdida. Wê herdem dîtibû ku Memo li erdê dinêre. Mîna keçek şermok sor dibe û yekcar napeyive.



Aşpêşxanêya sarayê bi dizîkan ji zîndanê re dixebitî. Ji Memo re jî xwarinên xweş dihatin şandin. Gulbahar hercar ji Memo re digot:

"Birayî Memo, min ev xwarin bi destên xwe ji te re çêkiriye."

Bi wî awayî roj derbas bûn. Gulbaharê du-sê carên din bi saya serê Memo, ji dûr ve rûyê Ehmed dît. Carcaran Memo deriyê zîndanê vekirî dihîşt û diçû. Gulbahar jî li ser pêlikên zîndanê ên hevirîn, bi mahna ku Sofî re bipeyive, dîdît ku di binê zîndana kûr de Ehmed dimeşe. Ehmed, xweş piyasa dikir. Wekî çiyakî, hêdî, bi heybet, bi mêrane û bi xwebawer gav diavêtin.

Ji jora zîndanê, ji çend pencereyên zirav û dirêj, bi qasî bi bostekî rohnî digiya binê zîndanê. Çala zîndanê li ser zinarekî bilind bû. Li jêr deşta Beyazîdê û riya deştê a mezin ji alîkî heya alîyê din dirêj dibû.

Hin caran dengê zengilên kerwanên ku bi rê de diçûn, digihiştin heya binê zîndanê û ji wir jî diçûn zinarê ku çala zîndanê li ser bû, deng vedidan. Hemû deng ku ji çiyê û ji deştê dihatin, jî digihaştin vî gelîyî û vedidan. Di bin çalê de bi qasî mezinahiya destekî û bejna merivekî qulek hebû. Kesekî ku ew qul nizanîbû û nebihistîbû, nemabû. Ji lew re herkesî serekhostayê sarayê bi başî yad dikir û herkesî , ew wek şêx dihesiband. Him jî, hoste yekî Suryan bû. Ew bixwe di zîndanan de pir raza bûye. Kêm kesan wekî wî derdê tarîtiya zîndanê baş zanibûye. Ji lew re gotîye, çi dibe bera bibe, ezê ji vê zîndanê re qulekê çawan bihêlim. Çi dibe bera bibe, di cîhanê de cara pêşîn zîndanê ku ez ava dikim, dê bi rohnî be û yek kesê zordest dê nikaribe qulên van rohnayiyan ên ku ez çêdikim, bigire û rohniyê vemirîne...

Piştî ku avaniya sarayê temam bûbû, hoste, ji paşê re nameyek hîştibû û ji ber çavan wenda bûbû. Di namê de di-

got. "Kî wan qulan bigire, ew dê vê sarayê, ji binî hilweşîne. Min ev saray li ser rohnayiya van qulan ava kirîye. Kî bixwaze wan bigire, hemî derd û belayên cîhanê dê bi ser wî de bibarin. Soy û zarokên wî dê ifleh nebin. Kî ku vê nameya min, negihêne destên rûniştevanên vê sarayê dê kurdende biçe."

Ji roja avabûna wê sarayê, heya nuha, kesekî newêrîbû dest bi wan qulên han bide. Ji lew re ev zîndana Beyazîdê li ser zimanê hemiyan bûbû destan. Heya nuha kî ketibû wê zîndanê ji hoste Silêmanê Suryanî re duayên baş kiribûn.

Mirov dema ji wan qulan binêriyanan zivistan bûna yan jî havîn, cîhan bi awakî din diyar dibû. Ji wan qulan riyên deştên qorqorî, dirêj û bilind ên ku berbi ezmên di rêj dibûn û çûk, berf, karwan, quling, toy, mîrov, qaz û stêrkên wê, stêrkên ku di ser mitikên pan ên ku beranberê wê de bûn, diciviya bi şev diçelqiyan bi rengekî din diyar dibûn. Riyên wî û koyên wî ên ku di bin ronahiya avên zirave de doş dibûn, dibûn weke deştek ku sê qat ser hev de be û di navbera her sê qatan de jî xêzek rohnî hebe. Her zîndanî dema ji vê zîndanê derket, li derve nikaribû xweşikayiya wan tiştên ku ji zîndanê xûya dikir, bibîne. Êdî nikaribû rengê kulilkan, berf, ronahî, û keskatiya ku hin caran dibû mor, qehwerengî û şîn û roj û zerê ku dibiriqî û cîhana ku bê rawest diguherî, bidîtana. Bi rojan li wan digeriya, lê careke din nedidît. Gava girtî ji zîndanê derdiket weke ku ew cîhan jî, deşt jî, serê xwe digirtin û diçûn cîhekî din.

Li zîndanê Sofî, Ehmed û Mûsa Beg, bi rêzê di wê qulê re li der ve, li bahara ku li hemî cîhî belav bûbû, dinêrîn. Her serê sibê ji deştê berbi çiyan qoreke mij a tenik bilind dibû. Wê mijê hêdî hêdî rengekî pembe digirt, dawiyê wenda dibû.

Gulbahar, ji serî heya nenûkê lingan evîndar bûbû. Heya

bi hestiyên wê bi evînê tije bûbûn, destên xwe dirêjî çi dikir, bi hezkirinê dihesiya. Gulbahar di nav sarayê de weke miriyan digeriya. Bêhnekê di cîhê xwe de ranediwestiya. Carcaran, rehet û bi kêf dibû, carcaran jî diketê nav xem û kulan û bêhîvî dibû. Him dilxweşî him jî diltengiya wê zû dihat zû diçû.

Gulbahar diramîya û ji xwe re digot, dîtina min a Ehmed hew dema ku ew di zîndanê de ye, bi destê min dikeve. Dibe ku wekî dîtir ez nikaribim wî bibînim. Ne bes nikarim bibînim, nikarim vî tiştî biramim jî, ji xwe dema zîndana Ehmed xelas be, kes nikare wî bibîne. Ne bavê Gulbaharê, ne Şah û Padîşah ne jî Şêxê karwanan, dê nikaribin wî bibînin. Di vê cîhanê de ji bo hemû tişt jî çara hebû lê ji bo hevdîtina Gulbahar û Ehmed, ne ji nêzîk, ji dûr ve jî, çare tunebû.

Êdî di dilê Gulhabarê de ji bo hemî tiştî, mirin, cihêbûn, zordestî, evîn û bêhêvîtîyê, hisseke negemikir peyda bûbû Hemî hissên wê serî hildabûn.

Ji nişka ve bêdeng ma. Hemî aliyên laşê wê, westiyayî bû. Goştê laşê wê weke ku di nav hawanê de hatibû kutandin. Di nav sarayê de wek nîv mirîyan diçû û dihat. Ên ku çav wê diketin şaş diman. Bahoza Gulbaharê rawestiyabû.

Sê rojan bi wî awayî, bê ku bipeyive û devê xwe veke, bêlebat, bêhêvî, di nav malê de wek miriya ji gorê rabûye, diçû û dihat. Sê rojan devê wê venebû. Rûyê wê westiyayî û zer bûbû. Porê wê nedibiriqî. Diranên wê sipîtiya xwe wenda kiribûn. Çavên wê ên girs carcaran dibiriqîn, carcaran jî vedimirîn. Di rûyê wê de, di şîrîntirîn cîhê rûyê wê de kenekî kûr, bextiyarek û xurûrek mabû. Û laşê wê xistibû derd û kulekî mezin.

Berbi êvarekê, rewşa Gulbaharê hate guhartin. Bahoza evînê ku di dilê wê de bû, serî hilda. Nikaribû di cihê xwe de bisekiniyana. Dîsa hezkirin û bextiyariya wê bûbû sîda-

rê kevir û axê. Nema şev dibû. Digot qey şev dê qet neyê. Weke ku qet, qet, qet şev dê neyê... Xwe avêt derveyî sarayê. Ji dûr ve hinekî li dikkana hesinker û li çîkên ronayiyê hesinê wî temaşa kir. Li hesinker nêrî. Hesinker di nav çirûskên êgir de wenda dibû. Piştre çû goristana Ehmedê Xanê, niyaz û daxwazên xwe ji Ehmedê Xanê re gotin, dua kirin û ji wî alîkarî xwest. Duayên wê wek lehiyê av bend û bêsînor li pey hev rêz dibûn. Dema ji goristana Ehmedê Xanê bi dûrket, ro çûbû ava. Şeva tarî a ku li gor Gulbaharê pir dereng hatibû, hêdî hêdî dest bi barînê kiribû.

Êdî aqilê Gulbaharê digihaşt her tiştî. Ji bo wê hêviya rizgarbûnê nemabû. Biryara xwe dabû ku bimeşe ser qedera xwe. Çi dibû bera bibûna.

Di odayê Gulbaharê de sendoqeke gûz ê neqişandî hebû. Di sendoqê de gerdanlixekî qefqasî ku pîrika wê ji wê re diyarî kiribû, hebû. Gerdanlix ji zêr û yaqût çêbûbû. Weke din jî, gustîrek û hin bazinên încî, payamên hîndî ên zêrîn, xizêmeke Afganî a ku xalê wî jê re dabû, hebûn. Gulbaharê ji wê sandoqê, hemî tiştên xwe derxistin, xistinê nav tûrekî qedîfê. Raste rast çû zîndanê. Memo li odaya xwe ya ku li kêleka zîndanê bû, rûniştibû. Gulbaharê li derî xist. Memo derî vekir. Şûrê Memo yê mezin ji kêleka wî ya rastê heya gûpka lingên wî dadiket. Ebaya wî ji çermê ciwaniyên hespan çêbûbû, û bi zîvê qefqasî neqişandîbû. Kumê wî yê kulavî di serê wî de bû. Dema çavên Memo li Gulbaharê ket, di rûyê wî de bextiyareke bêpayan, kêfxweşiyeke pir mezin xûya bû. Ew kêfxweşî ji çavên Gulbaharê nereviya. Ji nişka ve rûyê Memo reş qermiçi û di rûyê wî de bêhêvîtîyeke mezin xûya bû. Hêviya Gulbaharê jî, ji wî şikiya û şa ma. Rengê Memo dîsa sor bû û çavên xwe ji Gulahabarê badan û bera erdê dan. Dest û piyên Memo nema digirtin û dilerizîn.

Gulbaharê tûrê destê xwe dirêjî Memo kir û gotî: "Bigire, ez van hemiyan didim te." Memo bixçik girt, û nêrî, ji lerizînê, destên wî wek ku teyrokê lêxistibe diçû û dihatin. Gulbaharkê got: "Divê tu vî Ehmedî ku di zîndanê de ye, nîşanî min bikî."

Tûr ji destên Memo ket ser keviran û di bêdengiya şevê de şinqîneke pir mezin derxist. Gulbahar xwar bû, Tûr ji erdê rakir, û ji nuh ve dirêjî Memo kir. Memo bixçik negirt. Di rûyê Memo de dilopeke xwîn nemabû. Hemî xwîna laşê wî hatibû kişandin. Rûyê wî wek kaxizê sipî bûbû.

"Bigire Memo. van bigire, û min û Ehmed rûbarî hev bike. Piştre jî here ji bavê min re hemî tiştî bêje. Bêje ku serê min jêbike."

Memo bêlebat mabû. Piştre hêdî hêdî, hinekî serê xwe bilind kir û li Gulbaharê nêrî. Di çavên wî de jana mirinê dihate dîtin. Çavên wî bûbûn wek çavên mirovên ku li ber mirinê bin û can bidin. Gulbahar mecbûr ma û çavên xwe ji Memo revand.

Bêhemd destê Memo çû ber pişta wî, bê can, giran... Ji ber pişta xwe kilîtên zîndanê derxistin û dirêjî Gulbaharê kirin û ji wir bidûr ket û çû. Kilîta zîndanê bêhnekê di destên Gulbaharê de ma. Gulbahar nizanibû çi bike, bigirî yan şa bibe. Dudil ma. Dawiyê dest bi girînê kir. Hema li cihê xwe, li ber deriyê Memo rûnişt. Têr têr girîya. Carekê ket bîra wê ku kilîtê deyne wir û here. Lê nikaribû bikira. Piştre bi zor rabû serpiyan. Berê xwe da deriyê zîndanê, lingên wê li hev diketin, dilê wê ewçend lê dida ku hindik mabû ji sînga wê derkeve derve. Kilîta mezin di derî de bi cîh kir û derî vekir. Hundûrê zîndanê pir tarî bû. Li pir jêr, li binê zîndanê rohnayiyeke pir qels xûya dikir, Gulbahar, bi pelikandina destan riya pêlikê dît. Hêdê hêdî ji pêlikên kilandî ên ku ji beriya avabûna sarayê, bi sed salan mabûn,



daket. Di binê zîndanê de qet lebatek xûya ne dikir. Her tişt dûz bû. Li ber ronahiya hindik, her tişt weke tilfê binê avê bû. Di zîndanê de bêhna nekme hîç tunebû. Ji binê zîndanê bêhna çermê tirşbûyî dihat.

Gulbaharê li ser pêlikan rûnişt û xwest binê zîndanê bibîne. Hêdîka got: "Sofî, Sofî".

Bi dengê Gulbaharê, Sofî bi kiras û derpî û behitî berbi pêlikan meşîya û got.

"Fermo Siltana min, tu çawa hatî vir? Paşa dê serê me hemiyan jêbike. De here ji roja ku ev zîndan çêbûye heya îro, bêyî te tu jin ne ketine vir. Jina pêşîn tû yî. Heydê, heydê heydê, derkeve derve. Xwedê bike kesekî hatina te nedîtiye.

"Ehmed li ku ye? Xeberê bidiyê?"

A nuha a nuha" û çû.

Di nav reşayiya şevê de dengê piste pistekê hat. Piştre ew deng hate birîn. Û her tişt ket nav bêdengiyeke sar. Dilê Gulbaharê bi xurtî, bi terp û rep lêdixist. Weke ku dilê wê di wê zîndana sar de vedida. Yan jî ji Gulbaharê re ûsa dihat.

Gulbahar rawestiya, kes ne dihat. Her ku dipa hîn pirtir xwîna wê germ dibû. Dilê wê hîn pirtir, weke çûkekî birîndar diperpitî.

Vê rewşa Gulbaharê heya ku ji nav tariya tilfa şevê sîyek nêzîkî wê bû, berdewam kir. Dema keçikê, sîha ku dimeşiya û dihat dît, dilê wê xweş bû. Dest û lingên wê sist bûn, serê wê doş bû heger xwe bi hêtê negirta, dê biketana.

Dema hilma Ehmed ket ser rûyê wê, bi carekê hat ser heşê xwe. Herdu jî bêhnekê bêdeng man û nikaribû bipeyivin. Pêşî Ehmed peyivî:

"Gulbahar, tu yî?"

Gulbaharê bi dengekî pir nizm got: "Belê ez im".

Wekê ku ji mêj ve dostên hev bûn. Bi hev re heval, dost

û yar bûn. Ewrê evînê herdû jî pêçan. Germ, xweş û destane... Ev evîn li çarmedora zîndanê belav bû. Di zîndanê de pir kewên gozel hebûn. Sofî ji hin ciyan ew kew peyde kiribû, anîbûn. Ew kewên han, nivê şevê, destê sibê, nîvro û kengî bibûya, heger dilxweş bûna dixwendin. Ji jêr ji nav tariyê, dengê kewkî hat. Gulbahar bi vî dengê bêwext û bêcîh, veciniqî, destê xwe dirêj kir, bi destê Ehmed girt, ji pêlikan derketin jor, gîhaştin nik qûleya zîndanê. Qûle li aliyê deştê bû. Li ber wan bi du gavan gelîyekî bêbinî û bê serî hebû. Li dûr stêrk, deşt û siya çiyayê Agirî a bi xof û mezin xwe bera ser mitikan dabû, bi jora Agirî jî heyveke kêmronahî ku alîkî wê kêm û biçûk bûbû li eznıên xûya dibû. Piştre ewrekî reş û tarî xwe bera ser heyvê da. Gulbaharê destê Ehmed bernedabû û hin destên wan dişewitîn...

Dema keleşêrên sibê, dest bi xwendinê kirin, Gulbha r û Ehmed ji bin qulê rabûn. Destên wan, mîna bizotekî êgir ku duqat bûbû, ji hev cîhê bûn. Gulbaharê qet ne dixwest cîhê bibin. Dixwest heya roj here ava li wir bimîne û tama girtina destê Ehmed derxîne. Bera piştî wê, xwîna wê ya sor birijiyana ser axê. Carke din bi destê Ehmed girt û herdu parçeyên bizot, careke din gihaştin hev. Her diçû derûdor rohnî dibû. Destên wan dîsa ji hev dûr ketin. Ehmed meşiya, çû ket zîndanê. Gulbaharê dengê deriyê zîndanê giran ê ku li paş Ehmed hate girtin, bihîst. Demekê, bê ku bizanibe dê biçe ku û çi bike, li wir ma. Piştre çavên wê li kilîta zîndanê a ku di destê wê de bû û diviyabû bidana Memo, ket. Berbi deriyê zîndanê ve meşiya. Hat oda Memo. Deriyê odê vekirîbû. Memo ne li hundur bû. Şaş ma. Bi bazdan çû sarayê li Memo geriya. Dît ku Memo pişta xwe ji aliyê hundur ve daye hêta bedena sarayê a hundurîn û nêzîkî deriyê mezin, li aliyê rastê, rûniştîye. Memo mîna miriyan bû, ne dilebitî. Dengê lingên Gulba-

harê ji ew şiyar nekir.

Gulbaharê li ber guhê Memo, kilît hejand. Lê di rû û rewşa Memo de guherînek çênebû. Gulbahar di ser serê wî re pa, pa lê di wî de guherîn çênebû. Kîlît bera dawa Memo dan û got: "Her bijî birayê Memo, heya mirinê ez vî qenciya te ji bîra nakim."

Di Memo de dîsa tevgerek çênebû. Gulbahar ji wî veqetiya, çû û roj derket.

Ehmed, li binî zîndanê wek kevirekî bi tena xwe, mabû. Baweriya xwe bi van tiştan nedianî. Dikir, ne dikir, nikaribû baweriya xwe bi sihra Gulbaharê, bi bêhna wê ya jinantî bianiya jê re wek xewnê dihat û ji xwe dipirsî, digot, gelo ev rastî ye, yan xewn e. Carcaran heya bi hestiyên xwe bi evîn, û bextiyarî tije dibû carcaran jî vedigeriya nik tenêbûn û gumanên xwe.

Qey hesp ji bo vê hatibû ber deriyê wî. Qey xwedê ûsa nivisandiye. Ev hesp û ev keç ji min re diyariyên xweda û Agiriyê ne. Divê mirov rewayî wan be. Gulbahar weke kulîlkên Agirî teze û bêhnxweş bû, meriv ji bêhna wê ya xweş sermest dibû.

Ehmed got: "Sofî bilûrê bide min"

Sofî bilûr dayê. Nuha Sofî, Mûsa Beg, zîndan û kewên zîndanê meqamekî nuh guhdarî dikirin. Heger Gulbahar ev maqam bibihîsta ji kêfan, dê dîn û har bibûna.

Wê rojê Gulbahar bê rawestîn di nav qesrê de çû û hat. Bêheş, bê xwarin û bê ku destên xwe bi tiştekî bide... Bavê wê dê Ehmed bernedana. Berdana jî tu caran dê negihaştana daxwazên xwe. Paşayekî tu caran keça xwe nedida çiyayîkî. Him jî çiyayîkî waha serhişk.

Dema dengê bilûrê ê ku ji zîndanê dihat ket guhên wê, li xwe hay bû. Laşê wê ji serî heya nenûkan lerizî.

Xwezî Ehmed ji zîndanê derketa û şevekê bihata ew biavêta ser pişta hespê û berê xwe bidana çola pezkoviyan...

Li wan deran çadir û konên êlên kurdan hebûn û Kurd herdem mîvanperwer bûn... A din jî li mirovên çiyayê Agirî bi çavekî dîtir dinêrîn. Di çavên wan de kesên Agirî pir giranbûha û qûtsal bûn. Lê li ku bûna bera bibûna, bavê wê dê ew peyde bikira û bida kuştin. Dest û piyên Osmaniyan dirêj bûn, digihaştin her aliyê cîhanê. Dê Ehmed jî bikuştana. Dilê wê dişewitî.

Diviya îşev jî biçûna ba Ehmed û herşev jî. Lê heger bavê wê bibîhîse dê ew jî, Ehmed jî bikuşta dê Memo jî bikuşta. Rewşa Memo seyr bû. Ew çend zêr ne girtibû kilît dabûyê û çûbû. Gava Memo dianî bîra xwe, rûyê wî yê xemgîn dihat ber çavên wê û pêrîşan dibû. Ji bo wê jî heya ji wê dihat Memo ji serê xwe derdixist û ne dixwest Memo bîne bîra xwe. Ji xwe ji mêj ve bû li Memo ketibû gumanan. Memo her dem jê re baş bû. Gava çû ba Memo, dizanibû, çi bibe jî Memo dê daxwaza wê bi cîh bîne.

Heya ku ew li wir di zîndanê de bû, diviyabû herşev biçûna nik wî. Lê çawa her şev jî Memo kîlît tête xwestin û çawa her şev li rûyê Memo ê xemgîn tête nêrîn. Gava Memo kilît dabûyê ji mirinê xerabtir êş kişandibû. Ev rewş ne tenê ji çavên Gulbahar ne direviya, ji çavên herkesî nedireviya.

Hemû daxwazên hundurê Gulbaharê serî hildidan. Ji bo her tiştî, dijî bavê xwe, dijî toreyên wir, dijî sarayê, çiyayê Agirî û hemî cîhanê derdiket.

Ji dîwanê, dengê bavê Gulbaharê ê qalîn, bilind û toq dihat. Mehmût Xan, merivekî pir çeleng bû. Gava bi kurdî dipeyivî hîn pirtir dilgerm, ji dil û xwîn şîrîn dibû. Dûrvê qertelekî girs dida. Gulbaharê ji heya nuha tenê ji bavê xwe hez dikir. Heyrana wî bû. Bavê wê jî zanibû ku keça wî ji wî hez dike.

Bû êvar, roj çû ava. Gulbahar di sarayê de çû û hat doş bû. Lê lingên wê ji dîwanê dûr ne diketin. Li dîwanê kesek

nemabû. Gulbaharê ew ji birîna deng fêm kiribû. Bavê wê nuha sedî sed nimêja paşîvê dikir.

Gulbaharê di dilê xwe de got, ez nuha herim, xwe bavêjim lingên Mehmût Xan, bibêjim, ez ne keça te me Mehmût Xan, ez tikaker im. Li ser çogên xwe, kaşkaşî hatim gel te, ji bo tu Ehmed bidî xatirê min, xanê xanan, Mehmût Xan. eslê xwe ji bîra meke, Mehmût Xan. Navudengê eslê te ji Agirîyê mezin çêbûye, dapirê min ûsa digot, ma qet te ev tişt ne bihîstiye. Mehmût Xan? Digotin li kêleka mala me hêlîna qertelan hebûye û bibêjim...

Carekê gava leşkerekî derî vekir, tiştek nemabû ku derbasî hundur bibe. Xwe bi zorê girt. Dê biçûna xwe bavêtana lingên Mehmût Xan. Dilê wê hat ber devê wê. Xwe ji ber deriyê dîwanê da alî. Heger, hew ji bo wê bibûna kar hesan dibû, lê heger hayê bavê wê jê bibûna, dê Ehmed bidana kuştin.

Heya nîvê şevê xew neket çavên Gulbaharê. Hemî xelkên qeza Beyazidê razabûn. Ji dengên zincîran ên ku carcaran ji zîndanê dihatin, pêve tu dengên din ne dihatin bihîstin. Gulbahar demeke dirêj di nav nivîna xwe de, xwe da vî alî û wî alî.

Dawîya vî karî tunebû. Çawa bûna jî dê rojekê bihatana girtin. Bavê wê dê Ehmed bikuşta. Heya îro di vê serayê de tiştekî ku veşartî bimana tunebû. Doh yek îro dudû, xwîşkên wê hay li guherînên wê bûbûn. Heger kesekî hevdîtina wan bidîtana, serê sibê dê saray serûbin bibûna. Yan jî Memê dergevan ji tirsa, ji bavê wê re bigota, dê serê xwe xelas bikira. Ma gelo Memo dê bigota?...

Van ramanan û tirsê ne hîştin ku ew razê, rabû ser xwe. Hew dît ku ew li ber deriyê zîndanê ye. Demekê li wir çû hat. Gihaşt ber deriyê Memo. Hinekî jî li wir pa. Dilê wê nedigirt ku li derî bixe. Hîssên ku di dilê wî de bûn, tirs, şerm li berketin, hemiyan li ber hev didan.Memo li hundur

tê gihiştibû ku ew hatiye ber derî, diramiya. Bi carekê derî vekir. Gava Gulbaharê ew dît paşde vegeriya û meşîya. Memo ji paşve gîhaştê û kilît dirêjî wê kirin. Oda xwe şanî wê kir û bi dengekî nizm got: "Li vir peyiva xwe bikin".

Gulbahar bi hemî hêza xwe deriyê zîndanê vekir. Ji pêlika kevirî berjêr bû. Bang kir. "Sofî! Sofî!"

Bêhna Ehmed çikiyabû. Ji evarê ve çavnêriya wê dikir. Ji dema çûbû û vir de, hergav li benda wê bû. Dengekî biçûk dibihîst, radibû ser xwe. Bi lez çû nik Gulbaharê. Destên wan mîna bizotên êgir gîhaştin hev.

Ji bo çi Memo oda xwe şanî wan kiribû û gotibû, li vir bipeyivin. Ma Memo melek bû? Ma merivekî ew çend dilsoz û ciwamêr dikaribû li cîhanê bijî? Şewatek ket dilê Gulbaharê. Ehmed bir aliyekî din. Dîsa ew bir ser zîndanê, aliyê rastê ê qûleya zîndanê, li jora gelî, li bin dîwêr rûniştin. Destên wan di destê hev de, dilê wan bi hev re ûsa bêdeng man. Di bêdengiya şevê de, dengê herikîna xwîna hev dibihîstin.

Gulbahar bidengekî dilşewat pirsî: "Ma raste?"

Ehmed Got: "Çi?"

Gulbahar: "Di nav çel rojan de heger tu hespê neynî bavê min dê serê te ê Sofî û ê Mûsa Beg bide jêkirin."

Ehmet got: "Rast e."

Gulbahar mîna binale peyivî. Lê ne hat zamîn ku çi got. Ehmed "Ma ez têm bîra te? Dema ku li zozanan li ser gola Kûpa dawet çêbûbû?"

Gulbahar got: "Tu caran ji bîra min neçûyî. Tu sergovend bûyî. Ma ez jî têm bîra te? Ehmed:

"Wek a nuha têyî bîra min. Di lingên te da pawanên ser ên mercan hebûn."

Gulbahar ne li ser heşê xwe bû. Di nav xewn û xeyalên xweş de bû. Hêdîka peyivî û got:

"Li zozên li ser gola Kûpê, dengbêjekî pordirêj bi sêroj û

sê şevan stirana Siyamend û Xecê gotibû, xellas nekiribû û hîn di destpêka stranê de bû.
"Ew wê istiranê di çel rojan de xellas dike." "pir dirêj e".
Gulbahar: "Heger hesp neyê, bavê min dê serê we hersiyan bide jêkirin" Kesreke pir kûr kişand û got "Axx...
Ehmed got: "Dê serê me bide jêkirikin, bera bide jêkirin. Lê ma serê Sofîyê sed salî jî têt jêkirin? Aha ev zilm e. "Ji roja cîhan bûyê cîhan, zilma waha ne hatiye kirin, ne hatiye dîtin, ne hatiye bihîstin. Heyfa Sofî, pir pîr bûye. Lê qet ne xema wî ye. Her li bilûrê dixe. dikene, bi pişta xwe ya xûz dilîze. Gunehê min li Sofî têt. Pir gunehê min tê. Heger ji destin min bihata, min dê Sofî xellas bikira. Serê kalemêrekî wuha nayê jêkirin. Dibêjin paşe dibêje, ez dê liber çavên wan pêşî pêşî serê Sofî bidim jêkirin.
Gulbaharê got: "Bera qet kes neyê kuştin".
Ehmed got:"Bera paşe nebihîse. Dê te jî bikuje."
Gulbaharê bersîva wî da: "Bera bikûje." Bi dengekî têr û bixwe bawer: "Bera bikuje."
Ehmed: "Dilê mi ji bo Mûsa beg jî dişewite. Ji rûyê min e. Ma ez hespê bidim anîn? Dê bibêjin ji canê xwe tirsiya, hespê ku diyariya xwedê bû dîsa zîvirand paşê. Ez nikarim li rûyê kesekî binêrim. Lê canê Sofî û Mûsa Begê?
Weke ku parçekî goşt ketibû gewriya Gulbaharê. Serê xwe danî ser sînga Ehmed. Bê rawestîn digiriya. Di dilê xwe de digot, serê hespê bixwe. Serê hespê bixwe.
Keleşêrên sibê bang didan. Ji çiyayê Agirî royê sor dikir. Ne wek royê bû. Mirova digot qey sêveke camîn û sor e.
Destên wan mîna xuriya êgir ji hev veqetiyan. Ehmed berê xwe da zîndanê. Gulbahar bê, lelat li wir ma. Li paş wî nêrî û ma. Ji bo rabûnê di çogên wê de hêz nemabû. Dema nîvro bû hê ji nuh ve ji cîhê xwe rabû. Difetisî.
Mafir bavê wê gotibû ez ê wan bikujim, dê pêkbanîna. Ji

padîşahê ferman jî bihata dê bikuşta. Heya nuha keskî ne dîtiye ku wî peyva xwe xwariye. Rewşa Ehmed jî pir xerab bû. Heger hesp bidana û ji zîndanê derketana êdî di çavên xelkê çiyayî da ne hêjayî pênc qirûşan bû. Gunehê Mûsa Beg û Sofî çi bû? Ehmed dê çawa ew bi xwe re bibirana mirinê?

Ev yek him ji bo Ehmed him jî ji bo Gulbaharê bûbû derd û kul. Mirina Ehmed jî, ew xellas ne dikir.

Ji bo Gulbaharê hîvîyeke biçûk jî tunebû. Li tu çîyan rohnayî xûya ne dikir. Bêhêvîtiyê wek aveke hêdî doraliyê wê girtibû. Wê dê bifetisandana. Di jiyanekê de kêfxweşiya çel rojî...

Heya mirinê dilxweşiya wê dê ev bûna. Şahiyeke çel rojî. Ew şahî jî bi girtina destê yekî mirî dibû, bi hembêz kirina yekî ku li ber serjêkirinê ye, dibû... Ehmed hespê bîne û serê wî jinebe jî, gulbahar dê nikaribe heya mirinê careke din wî bibîne Ehmed dê biçûna çiyayê xwe, ew dê jî fena kevirê binê bîre, li serayê bi tena xwe bimana. Ji bo wê êdî jiyîn temam dibû. Bi ser de Ehmed ji hesp ne dida. Li ber çavên Gulbaharê serê wî dê jêbikirana. Serê bi xwîn, û jêkirî bi darekî ve girêbidana û li bajêr bigerandana. Ew rîha wî ya zêrîn bi xwînê, dê bihata avdan. Gulbahar difikirî, digot, dilê min ne digirt ku wî rûyî maç bikim, ew dê di xwîna ser de bidin, û digiriya.

Û laşê Ehmed dê ji birca kelehê biavîtana, jêr. Li vî alî û wî aliyê zinaran biketana, perçe bibûna û biketana, binê gelî. Digot: "Destê min nediçû ku maç bikim". Gulbaharê canê xwe xistibû devê xwe û li riya rizgarîkirina Ehmed digerîya diramiya.

"Bera ew bijî, bera qet ez jî heya mirinê rûyê wî nebînim. Bera ew bijî... Û li çiyê mîna keriya guran zarokên wî çêbin. Tenê bera ew bijî bera ez bimirim.

Dibe ku çareyek peyde bibûna. Ma bavê Mûsa Beg dê



bihişta ku serê lawê wî welê jêbikin? Begên Kurd ên din... Mûsa Beg bûbû goriya derewên wan. Heger ew herin, ji bo serê Sofî, Ehmed û Mûsa Beg wî hespê ji xelkên Agirî bixwazin gelo çiyayî dê hespê nedin?

Çiyayî merivên serhişk in. Li kesekî guhdarî nakin. Lê kesek biçûna ji wan hêviya tiştekî bikirarana tu caran ew destvala venedigerandin. Li Agiriyê her tişt li gora toreyan dimeşiya. Kesekî nikaribû pêl toreyan bikira. Vê ramanê piçekî hêvî da dilê wê.

Piştre hat bîra wê. Ya ez biçim ji çiyayîyan hespê bixwazim? Çiyayî tu caran jin nedişikandin. Kengî beg ji bavê min tirsiyan û neçûn ba çiyayiyan ez dê biçim nik çiyayiyan... Ezê Ehmedê xwe rizgar bikim. Careke din jî heya mirinê rûyê wî nebînim. Bi qasî kerîkî guran zarokên wî bibin...

Divîya ji yekî re, ji yekê ku ew pê bawer bû, ew yek bigota. Dibe ku ew bi xwe biçûna nik çiyayiyan. Yan jî ji bavê Mûsa Beg re xeberek bişanda. Da ku bavê Mûsa Beg bişandana nik çiyayiyan.

Heya sibê dilê wî girt û da. Birayê Gulbaharê,ê

ji dê û bavê wî, Ûsif, ji wê pir hez dikir. Hat bîra wê ku dilê xwe ji Ûsif re veke. Gelo Ûsif dê ew ne kuşta ? Gelo Ûsif yekê ku mirov pê bawer bûna? Ûsif dê bi wê re biçûna hesp bixestena? Yan heger biçûna nik çiyayiyan, çiyayiyan ew di cîhê Ehmed de bigirtana? Ew bi xwe, bi serê xwe biçe dê dest daneynin ser wê? Gulbahar xwe bi xwe aciz bû. Û got ez neheqiyê li çiyayiyan dikim. Ew ne mîna bavê min in. Ew, mêvan û qasidên ku diçin nik wan dil nagirin. Ew destên xwe nadin jinekê ku ji bo tikakirina tiştekî çûye nik wan. Jinikek ji wan re çi bike bera bike dest nadin wê.

Çû odayê Ûsif. Ûsif hîn raneketibû. Li ser textê xwe paldabû. Şûrekî kevin, tûj û pak dikir. Dixwest nexş û nivîsana ser şûrê biderxîne.

Gava çavên wî bi Gulbaharê ketin bişirî û got:

"Xêr e Gulbahar, vê nîvê şevê?"

Gulbahar çû li nik wî rûnişt. Rûyê Ûsif ziravî dirêj, zerî çilmisî bû. Mirov digot qey, rûyê wî hîç tav nedîtiye. Ûsif pir jî dirêj bû. Bi awakî xweş li Gulbaharê nêrî. Çavên wî tije pirs bûn. Gulbaharê destên xwe avêtin istûyê birayê xwe û da girî. Piştî ku hinek giriya, Ûsif bi dengekî sar wek qeşayê pirsî: "Çi bûye. Çima tu didî girî Gulbahar?"

Gulbahar got: "Hebe tunebe, tu dikarî ji derdê min re çareyekê bibînî."

Lêvên Gulbaharê lerizîn. Demekê bê peyv ma û piştre got:

"Tu dê min ji mirinê rizgar bikî".

Ûsif hîn pirtir şaşbûyî lebikî û qîriya:

"Çi bi te hatiye keçê?"

Gulbaharê li ser hev û zû zû gotê: "Bavê min de serê wan bide jêkirin. Divê em rê li ber wî bigirin. Em herin nik çiyayiyan, hespê ji wan bixwazin, çiyayî dê hespê bidin me. Birayê min Ûsif heydê em herin nik çiyayiyan... Dibe?

Ûsif got: "Ji te re çi ye? Çi karê te bi wan heye? Gava bavê min serê wan xayinan jêbike çewtî nake. Çi karê te bi wan heye?.

Peyva xwe bi carekê re qût kir û çîk çîk li Gulbaharê nêrî û qêrîn pêket.

"Yan na Gulbaharê, yan na?"

Gulbaharê bi dengekî pir nizm got: "Belê"

Ûsif çeng bû ser piyan.

"Ew Ehmed e ne wer? Bavê min dê te bikûje. Dê bikuje! Bavê min dê te bikuje, bikuje..."

Usif di nav odê de diçû û dihat. Hin bi hin ji ser heşê xwe diçû û dihat guhartin. Mirov digot qey govendeke agir a kevin digerîne. Û di ber xwe de jî digot: "Bavê min dê te bikuje,... bikuje... bikuje... bikuje..!"

Weke ku dinalîya, qet ranediwestiya. Ji tirsan çavên wî fireh bûbûn. Gulbaharê got qey wî heşê xwe wenda kir.

"Ûsif tu dîn bûyî?"

Ûsif pir keniya û lê vegerand. "Tu dîn bûyî tu! Tu dîn bûyî, Tu!... Bavê min dê te bikuje".

Gulbaharê bi hêviya dawî got: "Ûsif, Ûsif Ûsif tu dê bi min re werî em biçin hespê bînin?"

"Tu dîn bûyî. Tu dîn bûyî?"

"Lê heger hesp neyê dê serê wan û serê Ehmed jêbikin Ez ê jî xwe bikujim."

"Tu xwe mekuje Gulbahar. Çi dibe mekuje. Ez nikarim hespê bînim. Bavê min dê te bikuje. Dibe Gulbahar, çi dibe xwe mekuje. Belê Gulbahar?"

Ûsif şaş mabû, tirsiyabû. Tirs, lebak û rewşa wî Gulbahar jî tirsandibû. "Di te de hêvî nîne," Gulbahrê destên wî girtin û naliya "Lê vî tiştî ji kesekî re mebêje. Ûsif ji diya min re jî... Heger haya Gulistan û Gulrîzê jî ji vî tiştî hebe dê min bikujin, dê min perçe perçe bikin. Ji kesekî re nebêjî.Dibe?"

"Ezê ê çawa bibêjim? Piştre bavê min dê te perçe perçe bike. Her tîkekî te jî dê bide segekî. Ma tu nizanî ez na bêjim? Tu jî ji kesekî re mebêje Gulbahar".

Ûsif hatibû guhartin. Ji çavên wî tirsê xûya dikir. Tirsiyabû teyrek dema ditirse çawa serê xwe dixe nav perên xwe, ew jî waha bûbû.

Gulbaharê ew tişt ji Ûsif hêvî nedikir. Ûsif merivekî leheng û xwînsar xûya dikir. Çawa bi wî xapiyabû. Gelo Ûsif dê bikaribû ji bavê xwe re hemî tişt bigotana? Kî dizane dibe jî here û hemî tişt jî ji wî re bibêje. Ew çend tirsiyabû, heye ku vê tirsê, hemî tişt bi wî bidana kirin. Gulbaharê Ûsif di nav wê tirsê de hişt û ji odê derket.

Li navsera çiyayê Agirî, roavayê başûr bi navê gola Kûpê golek heye. Gol bi qasî cihê bêndera kayê ye. Rengê ava golê şînê tarî ye. Mîna çalê ye. Di jêra zinarên tûj û sarê tarî de ye. Hersal gava bihar destpêdike hemî şivanên Agirîyê tên qiraxa golê, kulavên xwe ên bi nîşanê royê, li ser axa reş radixînin. Û li dora golê rêz dibin. Bilûrên xwe derdixînin, ji avêtina tîrêjîn royê heya roj diçe ava li çîroka hêrsbûna çiyayê agirî dixin. Çavên şivanên çiyayê Agirî xweşik, reş û xemgîn in. Tilîyên wan dirêj û pir xweşik in. Rihên hinekan xelek xelekî û zerê zêrînî ye. Dema ew li bilûrê dixin, çûkekî sipî û biçûk li ser serê wan dizivire. Gava ro diçe ava, şivan di nav tariyê de wenda dibin û diçin, tam wê gavê çûkê ku di ser wan re doş dibû, dadikeve ser golê, baskên xwe li ava şîna tarî dixe, piştre ew jî bi şivanan re di nav tariya şevê de wenda dibe. Li cîhê ku çûk baskên xwe dixe avê, pêlên biçûk çêdibin. Ew pêlên biçûk freh dibin û tên li qiraxa golê dikevin. Piştre siya bi hespekî mezin dikeve ser ava golê, diherike û diçe.

Saray li aliyê başûrê çiyê, li serê zinarekê avabûbû. Di jêre wê da gelîkî kûr hebû. Ji binê gelî deşt dest pê dikir. Di deştê re riyên mezin derbas dibûn. Qeza Beyazidê li

Rohilatê sarayê li qiraxa Agirî cîh girtiye û malên wir jî hemî ji axê çêkirî ne.

Çirayê dikkana Hisoyê hesinkerê por sipî a ku di bin zinareke mezin de bû heya sibê pêdiket. Heya sibê çirîska rohnayiya hesinên wî kom kom di nav tariyê de belav dibû. Hin caran wan çirîskan wek çirûskên muqeddes doralî rohnî dikirin. Şevên ku kêfa Mehmût Xan xweş dibû, heya sibê ji pencereya xwe li çirîskên ku ji deriyê Hiso derdiketin û di tariyê de wenda dibûn, dinêrî.

Salên Hiso nedixuya. Li wê dikanê ew û pênc lawên wî bi hev re dixebitîn. Şûrên bi zêr neqişandî tûj û saxlam çêdikir.Ji roja ku xwe naskiribû û heya nuha Hiso lingên xwe neavêtibû sarayê û qesra Beg. Di meha rojiyê de rojî nedigirt. Qet nimêj û dua nedikirin. Hinan digot Hiso baweriya xwe bi êgir tîne. Hin şevan Agirê xwe xweş dikir, dikir hundurê dikkanê û derîyê wê di çiriskên êgir de dihişt. Hiso li ber wî êgirî li ser çogên xwe rûdinişt û destên xwe ji êgir re vedikir.

Çi havîn, çi zivistanê Hiso tiştek li xwe nedikir. Hew li ranên xwe şalikeke pir qalin dipêça. Şemleke sor li nava xwe digerand.

Gulbaharê bêhêvî li pencereyê derve dinêrî. Xelkên bajêr hemî di xewê şirîn de bûn. Çêkên êgir kulu, kulu ji dikkana Hiso difiriyan û di nav tariyê şevê de kom kom wenda dibûn.

Û li hundur, li zîndanê, Sofî, ji kûraniya dilê xwe li bilûrê dixist û li çîroka serpêhatiya Agirî dixist. Li cîyekî dûr, li deşta Beyazidê, hespek dihîriya mirov digot qey dîn bûye. Bi tirs û bi lebik.

Gulhabarê got: "Sofî".

Sofî bilûra xwe danî û bersîv da: "Sofî bi goriya te be".

"Hindik ma ku serê we jêbibin. Ma qet çareyek nîne?"

Sofî got: "Nîne."



Gulbaharê got: "Tu ji vir derkevî û biçî hespê bînî, serê wan jênabe..."
Sofî got: "Nabe, hesp nayê Sofî bi goriya zimanê te be".
Di wê tariyê de ew û Sofî demekê bêdeng li ba hev rawestiyan. Ne Sofî axifî ne Gulbahar.
Gulbaharê bi dengekî nizm gotê:
"Lê nabe" got dengê wê miçiqîbû. "Tucaran nabe. Guneh e. Zilm e, nabe... Xwezî ev saray ji binî hilweşe".
Dengê wê hîn pirtir miçiqîbû.
Sofî got: "Bera ev saray hilweşe".
Dengê Sofî ê nerm bi dengê Gulbaharê ê miçiqi ve tevli hev bû.
Gulbaharê: "Ji bo hespekî, ma hêja ye ku çar can herin".
Sofî bersîv da: "Ev saray dê hilweşe. Ew ne hespek e. Hezar saray..."
Gulbaharê "Gelo tu çare nîne. Sofî, ma tu dibêjî ez biçim çiyê? Bigihêm ezbeta Ehmed, bibêjim Sofî hespê dixwaze?
Sofî got: "Nabe"
Gulbahar: "Ma ez herim xwe bavêjim dest û pîyên bavê xwe ji ba ku dev ji hespê berde?"
Sofî got: "Nabe delalîya min". "Nabe, Sultana min. Ma canek ew çend hêja ye? Sofî bi goriya zimanê te be. Ew zimanê hungivîn û xweşik... Sofî bi goriya porê te yê zer be. Sofî bi goriya çavên te be. Çavên ahû...Sofî goriya bejna te, bejna zirav...
Sofî bi goriya dilê te be, evîna leyla... Him jî kura êgir... Ezgorî, çareya hertiştî heye lê dawiya vê evinê nîne. Sofî goriya bêçaretiya te be. Ji bo te ev a bi xêr e... Sofî goriya bêhêvitîya te be".
Gulbaharê got: "Ez dizanim" û ji kûr de keserek kişand.
"Ev ji ba min hîn çêtir e. Ez dizanim ku dûr yan nêzîk bavê min dê serê we herduyan jî jêbike. Lê hindik ma Sofî

pir nêzîk bavê min dê serê we jêbike. Ez dê jî xwe li ser goristgana wê bikujim. Sofî ez xwe davîjim bextê te, alîkariya me bike."

Sofî careke din ne peyivî. Gulbahar bê ku bizanibe çi dibêje, peyivî. Sofî wek kevirekî bêdeng ma. Careke din deng ji Sofî ne hat.

Gava Gulbahar ji wir çû. Sofî bilûr xistibû devê xwe û heya sibê li bilûrê xistibû.

Gulbaharê ji pencerê temaşa tariya şevê dikir. Careke din li dikkana Hiso nêrî. Ji dûr ve li serhêla Agiriyê xumîniyek bi çiyê ketibû. Mirov digot qey çiya bêhnê digire û dide.

Ji dikkana Hiso, kulmek çirîkên êgir peqîyan û deriyê dikkanê rohnî kirin. Dengê Hiso û ximîna çiyê di nav hev de wenda bûn.

Gulbaharê nikaribû di cîhê xwe de raweste. Dil, mejî, serî û hissên wê hemû bi hev re ji bo peydekirina çareyekê dixebitîn. Gulbaharê ji marê erdê bigire heya bi çûkên ezmana hêviya çareyekî dikir. Diavêt wî alî ne dibû, diavêt vî alî nedibû. Çuqas radikir û datanî bêçare dima. Bê ku çavên wê tiştekî bibînin, di sarayê de diçûn û dihatin. Bi carekê ket dilê wê û got:

"Ev Hiso agirperest e. Sêrbaz e. Merivekî baş e jî. Divê ji vî derdî re çareyekê bibîne."

Hema derket derve. Raste rast çû dikkana hesinker. Di nav kulmek çirîsk de derbasî hundur bû. Hundurê dikkanê germ bû. Weke herdemî jora laşê Hiso tazî bû. Wî, gava Gulbahar dît şaş nebû. Destekî wî bi hebana wî ve bû. Hebana xwe kişand. Piçek serê xwe zivirand û li wê nêrî. Weke ku ji zû ve ye li benda Gulbaharê bû. Di rûyê wî de hawakî waha çêbû. Hebana xwe ranewestand. Hinekî li hesinê ku di nav êgir de ye nêrî. Hesînê mîna pizot ji argûnê kişand, danî ser êrs, denbor lêxist, ji wî hesinî bi qasî ku

hundurê dikkanê rohnî be, çîk belav bûn.
Piştî hinekî Hesinker Hiso bişirî û got:
"Bi xêr hatî Gulbahar Xan".
Dilê Gulbaharê xweş bû.
Dengê Hiso bawerî dida merovan û pirî germ bû.
Pêşî Gulbaharê çîroka hespê hemû ji wî re got. Hiso got:

"Dizanim".
Piştre êdî çi hat bîra wê ji Hiso re got. Rewşa Ehmed, Sofî û Mûsa Begê jî wî re da zanîn.
Hiso bersîv da: "Dizanim".
Piştre Gulbaharê evîna xwe a ku ji bo Ehmed dibihîse , got. Hiso ne go ez zanim, ne jî got nizanim... Kûr kûr ramiya.
Gulbaharê go: "Hefteya pêşîya me, roja şemiyê bavê min dê serê wan li kelehê bide jêkirin. " got "Ma qet çareyek nîne?"
Hiso bersîv neda. Her waha ramiya û ma. Bizotên argûnê xwelî girêdan. Hesin sar bû. Hiso bû wek qeşê û ji cîhê xwe neleqiya.
Bi bangdana keleşêrên sibê, serê xwe bilind kir û got:
"De ka sibe êvarê were nik min... Dibe em riyekî peyde bikin. Dibe ku çareyekê!"
Hêvîyek ket dilê Gulbaharê.
Rayê serê xwe ji qiraxa Agirî bilind kiribû ûsa li cîhê xwe mabû û sor dikir sor û sor... Bayekî hînik ji çiyê berbi jêr dihat. Wek ku diriçîya... Bayeke ku çit û çit deng derdixist.
Ew roj ji Gulbaharê re gelekî dirêj hat û lê nedibû êvar. Li ber pencereya sarayê a ku li beranberê dikkana Hesinker bû, rûniştibû û çavên xwe ji dikkanê nedirevand. Her li wir dinêrî. Bendî sihêrekê bû.
Lê devê deriyê dikkanê refek çûkên sipî çeng dibûn, refekî din, yekî din çeng dibûn. Ezmanê sarayê sipî dibû,

hemî deriyên sarayê vedibûn. Ehmed û Gulbaharê, xwe li çiyayê Agirî li nik gola Kûpê di nav qertelên mezin de dest bidest didîtin. Çavên wan li hevûdin diket û her du bi hevre dikeniyan. Wê rojê heya bû êvar, di dikkana Hesinker de ji bo Gulbahar pir sihêr çêbûbûn. Gulbaharê çend caran xwe xistibû cihê keça ku di nav çîroka stranê Agirî de bû û bextiyar nebûbû.

Û gava ro çûbû ava taqeta Gulbaharê nemabû. Ji dest û piyan bûbû. Nema dikaribû ji cîhê xwe bilebite. Nîvê şevê dema keleşêran bang dan bi hal bûbû. Xwe bi dîwaran girt û dilê wê wek dilê çûkan diavêt, çû nik Hiso.

Hiso têgihişt ku keçik bûye nîvmirî. Di dilê xwe de got:

"Heywax min nizanîbû ew çend e . Di rojekê de keçik bûye wek miriyan".

Hiso jî dabû bala xwe û ramiyabû. Lê riyek nedîtibû. Gulbaharê welê li Hiso dinêrî ku... Wî nikaribû bigota min çareyek peyde nekir.

Hiso got: "Keça min, berî serê wan jêbibe ez dê riya anîna hespê peyda bikim. Tenê li wê gundê jêr li ser riya Karwanan Şêxê Karwanan heye. Tu here nik wî jî."

Gulbaharê got: "Ez Şêxê Karwanan dizanim. Lê ew naxwaze kesekî bibîne."

Şêxê Karwanan pir kal bû. Rîha wî ya dirêj û sipî, wek berfa ku tav bidiyê, hertim dibiriqî. Bi şev û roj li ser postekî hirçan ê pir qalin û bi pirç rûdinişt. Şêx mîna lepek hestî mabû.

Li ber mala wî dareke berûyê a ziyaretê hebû. Ew dar jî biqasî wî şêxî muqqeddes bû. Dibe jî, ji Şêx bêhtir ew dar ziyaret bû. Xelkên wê herêmê kerametên wî Şêxê û wê darê digotin, digotin, xellas nedikirin.

Di ber mala Şêx re , riya karwanan derbas dibû. Riyên ku ji Erebistanê, Trabzonê û ji temama Enedolê dihatin, li wir digîhaştin hev û ji wir jî diçûn Tûranê, Îranê, Hîndist



tanê, Çînê û Maçînê. Karwanên ku ji wir derbas dibûn, hinek pere diavêtin bin koka wê darê. Kesekî nediwêrî destên xwe di wan pereyên ku bazirganan diavêtin bin darê, bidana. Ew pere li wê kom dibûn û diman. Ji cejn heya cejna din Şêx ew pere li xelkên belengaz belav dikirin. Kesekî nikaribû, bê danina peran ji wir derbas bibûna. Kê pere dananîna û derbas bibûna li rê belayên mezin dihatin pêşiya wî û ew tişt li ser zimanê xelkê dibûn çîrok.

Herşev di ser dara ribazek re stêrika Karwanan, heya berbangê diçirisî. Karwanên ku riyên xwe şaş dikirin, li wê stêrkê dinêrîn û riya xwe dinasîn. Digîhaşt hawara kerwanên ku serê wan di belayêde bû.

Hiso gotê: "Tu wî re bibêje, Hiso ez şandime, baş e?"

Gulbahar çû wir. Rûyê xwe di wê darê û di êşîga mala Şêx da. Çû hundir bi silavên Hiso, ên ku ji Şêx re şandibû, Şêx dîtina wê qebûl kir.

Çavên Şêx ên şîn wek stêrkan bûn. Rûyê şêx wek kaniyekê qet aloz nebûbe, zelal, pak rahnî bû. Gulbahar li ber wî xwar bû û sê caran ji destên wî maç kir. û jê re got:

"Ez serekerwanek im, Şêxê min". Got. "Serekarwanekê ku li çiyê maye û hatiye nik te. Min riya xwe şaş kir. Serekarwanek im ku li çiyayê Agirî ketime ber bayekî xurt û heger tu negiyê hawara me, em hemî dê ji hêza bayê bişikên. Ez teyrekî nîv canî me û hatime li ser dara ribazekê ber mala te dabezyame û teyrên nêçîrê nikulên xwe tûj kirine, lepêşkên xwe derxistine li dora min diçin û tên û dilê min dikalin."

Vê rewşa keçikê dilê Şêx şewitand. Xweşikbûna keçikê jî ew girt bin sîdara xwe û got: "Derdê xwe bibêje keça min".

Gulbaharê ji serî heya dawî çîrok ji re got. Şêx destên xwe xiste nav rîha xwe kûr kûr ramiya. Piştre berê xwe da stêrika Karwanan a ku li ser xaniyê wî weke êgir diçûrisî. Pir ramiya. Ew çend ramiya ku ji rûniştina pir, çogên Gul-

baharê tevizîbûn.

Piştre got: "Rabe here keça min. Berî serê Ehmed jêbibe, hin tiştên bi xêr dê bibin. Beriya serê Sofî û Mûsa Beg bête birîn... Alîkî stêrkê tarî bû, aliyek di nav rohniyê de ma. Rabe here keça min. Hêvîdar im ku tu bextiyar bibî. Here ji hesinker re welê bibêje. Ji bo hesp çareyek dê bête dîtin û here jê re bibêje bera were vir."

Gulbahar ji wir derket, serê wê gêj bûbû. Hêvîya wê a biçûk hinekî din biriqî bû. Çû sarayê û pa. Lê dilê wê di sînga wêde cîh nedigirt. Bi şêx, hesinker, dara rabezek û stêrika karwanan bawer bû. Bawer bû lê, her ku roja serjêkirina wan nêzîk dibû, bêhntengiya bavê wê hîn pirtir dibû. Kesek newêrîbû nêzîklî wî bibe. Ji kesekî re yek gotin ne digot, tenê bi serê xwe, xwe bi xwe aciz û dîn dibû. Rengê wî çilmisî û zer bûbû. Hinarkên rûyê wî dixistê vê rewşê. Di vî îşî de tiştek hebû ku bi wî giran dihat. Lê wî nizanibû ev çi ye?

Êdî Gulbahar ditirsiya biçe zîndanê. Memo li hemberî wê pir nerm bibû. Mirov çawa derdê kesekî bêxwedî, nexweş û bêçara baş dike, Memo jî ji Gulbaharê re ûsa alîkarî dikir. Hemû xûrûr û şexsiyata wê bi wê rewşa xwe dixist bin piyan. Di hemû helwestên wî de rewşa melek û pêrîyan hebû. Pêriyek ku ji canê xwe bêzar bûye. Di çavên Memo de jî bedbaxtiyeke mezin, evîneke kûr û bêhêvitîyek dihat xwendin ku heya nuha Gulbaharê di çavên kesekî de nêrîna ûsa ne dîtibû. Dibêjin ya, nêrîna wî kevir û hesin qul dike û digîhê heya kezeba mirov a wî jî ûsa bû. Hemî bextreşî û evîna cîhanê hatibûn di çavên wî de kom bûbûn. Piştî wê, Gulbahar li ser Memo jî pir ramiyabû. Memo serê xwe xistibû bin çengên xwe û hemî daxwazên wê mîna yekî avisînî re diamî cîh.Him jîbi dilxweşîyeke bêsînor, hezkirineke bêpayan ev tişt dikir. Ji Gulbaharê re wekê dihat, ku bigota Memo canê xwe bede min, Memo dê ji

dilxweşî dîn bibûna. Gelo Memo evîndar bû? Gelo Memo dişewitî? Heger waha bûna ma ew û Ehmed dianîn ba hev. Him jî bi bextiyareyeke pir mezin? Heger waha bûna, ji çerm û çavê wî, mezintirîn bextiyariya cîhanê dihate dîtin û qehra mezin...


"Memo, Memo merivê me Memo, ez vê çêyî û dostanîya te heya mirinê ji bîra nakim. Heya ev giyan ji vî laşî dernekeve, ez te ji bîra nakim".

Gulbahar bêyî ku xwe şamî Memo bike, li ber deriyê zîndanê diçû û dihat.

Şev bû, ji deriyê hesinker kulu kulu çêkên êgir dipeqijîn. Di wê şeva rohnî û sayî de stêrik li ser ezmanê çiyayê Agirî belav bûbûn. Qet deng tunebû. Dengê pêla bakî biçûk jî nedihat.

Gulbahar wê şevê heya sibê, bêrazan li ber pencerê ma. Gava tîrêjên rojê avêtin, ji kêfan dilê wê hat ber devê wê. Li ber dikkana hesinker hespekî bi zîn hebû. Piştî bîstekê hesinker ji dikkanê derket li hespê siwar bû û berbi çiyê ajot. Gulbaharê dizanibû, ew diçû ku hespê bîne û sedî sed dê bianîya.

Li wê herêmê herkesî bihîst ku li ser daxwaza Şêxê karwanan, Hiso çûye bo çiyayiyan, ji bo hespê bîne. Hemî xelkê Agiriyê ji bo vê yekê kêfxweş bûn. Ji ber ku merivekî wek Hiso gava mohra Şêxê karwanan bigire û biçe ba çiyayan nedibû ku destvala vegeriya. Li vê herêmê, tu kes tunebû ku dijî mohrê rabûna û kes tunebû ku rûyê xwe di wê mohrê nedana. Begên Kurd ên ku xeber bihîstin û bavê Mûsa Beg, kumên xwe ên kulavîn li xwe kiribûn, postên xwe ên bizinan avêtibûn ser pişta xwe, peyayên xwe dabûn paş xwe û hatibûn Qaza Beyazidê. Hemî kêfxweş bûn. Lê tu kes ji wan, hoya çûyina Hiso tênegihişt. Çawa Şêxê karwanan, ew Şêxê mezin dest avêtibû vî tiştî? Ji ku bihîstîbû



ku ji bo hespekî serê sê kesan dê jêbibe? Şêxê karwanan têkiliya xwe ji vê cîhanê û karê wê nedianî ku....

Ji bo jêkirina serê wan, sê roj mabûn. Heger hesinker Hiso heya sê rojan ji çiyê nikaribûna vegeriyana dê çi bibana? Vê ramanê dilê wan hemiyan teng dikir û kêfa wan direvand.

Mehmût Xan jî çûyina Hiso bihîst. Ji qehran bû wek dînan. Çi hat devê wî ji şêxê karwanan re jimart. Ji roja Şemiyê re çi ma bû ku? Ji xwe çiyayiyan hesp nedidan. Şêxê karwanan bi xwe here jî, dîsa ew gurên har hespê nadin. Heger bidin jî... Heger bidin jî...

Mehmût Xan, di nav sitûnên rengorengo ê mermer de, di odayê xwe ya sarayê a mezin de doş dibû û diqîriya.

"Heger bidin jî, heger bidin jî... Heger hespê bînin li ber deriyê min girêbidin jî, roja şemîyê ez dê stûyê wan li birca kelê bidim jêkirin. Ez ê laşê wan jî bavêjim ber segan...Wan ji bo hespekî li hember Osmaniyan ala serhildanê rakirine. Di berbanga sibê a rohnî de xwîna wan dê bête rijandin. Xwîna wî kalê pirpitî û serhişk Sofîyê hezar salî jî..."

Hîn waha bû ku êvara roja Pênçşemê Hiso hesp anî, li ber deriyê sarayê ê mezin girêda. Li qezê bû cejn. Herkesî cilên xwe ên weşik li xwe kirin. Jinan xeml û xêza xwe girêdan.

Gulbahar ji kêfan dîn bû. Bê ku rewşa Memo bîne bîra xwe, bazda, çû nik Ehmed. Ew çend kêfxweş bû ku, bêhêvitiya ku ketibû ser Memo nedîtibû jî. Çavên Memo ên reş û xweşik bi xemek bêçare ketibûn kortê û ketibûn tenêbûnekê. Di cîhaneke bêdeng de bi tena xwe mabû. Gava ji pişta xwe bi zorê kilît derxist û direjî Gulbaharê kir, mirov digot qey bêdest e. Kilît bixwe çûn ketin destên keçikê.

Piyên Memo li hev geriyan. Bi wî awayî Memo berbi deriyê sarayê meşîya. Dema li ber deriyê sarayê hesp dît, pi-

çekî hat ser heşê xwe. Hesp li wir wer girêdayî bû. Serê xwe bilind kiribû, bêhna şevê dikişand. Piştî ku hatibû kesî destê xwe pê nekiribû. Tişt û xeml û xêzên ku li ser wî bûn di tariyê de dibiriqîn. Bi dijminatiyeke pir mezin li hespê nêrî. Heger bi xwe nikaribûna, dê şûrek biavêtana hespê û ew bikuştana. Dikir ne dikir ev raman ji mêjiyê wî dernediket. Destê wî li ser destikê şûrê wî, bi raman kuştinê, li dora hespê diçû û dihat. Bi bêhntengî, bi kuştina wî diramiya. Hemû laşê wî mîna ku di avê de bûbe, ji xûydanê şil bûbû.

Û li jor jî, li ser zîndanê, li aliyê gelî, di oda dergevanan a kevin û vala de, Ehmed û Gulbaharê hevudu hembêz kiribûn. Şevê bi ewrekî zêrînî ê evînê, ew nizumandinbûn ketibûn ber lehiya evîneke mezin, herdû jî ji xwe derbas bûbûn. Di dema mirinê de, evîna dawî, evîna jiyanekê xistibûn şevekê û gavekê. Xwîna wan di damarên hevde diherikî. Agirekî pir germ, laşê wan ên tazî gîhandibûn hev. Heger ne li ber mirinê bûna, wekê ne dibûn, di agirê evînê de waha ne digîhaştin hev.

Destê sibê Memo, ew li jora gelî di cîhê nobedaran ê kevin de dîtin. Eba Ehmet a ku ji postê pezkoviyan çêbûbû, li xwe pêçabûn û bûbûn cendekek... Ûsa can bi can. Rohniya hungûrê xwe bera ser wan dabû. Şûrê Memo tazî di destê wî de bû, ji bêhntengiya dilê xwe, lêvên xwe gez kiribû. û simbêlên xwe quraftibû. Dev û rûyê xwe di nav xwînê de hiştibû.

Rûyê Gulbaharê di berbangê de mîna ê zarokekî bextiyar dixûya. Memo, li beranberê wî rûyî sekinî û nêrî, dilê xwe bijand. Bêhntengiya wî hînekî çû. Şûrê xwe yê dirêj paşda vegerand û xist kalanê wî û ji wan bi dûr ket. Dîsa çû nik hespê. Dîsa bêhna wî teng bû. Li çarmedora hespê doş bû, doş bû, di nav xûydanê de ma. Careke din şûrê xwe kişand. Di destê wî de şûrê wî bibazdan berê xwe da geliyê

jêra serayê, daket, piştre hilkişîya. Hat bîra wî ku hemû deriyan veke, û hemû kesên sarayê bide ber şûran... Hemî



kesan... Lingên wî ew kişandin birin zîndanê. Dest bi şûr careke din li devê deriyê holika nobedaran a kevin rawestiya. Nuha rûyê Gulbaharê hîn çêtir dihate dîtin. Lêvên wî hinekî ji hev çûbûn diranên wê ên sipî weke diranên zarokan xûya dikirin. Kortikê honarikên wê hîn xweştir bûbûn û porê wê, rûyê Ehmed veşartibû. Memo dîsa bi dilbijokî li wî rûyî nêrî û ma. Dikarîbû jiyanekê û hezar salî waha bimana û li rûyê Gulbaharê temaşa bikirana. Lê sibe dibû. Hindik mabû ku şiyar bin. Dema li rûyê Gulbaharê bi heyranî dinêrî ji ramanên xwe ên ku şev ramiyabû, şerm kiribû. Li wê dinêrî, dinêrî, fena ku careke dîtir dê nikaribe wê bibîne. Dixwest şeklê rûyê wê di mejiyê xwe de bikole

û di reşikên çavên xwe de bineqişîne.

Memo nerm bûyî, şermok, careke din ji wan dûr ket, çû ba hespê. Û bi şermî dema çavên wî li hespê ketin dîsa acîz bû. Paşê çend carên dîtir hat holikê. Rûyê Gulbaharê ê ku her diçû rohnî dibû û vedibû, dilbijokiya Memo hîn jî pirtir dikir.

Dawiyê Gulbahar şiyar bû. Di rohnayiya sibê de merivê ku dest bi şûr hatibû ser wan, dît. Têgihişt ku ew meriv Memo ye û çi dixwaze bike. Xwe hinekî din nêzîkî Ehmed kir. Ev tişt ûsa xelas bibûna hîn baştir dibû. Ehmed jî mêrikê dest bi şûr dîtibû. Qet xwe nehivandibû. Wî jî xwe nêzîkî Gulbaharê kiribû û gotibû, wekê hîn çêtir e. Ji xwe dawiya vî tiştî tunebû.

Hilm jî nedikişandin. Di rohnayiya sibê de herdûyan jî li bendî şûrê zirav û ku mîna dilopeke ava rohnî li ser wan bû, mabûn. Memo sê caran bi hemî hêza xwe, şûrê xwe li ser evîndaran hilda û bi şûnde kişand. Destê wî li wan negeriya û şûr li wan neda. Memo dizanibû ew wî dibînin ku ji bo wê hîn pirtir xwe bi ser hev de didin û bi wê awayî mirinê dipên.

Dîsa çû ber deriyê sarayê, nik hespê, careke din şûrê xwe kişand. Nobedaran, nobeta xwe diguherandin. Bi bez wek dînan dest bi şûr, çav bi xwîn, carekê ji hêsp, berbi zîndanê, carekê ji zîndanê berbi hesp diçû û dihat. Ji şûrê wî yê girs tîrêjên birûskê diçurisîn.

Dawîyê şûrê xwe li kevirê zîndanê ê şîn û xurt xist. Hemî xelkê sarayê, hemî xelkê Beyazidê çîrqîniya şûr bihîstin. Şûr wek kulmek xwê hûr hûr bû. Her parçakî wî çû alikî.

Memo hat holika nobedaran a kevin. Hinekî din li wan bi dilbijokî nêrî. Nuha baş nerm bûbû. Bû melekê berê.

Bi dengekî westiyayê: "Dinê rohnî bû, sibe ye, ma hîn hûn radikevin." got û ew şiyar kirin. Wan xwe bi hev zeliqandibûn. Hîna li bendî belakê bûn.

"bû sibe , haydê rabin, hin kes dê we bibînin... zûka" got û derket çû.
Herdû evîndar ji bin ewrê evînê ê zêrînî derketin. Gulbahar bi bazdan çû deriyê sarayê. Hesp bêdeng li wir bû. Bi tîrêjên rojê ên serê sibê, zîv, sîm, zêrê taximê wî dibiriqîn.
Gulbaharê bi hemî dilxweşiya xwe, demeke dirêj, xwe li ber roja ku nuh destpêdikir, rakişand
Hesp hat. Êdî Ehmed dê biçûna. Careke dîtir jî dê nikaribûna Ehmed bidîtana. Hemî bextiyariya wê ya imrekê dê di nav vê hezkirina kurt de bibûna. Hemî jiyana xwe dê bi bîranîna vê şevê ve derbas bikirina.
Gulhabarê got: "Zor sipas ji vê rojê re, zor sipas ji vî çiyayê birqonek re. Zor sipas ji xwedê re, ev jî besê min e. Zor sipas."
Êdî derûdor baş rohnî bûbû. Ro bi qasî minarekî bilind bûbû. Hemû begên Kurd bi kêfxweşî, hêdî, serê wan li jor yeko yeko, dido dido dihatin. Li pişta wan şûrên wan ên giran hebûn. Kî dihat pêşî diçû li dora hespê digeriya, li hespê dinêrî û bi awakî nazîkane paşde dizîvirî û diket sarayê.
Ji dîwana sarayê a mezin û a pir bi sitûn, dengekî pir bilind û stûr dihat. Mehmût Xan qîrqîr dikir. Ji qehran zer û çilmisî bû, dilerizî û digot:
"Ev ne hespê min e." "Li ber şêx stûyê me ji mû temiktir e, lê ev hesp ne hespê min e. Roja Şemiyê di dema hungûrê de serê wan dê jêbe."
Begê Zîlan, Mustafa Beg xwest bibêje:
"Paşa ev hespê te ye. Ez nas dikim." vê gotinê paşe dîn û har kir.
"Beg, beg ez ji te re dibêjim. Qey tu jî ji wan î? Qey tu jî?
Begên din gotin: "Paşe, wî dixwest tiştekî din bibêje. Tu çewt têgihiştî."
"Ez, ez çewt têgihiştim? Hûn dixwazin çi bibêjin? Ez

çewt têgihiştim?"
Gotin: "Istexfirillah paşa, me çewt tu serwext kirî. Ma tu caran tu çewt têdigihêjî?"
Dawiyê beg bêdeng man. Careke din jî devên xwe xenekirin. Kêfa wan nîvçe ma.
"Belê gelî began! roja şemiyê, berbangê, serê dizên hespê min, ên ku hespê min dizîn û neanîn, li ber çavên xelkê Osmanî û li ser birca kelehê dê bête jêkirin. Ez a nuha bankeran dişînim bazarê bera xelkê ji vê yekê agahdar bikin.
Begên Kurd hemî, li dîwanê li ber paşê rawestiyan, Dilê wan şikestîbû. Di dilê hemiyan de daxwaza serîhildanê hebû. Bê hêvî, bêhêvî ji wir derketin. Dîsa li dora hespê çûn û hatin, baş bala xwe danê û gotin:
"Ev hespê wî ye. Welleh, bileh, ev hespê wî ye. Ev nîşan a wî ye."
Çima paşa ji van hersê kesan hêrs bûye? Çima serê wan dê bide jêkirin?
Bi ser de jî gotin:
"Bera jêbike" "Neheqî heya qiyametê namîne."
Hemiyan bi hev re qîriyan û gotin "namîne."
Piştre hemî xelkî qezê bihîst. Banker paşê derketin bajêr û biryara kuştina wan hersê kesan û sûcên wan xwendin.
Hisoyê hesinker ji bîhntengî dîn bû. Bi çakûçê destê xwe mîna babîzokekê hat ber deriyê sarayê qîriya û got:
"Ev zilm e paşe. Ev zilm e. Ev zilm weha berdewam nake. Berdewam nake. Hesp ê te ye. Tu ne rewayî wî hespê yî, lê ev hesp ê te ye. Ez derew nakim. Min hesp anî paşa ev ê te ye.
Dawiyê hevsarê hespê vekir û hesp berda.
"Paşa tu ne rewayê vî hespê yî. Tu ne rewayê mirovatî yî jî paşa... Tu, tu, tu ne rewa yî..."
Hesp serberdayî, ket nava Beyazidê, mal bi mal, firoşgeh

bi firoşgeh, li hemî Beyazîdê geriya. Piştre hat meydana sarayê. Serê xwe bilind kir. Firnikên pozê xwe vekirin. Bi xurtî bêhn kişand. Piştre jî hîrînîyek lêket. Ew hîrînî ûsa bû ku erd û ezman pê re hejiya. Hespê dêla xwe bilind kir carekê du caran weke ku dixwaze bifire, rabû ser piyên paş. Dûre bi çargav berê xwe da çiyê. Li qiraxa çiyê wek stêrkekê dişemitî.

Kesên ku hîrîmiya hespê bihîstin gotin:

"Dawiya wî paşayî mîne.

Celladan kêrên xwe jên giran tûj dikirin, ji bo serê sibê xwe amade dikirin.

Gulbahar dîn û har bûbû. Nikaribû di cîhê xwe de bimîne. Heya lê bû êvar, di nav sarayê de weke miriyan çû û hat. Gava êvar bû û tarî ket erdê, berê xwe da kargeha hesinker. Hiso got: "Em çi bikin keça min, ji destên me tiştek nehat. Ji nuha û pêve nema têt. Şêx jî nikare tiştekî bike. Min jî nikaribû bikira. Li eniya me waha hatîye nivisandin. Ma em çi bikin."

Gulbahar bêdeng digiriya. Di dilê xwe de digot:

"Ez dê axûyê bidim wî... Axûyê marê çiyayê Agirî ê boz dê bidimê... Ez ê axukî bidim wî ku ne bide ne bistîne. Di cîhê xwe de bimire. Ez ê nehêlim ew bijî"

Vegeriya sarayê. Li Ûsif geriya ew dît. Gelo Ûsif nikaribû tiştek bike? Ûsif pê re ne peyivî jî. Bi awirên dijminatî li wê nêrî. Ew çend tûj nêrî ku Gulbahar di cîhê xwe de sar ma. Çû nik kizirê sarayê. Bavê wê jî kizir Îsmaîl pir hez dikir. Û gotinek wî ne dikir dido. Dît ku kef bi devê Îsmaîl Axa jî ketiye. Biryar da ku xwe bavêje ser diya xwe. Nikaribû nêzêkî diya xwe jî bibûna. Di wê sarayê de hemû tişt, herkes, dîwar, sitûnên mermer xaliçeyên kurdan ên ku li erdê raxistibûn, jê aciz bûbûn. Heya bi pisîka wê ya Wanê, sipî û gira sa ku çavek wê şînê din zerê zêrîn bû, bûbû dijmina wê. Bi nêrînên dijminan li wê dinêrî. Gulbaharê,



pisîka xwe ya ku di nav livîna xwe de mezin kiribû û a ku çavên wê di nav rohniya zêrîn û şîn de bidiriqin girt hemêza xwe, dest bi girînê kir û got:

"Pisîka min, pisîka min a sipî û a çav zêrîn. Ez ji te re dibêjim, tu serwextî derdê min bibe. Ew dê Ehmedê min ê ku min bicarekê dît û wenda kir, bikujin. Ew qertelê çiyayê mezin û evînî dilê min bû."

Bi wî awayî pir peyivî. Di hembêza wê de pisîkê dikir new new. Her diçû bêhêvî dibû. Serê xwe dabû ber dîwarê bêhêvîtiyê, li ber xwe dida, diperpitî.

"Sibe serê sibê dê serê Ehmed jêbikin, pisîka min. Dê wî bikujin, tu dibihîsî? Dilê min dişewite, pisîka min. Ez dê jî xwe bikujim."

Pisîka wê di bersînga wê de, bêheş bêheş çû ber deriyê zîndanê. Pisîk germ bû. Her diçû new newa xwe pirtir dikir.

Derîyê zindanê sar bû. Memoyê dergevan pala xwe dabû şûrê û ebayê xwe a ku ji çermê pezkoviyan bû û heya kaboka wî dadidek li xwe pêça bû. Rûyê wî ê xweşikî dirêj, çavên wî ên reş, rîha wî ya dirêj û xelek xelekî, ketibûn xe-

mekê.

Gulbaharê ji pisîka xwe re digot:

"Heger sibê, serê Ehmed jêbikin ez dê jî xwe ji gelî bavêjim ser laşê wî."

Ji ser heşê xwe çûbû. Nizanibû Memo ew gotin bihîstin.

"Memo, Memo, te pir qencî bi min kir careke din min û wî bîne rûbarî hev..."

Piştre bi dengekî nizm, bê heşê xwe peyivî:

"Memo wî berde bera here. Ma qey xatirê min li ba te nîne?"

Pisîka xwe avêt erdê û xwe avête destê Memo. Memo di cîhê xwe de mat mabû.

"Memo! Memo! di destê te de şûrekî mezin heye. Çavên te yên reş wek pêtî ne. Tilîyên te yên zirav wek qeleman e. Zendên te xurt in. Bejnek te ya dirêj heye Memo. Merivê min Memo, ev tişt hemû ji dilxweşkirina paşê pêve kêrî çi hatine? Ev hemî ji jêkirina serîyan pêve ji bo çi kar kirine? Bê serjêkirina mirovan, kêrî çi hatine? Memo, Memo, Memo! Ehmed berde tu çi bixwazî ez dê bidim te."

Memo axîniyeke ûsa kişand ku Gulbahar, ji dengê wî vecinîqî û hat ser heşê xwe.

"Ez çi bikxwazim tu dê bidî min?"

"Tu çi bixwazî ez dê bidim Memo, lehengê min Memo, merivê min Memo.

Memo careke din pirsî:"Ez çi bixwazim tu dê bidî?"

Gulbaharê lê vegerand: "Canê min bixwaze, canê xwe didim Memo.

Gulbaharê nikaribû tirsa ku di dengê wî de ye veşêre. Dîsa got: "Çi bixwazî ez dê bidim Memo. Çi bixwazî... Hew bera Ehmed rizgar bibe."

Memo bêdeng ma. Nema peyivî. Ramiya. Rûyê wî li ber rohniya kêm bi dilxweşî geş bû. Piştre Memo bişirî. Destê xwe dirêj kir.Linav porêGulbaharê gerand.Dilê wî nedigirt

ku dest bidiyê. Gulbahar bi hemî lebatên laşa xwe li bendî daxwaza Memo bû. Dengê Memo ne wek berê bû. Memo bextiyar û bi kêf bû. Bextiyarî jê difûriya. Wek merivê ku li cîhanê gihaştiye hemî miradên xwe, bêdeng û bikêf bû.

Got: "Ez çi bixwazim tu dê bidî?"

Gulbaharê bi dengekî rehet û bixwe bawer bersîv da.

"Belê ez dê bidim."

"Çend mûyên porê te dixwazim."

Gulbaharê bê ku birame, destê xwe avêt keziyeke xwe û dirêj kir, got:

"Şûrê xwe bikşîne, jêke Memo Gulbahar bigorî."

Memo şûrê xwe kişand, ji serê keziyê piçek jêkir, girt damî ser dilê xwe û got:

"Tiştgekî din dixwazim."

Gulbaharê bi lez gotê: "Bêje Gulbahar bigorî."

"Dixwazim, Gulbahar, vê şevê û min, heya mirina xwe ji bîra neke."

Gulbahar xwe avêt destê wî, Memo xwe ji nav lepên wê derxist û berê xwe da zîndanê.

"Ehmed, Mûsa Beg, Sofî şiyar bin"

Hersê jî ne razayê bûn. Rabûn ser piyan. Memo zincîrên wan vekirin.

"Hûn dê jî deriyê jêrîn derkevin. Heya berbangê wextê we yê revê heye. Heya wê gavê birevin û azad bin."

Ehmed li ber derî Gulbahar dît. Ew hembêz kir. Gulbahar:

"Zû, zû, zûka. Hindik maye, derûdor rohnî bibe. Leşker dê bikaribin we bigirin."

Ehmed ew berda,ji deriyê zîndanê êjêrîn derketin derve.

Ew çûn û ne çûn Memo jî wenda bû. Gulbahar li wî geriya negeriya, ew ne dît.

Cîhan rohnî bû. Tîrêjên rojê bi awakî xemgîn, kêm rohnî û bêkêf di kêleka çiyayê Agirî re daketin, ser bajarê

Beyazîdê û sarayê.

Cellad gîhaştin zîndanê ji Memo re gotin:

"Memo derî veke û wan sê kesan ji bo birînê amade bike".

Memo weke ku tiştek nebûye, bê deng û devbiken got:

"Min îşev ew berdan."

Celladan bawer nekirin û ketin zîndanê ku çi bibînin, ji wan kesan yek jî li hundur nemabû. Bi lez çûn nik paşê. Hemî tişt jê re gotin. Paşê destê xwe avêt şûrê xwe û raste rast çû zîndanê. Îsmaîl Axa, serhêz û peyayên wî ên ku li wir bûn, hemiyan destên xwe avêtin şûrên xwe. Paşe li pêş ew li dû wî çûn zîndanê. Memo bi tena xwe şûrê xwe vekir û pêşginiya wan kir.

Memo bi ken got:

"Îşev min ew berdan paşayê min. Ma min baş nekir? Min got heye ku bi vê kirê tu dilxweş bibî."


Paşa qîriya û got:

"Seg nanê min li te heram be."

Û êrîşî Memo kir. Peyayên wî jî êrişî Memo kirin. Şerekî hêja destpêkir. Yekî ji wan jî nekiribû nêzî Memo bibe. Hin bi hin çarmedora Memo bi kesên ku şûrkeş bûn tije bû. Û dora wî girtin, şûrkêş pir dibûn. Memo bi şer heya birca kelehê, cîhê ku serê wan dê îro û di vê kajmêrê de li wir jêbibûna hat.

"Paşa, paşa" "Min dikaribû, bi we re li vir sê şev û sê rojan şer bikirana. Lê çi fayde... Ez ji cîhanê têr bûme. Tiştê ku min dixwest, min bi dest xist. Ez ji cîhanê, têrbûyî diçim. Min çend meriv kuştin dê çi bibe? Hew çend koleyên te kêm dibin, ne waha? Di xweşiyê de bimînin. Ji dostan re, ji dijminan re, ji kesên ku ji min hez dikir, nakin, ji kesên dijmin re silavan dikim.

Xwe ji birca kelehê avêt jêr. Gelî pir kûr bû. Dema mirov ji jor de lê dinêrî, Memo wek miriyê teyrekî ku baskên



xwe vekiribû, xûya dikir.

Berî herkesî, Hisoyê hesinker hat ser laşê Memo. Di pey wî re lawên wî hatin. Piştre jin û keçik... Fîxanek ket nav bajarê Beyazîdê.

Hiso hêdî berbi Memo ve çû, ji aniya wî, ew maç kir. Destê Memo ê çepê girtî bû û li ser dilê wî bû. Hiso bi destê Memo girt û bi destên xwe ên bi hêz, destê wî bi zor vekir. Çend mûyên reş di destê wî de wek bizotê reş dibiriqîn. Û weşiyan ser axa kêm çîmen.

Ûsif dil bi tirs, bala xwe dida hemû bûyeran. Ûsif xwîna ku bi axa çimen tevlihev bûbû, dît. Hesp rabûbû ser herdû pîyên dawî. Hemiyan dizanibû hesp ê bavê wî ye. Çima bavê wî qiyma xwe bi hêsp ne anî? Gelo, hayê bavê wî ji her tiştî hebû? Tiştên ku Gulbaharê kiribûn? Ma ji ber wê? Wî her tişt dizanibû. Ma dibû ku edî nizanibûna? Ew pişt dîwarên qalîn dibîne. Peyvên ku li cîhê dûr derbas dibin, dibihîse... Ma ne waha ye? Tiştên ku Gulbahar dike, hemiyan jî zane. Ma Memo çima xwe kuşt? Ji tirsa xwe, xwe kuşt. Ma nikaribû bireviya? Dê bireviya ku? Bireviyana çiyê. Ma nikaribû xwe bavêta keleha Xoşabê? Bireviya ku, dîsa paşê dê ew bida girtin û post bikirana. Dema ku hîn Ûsif î biçûk bû, carekê li meydana bajêr merivek çîp tazî kiribû, hew cîhê wî yê heram girtibû. Paş û pêş li kerê suwar kiribû û gerandibû. Serê kerê wî yekî çavsilpokî û mijank weşiyayî dikişand. Li cîhê mijankên weşiyayî goştekî sor mabû. Şîlaqa çavên wî ketibû ser rûyê wî. Li herdû kêlekên kerê du merivên pir girs hebûn. Di destê yekî de kêrekê mezin bi xwîn di destê din de xencereke biçûk î birqonek... Weke ku nuha li ber çavên wî ne, dihat bîra wî, merivê, dest bi xençer destên xwe dirêjî guhê mêrikê ser kerê, ê ku kom bûbû û destên wî bi werîs girêdayî bûn, kiribû û guhê wî yê çepê bi kêrê jêkiribû. Piştre carekê li guh, carekê li xelkê nêrîbû û keniyabû. Merikê guhjêbûyî

bi êşeke pir mezin qîrîyabû û tertilî bû. Benê mûyîn li ser destên wî kortik çêkiribû. Ji cîhê guh, xwîn dihat. Cellad guh avête nav xelkê, di ser serê xelkê re guh ket nav firoşgehekê. Firoşkar yekî girs, poz nikilî, rîhreş û qelaw bû. Li guhê bi xwîn ê ku ketibû hundur nêrî, şaş ma. Te digot qey avsinî bû. Li guhê ku xwîn jê dihat, bêdeng dinêrî. Ne dilebitî û çavên xwe nedigirtin.

Ker di nav xwînî de ma. Merivê ku di destê wî de satir hebû, bi satira xwe ya tûj ev meriv post dikir, wek mîhan digurand. Ji qêrîna pir, dengê mêrik ketibû. Qirika wî xirxir dikir. Pir kes kom bûbûn. Rûyên merivan ne ewçend bi tirs bûn. Piştî nivro mêrik anîn, avêtin ser kevirên ber kelehê. Her xwîn jê diçû. Hemî qeza, bi mal, firoşgeh, kargeh û riyên xwe bûbûn xwîn. Ji nav axê, xwînê diavêt. Wê şevê heya sibê Ûsif xwîn vereşîya. Hemî zarokên qezê jî xwîn vereşyîan. Xwînê kef dida. Diya wî li ber serê wî rûniştibû, digiriya. Bavê wî digot: "Dê fêr bibe, tu dê jî fêr bibî. Li vê cîhanê bi awakî din meriv rehet najî..."

Diya wî bêrawestin digirîya. Bêheşketina wê tê bîra Ûsif.

Piştî wî merivî, Ûsif pir caran, merivên ku bi wî awayî paşûpêşî li kerê suwar bûyî dîtin. Mûyên wî jî ne leqîyan. Li ber çavên Ûsif pir serî jêkirin. Li keleha Beyazidê... Bi zincîran, li pir merivan xistin. meydana Beyazidê dema ew tişt dibûn, bavê wî sergêj dibû. Rûyê wî vedizeliya. Çavên wî dibiriqîn. Bejna wî dirêj dibû, polên wî fireh dibûn. Dibû wek merivekî din. Di demên welê de mirov digot qey bavê wî bûye xwedê ê ku çêdike û ê ku xerab dike. Bavê wî di wan deman de dibû wek xwe ilahê tirsandinê ê ku ji çiyayê Agirî bi hezaran deng û birûskan ve daketibû.

Ûsif ji wî pir ditirsiya, bavê wî ji bo wî ne bavek bû, tirsek bû.

Wê şevê heya sibê raneket. Her ku xewa wî ne dihat, ew

çend tirsa wî pirtir dibû.Sedî sed bavê wî dizanibû,Gulbaharê doza hespê ji wî re gotiye.Ew li hêvîya hêvîyeke baş bû.Tu caran wî, hîssên xwe diyar nedikirin. eskirin, dijminatî, bêhntengî, tirsîn û netirsîna wî ji rûyê wî dîyar nedibû.

Ez ji vir birevim, biçim keleya Xoşabê, xwe bavêjim dest û lingên begê Xoşabê, bêjim min mede bavê min, heger tu nikaribî min veşêrî min bişîne vê çola jêrîn, cîyê ku keriyên ahû tê de diçêrin, bişine nav Ereban. Ramiya, got, beg jî jê ditirse. Ji bavê min... Ji bavê min herkes ditirse, Şahê Îranê, Padişahê Osmanî, herkes herkes ditirse. Hew ew Gulbahara mirdar natirse. Hisoyê hesinker û Şêxê karwanan jî jê natirsin. Şêx jê ditirse, lê bes ew herdû natirsin.

Ûsif bi zor ew şev derbas kir. Heger bavê wî bibîhîse ev îş bûne, dê bibêje, lawê min jî, li ber min serî hildaye. Û hayê min nagihêne. Êdî divê ez bimirim. Yan jî divê ji bo îbretî laşê wî bigurînim û çavên wî derînim ku... Yan jî divê ez bimirim, bibêje...

Gava bû sibe Ûsif hîn pirtir tirsiya. Her li bendî celladan bû ku werin destên wî girêbidin û bibin. Ha nuha... Li qiraxa kîlerê odeyeke biçûk hebû. Têra sê kesên ku li ser lingan rawestiyabin, dikir. Hema ket hundurê wê odê. Guhên wî li deng... Digot qey a nuha li hemî aliyê sarayê li wî digerin. Li nav sarayê dê bigerin, wî nebînin, îcar dê siwariyan derxînin ser riyan. Dê bibêjin lawê paşê reviya ye. Hemû cîhan dê li hev biketana. Babet babet gotin dê derketana. Rîwayet dê...

Bi tirs li wir ma. Ji qelişa derî, piçek rohnî diket hundur. Rohnî, zer, çilmisî bû û kêm bû. Piştre di nav tariyê de wenda bû. Ûsif axînek kişand. Îro jî xwe rizgar kiribû. Pêl serê tiliyên xwe kir û ji odê derket. Di ber wî re peyayê kelehê bê ku lê binîrin bi edeb, pate avêtin û derbas bûn. Ûsif li dilê xwe de got, ev kemîn e. Kemina bavê min e. A nuha dê min bide girtin. A nuha... Guhê wî,kutkuta dilê wî,

dibihîst. Ji birçîna qurqura nava wî dihat bihîstin, çû aşpêşxanê. Li derudor bêhna êvara biharê dihat. Hilmek tû a kulîlkekê ji dûr ve dihat. Pozê wî bi bêhna goştê pijiyayî şewitî. Kesên ku li aşpêşxanê dixebitîn, dema Ûsif dîtin rabûn ser piyan. Ûsif hinekî li wir çû û hat. Lê ji şerman ji wan xwarin nexwest. Û li wir nexwar. Ji dîwarê dengê bavê xwe yê hişk û dagirtî dihate bihîstin. Û ji nişka ve, mîna ku bi kêrê were birîn, deng sekînî. Bêrawest, Ûsif ji aşpêşxanê derket, çû eywanê. Li cihê nobetê, nobedar bi simbêlê xwe yê pirûz waha rawestiyabû, nedileqiya. Ûsif ji wir derbasî mizgefta kelê bû. Wek dehbeyek hov ku ji dehbekî din bireve, hat wir û bêhna xwe berda. Piştre çû cihê jinan. Diviyabû hemî tiştî ji diya xwe re bigota. Ji xwe ji birçîna diket, diviya têr xwarin jî bixwara.

Dema dîya wî ew dît, tirsiya û pirsî.

"Çi bi te hatiye Ûsif?" "Tu nexweş î?"

Ûsif bi nalîn got: "Ez nesax im." Û xwe avêt ser nivînê. Di nav êgir de dişewitî. Ûsif sê şev û sê rojan bêhiş dipeyivî. Bijîşk anîn ser. Bijîşkan derman danê. Destên wî hatibûn girtin venedibûn. Piştî sê rojan Ûsif çavên xwe vekirin, destên wê jî sist bûn, tiliyên wî vebûn. Paşê rabû ser xwe mîna ahuyekî tirsoyayî bû. Heya êvarê li kelê çû û hat. Çare tunebû. Diviya biçûna, hemî tiştî weke dizanibû ji bavê xwe re bigota. Ji xwe bavê wî her tişt dizanibû. Bi carekê re Gulbahar hat bîra wî. Ew pir yaman bû. Wê jî zanbibû bavê wê hertiştî zane. Dibe ku ji xwe re riya rizgarbûnê amade kiribû. Hema bi lez çû aliyê jinan, oda Gulbaharê.

Gulbahar rûniştibû, çerx dirêst. Ji çerxê nalînîn kûr û dirêj dihatin.

Çerx Ûsifî dîn kir, heya ji wî hat qîrîya, got:

"Gulbahar." Dengê wî bi zor derdiket. Bi tirs bû. Gulbaharê bi nermî pirsî: "Çi ye Ûsif?" bêdeng bû.

Ûsif: "Bavê min dê çavên me derxîne. Me post bike. Bavê min her tiştî zane".

"Ma te jê re got?"

"Min ne got lê zane. Dê çavên me bikole. Dê bikole Gulbahar!.. dê bikole!.."

Gulbahar: "Kê gotiyî?"

"Ew zane, em birevin erê. em birevin?"

Xwe avêtibû himbêza Gulbaharê, çimên xwe ramedandibûn. Çena wî dilerizî. Ew bûbû mîna ço.

"Ew zane Gulbahar, em birevin!"

"Em birevin ku?"

"Hema ku derê bû. Ew dizane"

Gulbaharê ew danê ser Sedîrê. "Hele raweste." got "Em birevin ku? Hele raweste"

Ûsif "Bavê min ji te re kemînê datîne. Naxwaze haya te bigiyêne ku ew her tiştî zane, anîna hespê, çûyina te ya kargeha hesinker, min jî dît tu derbasî kargeha hesinker bûyî. Bavê min vê jî dizane. A Ehmed jî dizane. Her tiştî dizane. Ew dizane em li vira nuha waha dipeyivin jî. Wî her tişt dîtiye û ew her tiştî zane. Heger em nerevin, bavê min dê çavên me derxîne. Gava ji Îsmaîl Axa re digot, min bi guhê xwe ve bihîst."

"Çi digot".

"Digot ez dê wê keçê û wî lawî bikujim. Ez dipêm ku ka, Ûsif dê were her tiştî ji min re bibêje yan na? Gulbahar dê were xwe bavêje lingên min yan na? Ezê îro jî bipêm... Lê sibê ez dê wan bigirim..."

Gulbahar serwextî her tiştî bû. Wê jî bi salan ew yek waha dizanibû. Bavê wê dixwest di mejiyê hemiyan de baweriya ku ew her tiştî dibîne û dizane, pêk bîne. Ji vê baweriyê xelasbûn jî pir dijwar bû. Mirov çiqasî mejîyê xwe bikar bîne jî, dema ku ev bawerî di mejiyê wî de bi cîh bûbûna, nikaribû xwe ji wê rizgar bikirana. Heger îro Ûsif

negotana, sibe dê hemî tişt ji bavê xwe re bigota. Yan jî ji tirsa dilê xwe dê bimira. Ji ber ku Ûsif nuha ne li ser heşê xwe bû hatibû vir. A dûyim jî heya nuha neçûna nik bavê xwe jî, ji tirsa wî bû. Gulbahar, li ser her tiştî yeko yeko ramiya. Heger Ûsif biçe nik bavê xwe, doza hespê û hesinker ji wî re bibêje, dê her tişt bête zanîn. Û bavê wê dê bizanibûna, wê zîndanî dane revandin. Him dê jî bizanibûna kê Memo şand mirinê û Memo ji bo çi ûsa kir. Memo ji bo çi welê canê xwe dida? Ma bavê wî dê ev yek dernexistana?

Ji nişka ve Ûsif zer û hişk bû û got: "Ez diçim".

Derî girt û derket. Bi bazdan hat ber deryê dîwanê, wekî dînan, xwe avêt destên bavê xwe. Li dîwanê du begên Kurd Îsmaîl axa, subaşî, du bekçiyên şevê û çend derwêşên ku ji dûr ve hatibûn, hebûn.


"Bavo min biborîne, min mekuje, çavên min mekole, çi dibe bavo! Te hemî tişt dît û dizanî. Min biborîne. Min ji te re xinizî ne kir. Min biborîne..."got.


Bê rawestîn û bêhn çikyayî, çawa Gulbahar hatiye nik wî, û çawa jê kar xwestiye, çawa çûye nik hesinker û şêxê karwanan şîrova vekir û ji ku çi bihîstibû jê re got û bi ser de jî got:

"A nuha jî xwe bigihênin. Gulbahar direve. Gulbahar reviya."

Ji nişka ve di mejîyê paşê de, hin dîtinên nuh peyda bûn. Hemû tişt li ber çavên wî rohnî bû. Dikir ne dikir hoya xiniziya Memo peyde nedikir. Peyde nedikir, ji lewra ji êşa xwe, ji acizîya xwe û bêhntengiyê dîn dibû. Ji ber ku, bi qasî ji lawê xwe hez dikir, ewçend jî ji Memo hez dikir.

Herdû milên wî mîna baskên qertelan vebûn, rabû ser piyan. Zer bû, lerizî, du gav avêtin, heger xwe bi diwêr ne girtana dê biketa. Rûyê wî sipî bûbû, lêvên wî zûha û qelişî





bûn. Rîha wî lerizî. Di pey re paşpaşkî kumişî ser text. Destên wî çûn paxila wî.

Bê Îsmaîl axa ên din derketin derve. Ûsif ketibû ser sedirê û mabû.

Paşê got: "Îsmaîl" "Îsmaîl ev çi ye hat serê me? Bela namûsê jî dê bihata serê me?Vê keçî ev tişt dê jî bianiyana serê min? Dêmek Memo ha? Xûya ye, vê fêlbazê devê Memo girêda. Dêmek vê keçê navê malbata min xerab kir, şerefa min daxist pênc peran. Pir bela hatibûn serê vê malbatê, lê ev bela nehatibû Îsmaîl! Em bêhay girtin. Îsmaîl, bera haya kesî ji vî tiştê ku hatiye serê me nebe. Di welatê Osmaniyan ê mezin de ez ê riswa bibim. Dêmek waha ha, Îsmaîl! Lê ez tênagihêm Îsmaîl, ev keç evîndara kê ye? A Ehmed e? Yan a Memo ye? Memo? Memo?

Mahmût Xan dikir, nedikir ramana din a ku dihat bîra wî, rewayî xwe û keça xwe ne didît got:

"Îsmaîl, û rabû ser piyan "Divê tu kes vê yekê ne bihîse. A nuha em nikarin ji keçikê re tiştekî ji bikin".

Îsmail got."Nabe, xelk dê bi Memo ve girêbidin."

"Em çi bikin, bi vê keçê Îsmaîl? çarekê bêje?
Îsmaîl got:."Çareyek."
Bîstik dirêj bêdeng ma.
Mahmût Xan: "Em xwe li nezaniyê bixin. Weke ku me nebihîst û em nizanin, baş e?"
Îsmaîl axa got: "Nabe, em bi tu awayî nikarin wê di kelehê de bêhêlin. Ew ê bireve. Yan bi dizîkan em wê bikujin, yan jî bavêjin zîndanê. Ew bîra ku me Elî Beg avêtibûyê...
Paşê got: "Dibe, lê divê merivekî saxlam deynî ber deran na..."
"Ez ê deynim paşayê min".
Hêdî hêdî heşê paşê dihat serê wî. Doza hespê, strana Sofî, hertişt, her tişt êdî ronî bûbûn. Hemî tiştên ku bûbûn, vekirîbûn. Diviya pêwendiya Ehmed û Gulbaharê jî pir kevin bûna.
Îsmaîl axa pir bilez derket. Tevî du merivan ket oda Gulbaharê. Piştî derketina Ûsif, Gulbahar li hêvîya hatina celladan û Îsmaîl axa mabû. Ji bo her tiştî amade bû. Îsmaîl axa Gulbahara ku li ser lingan, çîk rawestîyabû, şanî wan da. Herduyan ew girtin. Îsmaîl axa li pêş, ên din li paş gîhaştin ber çala zîndanê. Li hundur kesek tunebû.
Îsmaîl axa di qedir de kêmanî nedikir got:
"Xanimê daxin jêr".
Gulbahar bi xwe daket. Îsmaîl axa bi destên xwe derê kilît kir û kilît girt nik xwe.
"Hûn herdû jî dê li ber vî derîyî bin. Serê we biçe jî ev keçik dê ji vir dernekeve."
Paşê jina xwe anî û hemî tişt jê re got. Di pey re Ûsif nîşan da, Ûsif ketibû erdê û ranebûbû û got:
"Di lêwik de hal nemaye. Rewşa wî yekcar ne baş e. Bala xwe baş bidê. Ji te pêve kesek dê cîhê vê keçikê dê nizanibe. Heger Ûsif li ser heşê xwe be, ji wî re jî bibêje bera ji keskî re nebêje."

Paşê Ûsif ji erdê rakir. Li kêleka xwe da rûnandin. Bi gorê wî lîst. Hêdî hêdî Ûsif dihat ser heşê xwe. Paşê jê re digot: "Tu lawê min ê mêrxas î.Lehengê ku rewayî malbata xwe be, waha dike. Û nahêle namûsa wî bikeve bin piyan".

Çavên Ûsif ji şaşbûnê wek piyanan vebûbûn û pirsî:"Tu dê min nekujî? Tu dê çavên min dernexînî?"

Paşê aniya wî maç kir û got: "Tu çi dibêjî? Ji bo vî çêyî û qenciya te ez ê hespekî û çekeke ku tu dipesinînî ji te re diyarî bikim. Çi dibêjî tu? Ji bo çi ez dê te bikujim?"

Ûsif digiriya.

Paşê ji jina xwe re got:

"Xatûn lawik bibe. Ne liser heşê xwe ye. Pir tirsiya ye".

Jinik ket bin milê Ûsif û ew i dîwanê derxist.

Bi derketina wan re Îsmaîl rehet bû got:

"Temam e, paşê min".

"Kes dê nizanibe. Kes dê nebihîse ne waha Îsmaîl axa?

"Ser seran paşayê min".

"Ez nuha rehet bûm Îsmaîl axa. Min dikir nedikir ev tişt ji hev dernedixist. Serê min tevlîhev bûbû. Bera hinek dem derbas be, em dê li çareya serê keçikê binêrin Îsmaîl."

"Em dê mêzebikin, paşayê min. Ew hêsan e. Hela bera wext derbas bibe û her tişt were jî bîr kirin.

Tevî ku wan ew doz veşartî hiştin jî, di demeke kurt de, hate bihîstin ku Gulbahar avêtine bîra zîndanê. Pêşî kesekî bawer nekir. Hisoyê Hesinker û Şêxê karwanan jî bihîstin. Ji xwe wan, ew yek dipan. Piştre xeber li çar aliyê Agirî belav bû, gîhaşte dora gola Wanê. Gihaşte Erzurumê, Qersê û Erzîncanê. Evina Ehmed û Gulbaharê ji bo xelkê bû destan. Dengbêjan, li ser keçika ku di çala zîndanê de ye, stran çêkirin. Bilûrvana û şivanan maqamê stranên danîn û hemî çiyayîyên Agirî ketin şinê.

Xortan, lehengan, jinên têr evîn, hemiyan gotin:

"Heya ew li wir li çalê bimîne, em ê çawa bikaribin li

rûyê hev binêrin."

Bi şevan, xew nediket çavên Ehmed, Şêxê karwanan, Hiso û hemî xelkê derûdora çiyayê Agirî û deşta Erzurimê. Di dilê wan de êşa wîcdanê, şerm û bêhntengî wek birîneke heroj geş dibû.

Mirov dibêje qey, çiyayê Agirî cîhaneke bi serê xwe ye. Giran û bi heybet. Pir caran serê çiyê bi mij e. Hin caran jî cîhê ewran bi stêrkên bela wela tije dibe. Ew stêrkên ku di bahozê de kom kom digerîyan. Li paş şevên dirêj, tav wek parçekî êgir sor, ji nav zikê Agirî derdikeve.

Bi şev çiyayê Agirî hîn pirtir giran, mezin û bi heybet dibe, meriv dibêje qey, cîhan bes li Agiriyê ye. Gumînê bêdengî ya şevê xerab dikir. Ji alîkî heya alîkî. Dema tenha dibû, Agirî dikeliya. Di şevên tarî de, Agirî di nav tariya şevê de wenda nedibû û nediket rengê şevê .Di şevên taride, ew dibû cîhaneke ji şevê hin taritir û li ser cîhanê sîdar dibû.Li ber rohniya heyvêde wek birqînek tenik dihejiya. Bi şevê tirs dide dilê mirovan.Reayiya wî mîna qirê ye.Di şevên tarî û bêstêrik de, ji çiyê dengên hummînî têt. Dengên ûsa mirov dibêje qeyli kûraniya hezar salan derdikeve.

Tarîya fena kevirê giran û wek dîwêr... Weke ku Agirî dimeşiya. Herder bêdeng bû. Wek bêdengiya beriya qiyametê bihnekê...Û şev, taritî dest bi meşê kir. Çermê Agirî ê qalîn dest bi himînê kir. Dawa şevê, bihêrs û bibiryar dimeşiya. Di ezmên de hîç stêrik tunebû. Li pêşî li ser hespê, Ehmed, û piştî wî jî mirovên Agirî... Mal, xanî û gund vala bûn. Ew çend mirov, bi kevirên ku di dema pêlkirina wan de ji ber lingên wan diketin jêr, ber bi saraya Beyazidê dimeşiyan wek pêlekê daketin ser Beyazidê.

Di wê gavê de li qiraxa Wanê jî xelk şiyar bûbûn. Gundên deştê jî... Ew jî herikîn ser Beyazidê. Ew qelebalixa ku wek baranê ku ji ezmên dadiket û wek mêrûyên ji bin axê derdiketin, bi şevê re û bi Agirî ve meşîya ser sa



raya Mehmût Xan.

Dema tav ji paş hêtek Agirî serê xwe derxistibû, car caran wenda dibû, car caran jî xûya dibû. Mehmût Xan ji pencereya saraya xwe, xeyal meyal qelebalixek dît. Dît ku meriv dimeşîn. Ên ku siwar in ên ku peya ne. Hinekan postê xezalan, bizinan, berxikan û cahniyan li xwe kiribûn. Hinekî wan bejn dirêj, esmer, por zer, çavşînî tarî, gewrî dirêj, zend xweşik û çav girs bûn...

Çiqas rohnî vedibû, qelebalix, weke ku ji bin mija belav bûyî, hiêdî hêdî derdikeve, ji bin baskên tarîtiyê derdiket. Gava Mehmût Xan qelebalix dît, bi çavên xwe bawer ne kirin. Çavên xwe girt û vekir. Ehmed li ser hespê bû. Bi carekê bêhna Mehmût Xan teng bû, li derûdora xwe nêrî, xwest fermanekê bide, devê wî zûha bû, piştre ramiya. Heger ew qezeya Beyazîdê bi ax û kevirên xwe hemî bibûna leşker jî, dê li hember vê qelebalixê çi bikarana? Serîkî wê li deşta Beyazidê, ê din nêzîkî serê çiyayê Agirîyê...

Qelebalix hêdî hêdî çû ser sarayê. Wek mojleyan... Qet ji yekî deng dernediket. Ji yekî jî... Bi carekê zîqînîyeke mezin hate bihîstin. Ew deng, dengê deriyê sarayê bû. Derî vebû, qelebalix ket hundur. Dîsa bêdeng û hêdî hêdî ber bi zîndanê ve meşiyan. Îsmaîl Axa Gulbahar ji zîndanê derxistibû, li ber derî dilerizî. Gulbahar li ber ronahiya rojê çavên xwe digirtin û vedikirin. Gulbahar bi çavên xwe yên ku li ber rohniyê venedibûn,, nikaribû serwextî tiştên ku dibûn, bibûna. Tenê dizanibû ew çala zîndanê derxistine. Qelebalixê dîsa hêdî, bêdeng, Gulbahar girt û ji deriyê sarayê derket.

Li wir, li nêzîk, li ba gora Ehmedê Xanê agirekî mezin dadabûn. Derwêş û Sofîyên ku li wir bûn, li ser sofiyên ku bi qasî bênderekê bûn, demişiyan. Mirîdên ku li dora êgir gor girtibûn jî, ji wan re qesîde dixwendin, zikir dikirin û li bilûrê dixistin. Qelebaxlix dîsa bêdeng li dora bêndera êgir

kom bû. Dora çiyayê Agirî tije mirov bûn. Ji pir dûr ve ên ku li ser êgir dimeşiyan xûya dibûn. Laşên derwêşên ku li ser êgir dimeşiyan ên bi xwêdan û tazî, ji nav bizotên ku diçirisîn xûya dikirin Xwêdanê wan weke avê diavêt.

Mehmût Xan digot: "Ez tirsok im".

Şûrê wî di destê wi de bû û dixwest bi tena xwe êrîşî qelebalixê bike. Îsmaîl axa û ên din ew bi zor girtibûn. Mehmût Xan digot:

"Ji îro û şûnde mayîn ji çi re ye?" digot û dinaliya.

"Min navê Osmaniya ê mezin anî pênc peran... Li ber çavên xelkê ez riswa bûm. Heger saray vê yekê bibihîse dê çi bibe? Ji îro û pêve ez bijîm jî çi re ye?

Lê çi qelebalix, ji wê qelebalixê re hêz têr nake ku... Ordî jî nikarin bi vê qelebalixê re derkevin serî... Ev hesp jî çi bela bûye. Mehmût Xan diramiya û di dilê xwe de digot: "Gelo ev bela û ev doza hespê gişk karê xwedê bûn.? Qey xwedê ûsa dikir?"

Qelebalixê heya roj çû ava li wir li ser gora Ehmedê Xanê şahî kir. Li defê xistin, derwêşên nîvtazî li ser êgir bi porên xwe yên gijbûyî, bi lez diçûn dihatin. Dest û lingên wan li hev digeriyan. Xort, keç û jinan govend digerandin. Ew çend xweş dilîstin ku heya nuha kesekî lîstikeke ûsa nedîtibû. Dirêjiya govenda ku xort û keçan girêdabûn, gihaştibû heya sarayê. Heft def û heft zirna li yek maqamî dixistin û ancax ew govenda dirêj digerandin. Pêşmalên jinan ji hevrişîm çêbûbû. Kofîyên wan wek tavê dibiriqîn. Govend, mîna deryayek ku hatibû li qûntara çiyayê Agirî pêldidan, hin caran pêl diherikîn, bilind dibûn, hin caran jî da'diketin, zirav û hûr dibûn.

Gulbahar birin mala hesinker, şuştin. Ji cawê lahûrî celekî ê pêşiyan, kevn û xweşik ê ku mirov digot qey, derzî ji ser ne çûye û wek ê nav çîrokan lêkirin. Dawiyê ew li hespê bavê wê siwar kirin, birin mala Şêxê karwanan. Ji

Ehmed re hespekî din anîbûn.

Ehmed û Gulbahar şêx tewaf kirin û kala wî maç kirin. Şêx jî ew maç kirin û pîroz kirin. Mehmût Xan, hin tişt bi çavên xwe dîtin. Tiştên ku nedîtin jî dawiyê jê re yeka yeka gotin.

Şêx got ku: "Mehmût Xan Osmanî ye, kafirek e. Ew ên ku wek wî ne mîna mirovan in. Vê yekê ji me re nahêle. Ew ê belayekê bînin serê Agirî. Tiştekî nekin jî ew ê zarûzêçan bikujin. A duyim jî, bera tore bi destên me xerab nebin. Ehmed tu nuha Gulbaharê bigire û rasterast biçe keleha Xoşabê, nik beg. Ez ê bi te ra xelîfeyê xwe Birahîm jî bişînim. Begê kela Xoşabê, Ibrahim nas dike. Herin bera begê keleha Xoşabê karê we biqedîne. Ew mirîdê min e."

Toreyeke kevin hebû. Gava xortekî keçek birevanda û xwe biavêta paş hinekan, bavê keçikê kî bibûna jî, xwe diyê malê keç nedidayê. Biçend biha rûniştana ser wan jî, dê bavê keçikê bianînan rê, qelena wê bidanayê, daweta wan bikira. Ji rûyên keçên ku bi vî awayî dihatin revandin, pir xwîn rijyabû.

Naha Gulbahar û Ehmed diçûn nik begê keleha Xoşa bê.Begê keleha Xoşabê, begekî ku bi Osmaniyan, rîv girêdayî bû. Ev keça revandî ne keça Mehmût Xan bûna, keça padişahê Osmaniyan jî bûna, dîsa begê Xoşabê ew ji devê deriyê xwe venedigerandin. Toreya begîtiyê rê li ber vê digirt. Dê şer bikira, serê xwe bidana, begîtiya wî ji destên wî biçûna, lî ê keç û xort ne didan dest. Yan na, di nav gel de riswa dibû û kesekî li rûyê wî nedinêrî.

Keleha Xoşabê, li rohilatê gola Wanê, li ser riya karwanan, li ser çiyayên ku ji deştên bilind xûya dikirin, ava bûbû. Dora wê bi sêrê şûrên xurt û xweşik girtine. Ji binê wê ava xoşabê a zelal diherikî. Kesekî nizanibû kengî keleh çêbûye. Keleh ji sed salan vir de ava bûbû. Di her demkê de parçeyek xistine ser, xistine ser, lê her çi parçekî nuh

lê zêde kiribûn jî, yekeriya kelehê xerab nebûbû. Begê Xoşabê di xweşiktirîn keleha cîhanê de rûdinişt.

Ehmed û Gulbahar li binê zinara kelehê ji hespên xwe daketin. Hesp li jêr, xistin axirê leşkerên begê gund. Gava nobedar, Îbrahîm dît, jê re dua kirin û ew birin kelehê.

Piştî ku Beg hemî tişt ji devê Îbrahîm guhdarî kir, gotê: "Ev Mehmût Xan tore more nizane. Ew ne beg e, ew paşaye ew Osmanî ye. Heger bibîhise zarok hatine vir, dê leşkerên xwe bîne ser me. Em çi bikin. Dema hat em ê rasterast keçê bixwazin. Hemî mal û heyînên xwe em dê bidin û keçikê ji Ehmed re bistinîn. Fermana Şêx li ser serê me ye. Em ê canê xwe jî bidinê".


Û destên xwe li hev xistinn, peyayên wî hatin. Ferman da: "Ji riya dûr hesp ajotine û hatine."

Piştî ku Ehmed û Gulbahar ji hundir derketin, rûyê Begê Xoşabê ê xort, xemgîn bû. Mij daket ser çavên wî. Porê wî yê zer tarî bû. Xwe ramedand. Rabû ser piyan. Bejna wî pir dirêj bû, got:

"Xelîfe!" "Fermana Şêx li ser serê min, lê em dê çawa ji bin vî barî rabin? Yekî din bûna, ez dê li hespê xwe siwar bûma û biçûma, min dê bigota ji bo xatirê min keça xwe Gulbaharê bide lawê min Ehmed. Mehmût Xan ji vî zimanî fêm nake. Ew, tavilê, mirovan davêje zîndanê. Ew mêrxasekî ku li ber xwe dikeve û ji gotina xwe danayê. Ez wî ji Istanbolê dinasim. Bavê min jî bavê wî nas dikir. Ev çi îş e. Ehmed ev keçik çawa ji sarayê revand, ji min re bibêje, em li gora wê çareyekê bibînin.

Îbrahîm pêşî ji hespê destpêkir. Rastiya çîrokê got. Di pey re hemî tiştên ku bûne yeko yeko gotin:

Beg got: "Dijwar e, xelifeyê min dijwar e. Mehmût Xan dîn bûye. Dê bixwaze tola vî ji hemî çiyayiyên Agirî, derya Wanê û dawiyê jî ji min bigire. Ji zû ve ye xeber gihaştîye paşayê Wanê, lê em çi bikin".



Wê rojê heya sibê ramiya, serê sibê bangî Îbrahim kir û gotê: "Binêre xelîfeyê min, ez nuha çi ramiyam. Piştî panzdeh, bist rojên din ez ê Mele Mihemedê zimanxweş bişînim cem Mehmût Xan. Ji bo lihevhatinê, Mehmût Xan çi bixwaze ez dê bikim. Ji Şêxê min re bibêje, heger Mehmût Xan ji bo qelenê keça xwe keleha Xoşabê jî bixwaze ez ê bidimê. Ji Şêxê min re bibêje heger Osmanî, ordiya xwe bişine ser min jî heya ku canê xwe nedimê, keçê nadim tu kesî. Silavên min ji Şêxê min re bibêje. Ji bo ku wî baweriya xwe bi min anî û emanetê xwe yê pir hêja ji min re şand, ez xwe di bin minneta wî de dibînim. Ez destên wî maç dikim".

Wê şevê li kelehê, oda ku ji bo mêvanîn pir bi giranbuha dihate dayîn, ji bo Ehmed û Gulbaharê dan alî. Banê odê bilind bû, erd mermerkirî, kulavên sor raxistî bûn. Li dîwarên wî xaliyên Kurdan ê, bêhempa darve kiribûn. Rûyê orxanê ji atlas bû. Nivînên wan pir fireh bûn.

Gulbahar bi ûsul li hêviya Ehmed ma. Li dîwêr qendîleke zîvîn pêdiket. Bêhneke xweş tevlî danê wê kiribûn ji odê bêhneke xweş dihat.

Berî Ehmed bikeve nav nivînan, şûrê xwe ji kalan kişand

Şûrê tazî danî ser nîvê doşekê. Destika şûr hat ser balgehê. Destika zêrîn di bin balgehê de sar ma. Û Ehmed li hêleka balgihê dirêj bû. Gulbahar bi vê yekê şaş ma. Di rê de, li xana Ercîşê û li Wanê jî Ehmed waha kiribû. Mana vê, ez û tu di nav nivînekê de ne, lê em xwişk û bira ne. Ma di navbera wan de xwişkî û biratî mabû? Li sarayê, li oda ser zîndanê ji ber ku wan dê careke din hev nedîtana, ma Gulbaharê xwe nedabû Ehmed. Ma li wir nebûbû jina wî? Nuha ev çi ye. Bi danîna şûr Ehmed dixwest çi bibêje?

Gulbahar jî hat, ket nav nivînan. Ehmed ne ew maç kir, ne jî destê xwe da laşê wê... Ji xwe mana danîna şûr jî ev bû. Vê şevê yekcar neaxifîn.

Agir ket dilê Gulbaharê. Dilê wê dişewitî. Çi bû, çi dibû? Ma ji Ehmed re tiştek kiribû? Ma toreyêk çiyayiyên Agirî hebû ku wê nizanibû?

Heya sibê xew neket çavên wê. Cûre cûre hoy peyde kirin. Baş na xerab.

Gulbahar bûbû wek tîra kişandî û ji evînê dîn bûbû. Ji xwe re difikirî û digot, rastiyek hebe ew jî guhartina ku di Ehmed de çêbûye. Ehmed weke berê, dema hevudin nuh dîtibûn helwest nedigirt. Hinekî sar, pir bi hêrs û pir xemgîn bû. Çi bû? Ew guherîna Ehmed ji ber çi bû?

Destê sibê, Gulbharê xwe nema girt. Ew şiyar kir û pirsî: "Şiyar bibe. Ez ê tenê pirsekê ji te bikim. Bi rastî bêderew a dilê xwe ji min re bibêje?

Ehmed ne peyivî. Serê çiyayên rohilat rohnî dibû. Rohniya nîv tarî hûr hûr diket ser nivîna wan.

"Te ew şûr çima danî navbera me? Ez dixwazim hoya vê yekê bizanibim. Ma li sarayê ez nebûm jina te? Keskî dîtiye ku li paş wê şûr were danîn? Yan jî hin adet û toreyên çiyayiyan ên ku ez nizanim hene? Heger tu jî min hez dikî tu dê bersîva min bîdî."

Ehmed bêdeng ma.



"Tu dê vêna ji min re bibêjî".

Ehmed bersîv nedida. Gulbaharê bê rawestîn bersîv dixwest. Ehmed ji şerman diket bin erdê. Ramana ku ketibû serê wî, çiqas dixwest jê bavêje, lê serfîraz nedibû. Raman ku dilê wê dişewitand û ew şermezar dikir, Ehmed nekaribû ji xwe re jî bigota, dê çawa ji Gulbaharê re derew bike.

"Toreyek me nîne. Lê toreyek vî kelehê, derûdora vê golê û van deştan heye.... Ji ber wê min şûr xist navbera me. Heya bavê te, te bide min, ez dê destê xwe li laşê te nexim."

Gulbaharê bawer nekir lê bêdeng ma. Hoya ku Ehmed destên xwe li wê nade, wê jî kêm zêde texmîn dikir. Lê wî jî nikaribû ji xwe re bibêje.

Û roj çûn. Kurmekî dilê Ehmed kûr kûr dikola. Gulbaharê ev yek herdem didît. Çavên Ehmed ketibûn kortikê, û rohnayiya xwe wenda kiribûn.

Gulbahar roj bi roj di bin vî barê giran de dihelisî. Çardîwarên tarî bûbûn cîhana wê. Digot mezintirîn neheqî li min bûye. Li keleha mezin, di birê jinan de, bişîn bêxwarin û nîvmirî diçû û dihat. Di heftê de çend caran Ehmed û Begê Xoşabê siwarê hespê dibûn û diçûn nêçîrê. Êvaran, bi bizinên hov, teyrên mezin ên nenas û pezkovîyan vedigeriyan. Di wan rojan de Gulbaharê rehet dikir. Qet nebe Ehmedê ku li ber çavên wê can dida, nedidît.

Êdî Ehmed li rûyê wê jî nedinêrî. Li kelehê herkesî ev rewşa Ehmed didît. Ji çend rojan carekê, Beg Ehmed digirt, digot:

"Ehmed lawê min li ber mekeve." "Hemî ordiya Osmanî were ser mi jî hûn dê bigihên miradê xwe. Kesê ku were mala min dê bigihên miradê xwe. Kesê ku were mala min û şêx piştgirîya wî bike, ma dibe ku bitirse? Ma dibe ku ew kes bêhêvî be?

Ehmed tiştek nedigot, hew ji beg re dibişirî. Kesekî dê nizanibûna derdê ku dilê wî dişetîne çi ye? Gulbahar jî dê texmîn bikirana lê dê nizanîbûna.

Mele Mihemedê ku beriya deh panzdeh rojan çûbû Beyazidê Serê sibehekê vegeriya. Beg û Ehmed xwe ji bo çûna nêçîrê amade dikirin.

Beg, bangî Mele Mihemed kir, ew kişand dîwanê û pirsî?: "Çi bû Mihemed ? Te çi xeber anî? Baş e, xerab e? Mihemed got: "Xerab e". "Riha wî ya sipî ji rûyê wî, ber bi jêr de mîna aveke zelal dirêj dibû. "Pir xerab e. Paşê bi rûkî xerab ez girtim sarayê. Tişt nemabû şûrê xwe bikşîne û min perçe perçe bike. Ji min re got; Min ev kirê dijminatî û bêşerefî ji herkesî hêvî dikir, lê ji wî nedikir. Ji min re got here ji wî re bibêje. Ji min re... Divê keçikê û Ehmed bi hev re girêbide û zûka ji min re bişîne. Di gel leqekî leşker ve... Piştî çûyina te bi panzdeh rojan bera beg ji min re bişîne. Heger keçik û Ehmed neyên ez dê leşker bişînim ser wî û çi hat devê wî ji te û Şêx re got".

"Ji Şêx re jî got? ji Şêx re jî?"

Ji Şêx re jî."

"Ev meriv har bûye, mejiyê wî leqiyayi ye"

Beg ket nav ramanan û derket derve. Ehmed li devê derî, dipa. Beg bê ku tiştekî ji wî re bibêje, ji kelehê berjêr bûn û daketin ser pirê. Ehmed bi meraq li hêviya peyva wî bû. Dawiyê beg li ser pirê rawestîya û got:

"Ev mêrik har bûye. Ji Şêx re jî xeberên nebaş kirine. Bela dê were serê wî. Xwedê giravî di nav panzdeh rojan de dê ordiyê bişîne ser me".

Ehmed got: "Em herin Beg. Bera di rûyê me de xwîn ne rijê. Heyf e."

Beg "Tu naçî tu deran." û qîriya "ji roja ku ava bûye, kesekî bi zorê deriyê keleha Xoşabê venekiriye.Heger hatine Mehmût Xan hebe,tiştên ku dê werin serê wî jî hene. Tu

lawê vê malê yî. Nikarî herî derekê. Ev şerefa min e. Êdî ez heme, tu nînî. Rûne li kelehê û li kêfa xwe binê re."

Piştre dîsa jî Beg û Ehmed diçûn nêçîrê û dihatin. Derdiketin, nêçîrê, çavnêriya leşkerên Mehmût Xan dikirin. Xwe ji şer re amade dikirin. Û ji Agirî, deşta Mûşê, Gola Ûrmiyê, Wanê, Bêtlisê, Diyarbekirê pêşniyara alîkarîkirinê ji keleha Xoşabê re dihat. Ji her aliyê dostan destên alîkariyê dirêj dikirin. Vê yekê dilê Beg pir xweş dikir. Ew dê dîsa li çola kelehê, bi Osmaniyan re bihatana rûyê hev. Ev tişt hemû ji bo toreyên begîtî ên kevin bû û ji bo deynê ku girtibû ser milên xwe, bû.

Bi derketina rojê, ji dûr ve qeflek suwarî xûya bûn. Bi çargav dihatin. Hespên wan çîm boz bûn. Li ser pira jêra kelehê siwariyan serê hespên xwe kişandin. Peyayên begê Xoşabê, bi edeb pêrginiya wan kirin û serê hespên wan girtin.

Begê Xoşabê li ber deriyê kelehê ê hundurîn pêrginiya mêvanê xwe kir. Hemî ji nêzîk ve nas dikirin. Serekêlên wê derûdorê bûn. Dizanibû çima hatine jî. Xûya bû, çavê Mehmût Xan, ji şer nebiribû.

Begê Zîlan, xortekî çeleng, jîr û xwingerm bû. Pêşî ew peyivî. Pozê wî wek nikulê qertelan xwar bû. Dengê wî ji kûr ve dihat:

"Beg bera ji bo vê yekê şer dernekeve. Em hatin çareyekê bibînin. Mehmût Xan leşker kom dikir, me rê li ber girt Gotina dawî a te ye."

Begê Xoşabê peyivî: "Hûn her tiştî ji min çêtir dizanin. Ez nikarim Ehmed û Gulbaharê ji paşê re bişînim. Ev bê çare ye. Dervî vê yekê paşe çi dixwaze li ser serê min. Heger vî xortî û keçikê ji wî re bişînim, heya qiyametê kûçik jî li rûyê min û rûyê malbata min nanêrin. Hûn ewçend beg, ji me re riyekê peyde bikin. Stûyê min li ber we xwar e.

Hirmeta min ji paşê re bibêjin, heger bixwaze hemî malên min û canê min, li riya wî ne. Çi bixwaze ez dê bidim kirin, gundan di riya zavayê wî de bidim. Ew bi xwe jî çi bixwaze li ser serê min... Lê mêvanê ku xwe avêtibe mala min, ji bo canekî, ji wî re venagerînim".

Begê Zîlan got: "Beg rast dibêje. Em vala vala hatin". Ên din jî gotin: "Em vala vala hatin. Me bêxîrêtî kir. Heger piçek mêranî bi me re hebûna, bi daxwazeke welê biçûker em nedihatin pêşberî Beg. Ji me re şerm e."

Roja duduyan li hespên xwe siwar bûn û ajotin.

Mehmût Xan, bi hêvî bû ku Beg dê Ehmed û Gulbahar ji keleha Xoşabê bînin. Ji bo wan herduyan di mejiyê wî de babet babet awayê lêdanê û kuştinê derbas dikir. Û yekcar nedihat bîra wî ku Begê Xoşabê dê keç û Xort nede wî. Ji ber ku forsek pir mezin li wî kiribû. Gotibû ez dê leşkerê Osmanî bişînim ser te. Begê Xoşabê jî ne mîna berê bihêz bû. Çi dibû bera bibûna, wî dê keç û xort bişandana. Begên mezin û esîlzade jî qey vala vala ne diçûn...

Vegera began, a dest vala ew dîn û har kir. Yekcar ew hêvî nedikir. Tiştin dibûn. Êdî kesekî guhê xwe nedida Osmanîyan. Bi begê Xoşabê jî nema dikaribû derketa serî. Divîya hertişt weke wê ji Ristem paşayê Erzurumê re bişanda û diviya Ristem paşa piştgiriya wî bikira ku keleha Xoşabê hilweşîne, bi erdê re bike yek. Diltengîya xwe nîşanî began nekir.

Begê Zilan got: "Begê Xoşabê biheq e. Ji bo canekî meriv nikare evîndarên ku xwe avêtine bextê merivan vegerîne. Divê em çareyekê peyde bikin."

Mehmût Xan nepeyivî.

Wê rojê ji began re xwrineke baş danî. Dîwan pir qelebalix bû.

Serê sibê paşe, ji paşayê Erzziromê re nemeyeke dûr û dirêj şand û hemî tişt nivîsî. Paşayê Erzziromê li nik padişah

merivekî pir giranbûha bû. Bi salan li sarayê, di nav wezîrên mezin de mabû. Heger paşayê Erziromê piştgiriya wî bike, hertişt hêsan dibe û bi hêsanî dê serê Begê Xoşabê ê pozbilind jêbikira. Name pir bidilşewatî nivîsîbû. Di şevekê de, bi sed hezaran mirov, fena gûrên hov daketin ser sarayê û keça min revandine. Li pêşberî qelebalixê, ew û leşkerên xwe, dest û pê girêdayî mane. Bi wê qelebalixa ku fena mojleyan bû, tiştek nekirine.

Piştî demekê qasidê wî ji Erziromê hat. Ristem paşa nameya wî xwendibû, xwendibû û keniyabû. Bi qasid, doza qelebalixa mezin a ku bi şev daketibûn, dabû gotin û kenîyabû. Bi caran bî wî dabû gotin û zikê xwe girtibû û keniyabû.

Dawiyê jî ji qasid re gitibû:

"Pir silavên min ji Mehmût Xan re bibêje, bera keça xwe bide wî xortî, wî lawikî çawa hesp heq kiriye, waha keçik jî heq kiriye. Ji xwe ez ê jî ji wî re binivîsînim...

Mehmût Xan nameya Ristem paşa ku bi destinivîsek xweşik hatibû nivisandin, dixwend û ji wî re digot:" Bêşeref." "Bêşeref, lawê bêşerefan, tinazê xwe bi min dike. De bera were serê wî, bera kûçikekî çiyayî keça wî birevîne, dê bikaribe bikene? Dê bikaribe tinaza xwe bike? Dê bikaribe, bi poz bilindî bibêje ma ji bo keçekê tu dê bi cîhanê re şer bikî? Min jî ev seg dost dizanibû. Li mala xwe, rûmeta ku dida padişahêkê, min da wî. Nuha jî bi vî nameyê tola xwe ji min digîre."

Name li hev dixist, diqulipand, careke din, careke din dixwend.

Wî dê leşker bişandana ser Xoşabê, begê Xoşabê gurê hov zora wî bibira... Heya îro ne hatiye dîtin ku kesekî zora keleha Xoşabê biriye.

Her û her Mehmût Xan acîz dibû. Her ku aciz dibû, çewtiyên wî pir dibûn. Her roj bi Îsmaîl Axa re dipevî,

bangî begên ku bi wan bawer bû, dikir, bi wan dişêwirî. Lê çareyek peyda nedikir.

Di wê navberê de qasidê Begê Xoşabê, Mele Mihemedê zimanxweş dihat û diçû sarayê û digot:

"Paşayê min" "Canê me gorîye te, Begê me dibêje, ji bo vî keçê bera min di nav xelkê de riswa neke. Ez têm destên wî. Heger paşeyê min, mêvanên min ji min bistîne, li vir seg jî nema li rûyê min dinêrin. Li rûyê malbata min jî nanêrin. Qelenê keçê çi bixwaze ez dê bidimê. Heger paşe canê min jî bixwaze ez dê li riya paşê, li riya Mehmût Xan bikim gorî. Dema ew ji Ehmed re jî bibêje, bimire, ew dê bimire".

Roj bi roj Begê Xoşabê li rewşa Mehmût Xan dinêrî, wî dizanibû ku paşe, ji paşayê Erziromê û Wanê, ji begên biçûk û mezin û ji padişahê Îstenbolê jî alîkarî xwestibû. Dawî dawî ev mêrikê bêheş û serhişk dê rojekê leşker bişandanan keleha Xoşabê. Dibe şerekî ku bi salan bajota, destpêkirana. Hejar û belengaz dê dîsa di navê de biçûna. Ev hemî dê ji bo keçikeke revandî bibûna. Kê ev tore derxistibû, kîjan beg û gelê bêmejî ev peyde kiribûn?.

Paşê jî ji vê ditirsiya. Diviya ev tişt girêbidana. Çûna hespê a ber deriyê Ehmed, bi vî çûyînê re distpêkirina evîna wan a mezin, ji rûyê vê evinê û ji rûmeta vê evînê xwe feda kirina Memo, êdî ev doz dikir, dozeke miqqedes. Ev tişt hemî bûbûn hoyên ku Ehmed û Gulbahar fena ziyaretê bêtin dîtin. Dîsa dikaribû çiyayî û deştî şevekê rabin ser piyan. Îcar jî ku rabin di sarayê de kevirkî li ser kevirekî nehêlin û li sarayê kesekî sax nehêlin.

Mehmût Xan heroj ev yek diamî bîra xwe. Êdî xewa şeven wenda kiribû. Guhê wî le ser dengê derve bû. Bi dengekî biçûk jî çeng dibû. Şûrê wî yê tazî di dest de li sarayê fena nûşiyaran digeriya.

Ketibû neqebeke teng. Diviya ji vê yekê re çareyek bidî-

ta. Şerefa wî û a dewleta Al-Osman daketibû pênc peran. Begekî wek yê Xoşabê, biçûk, zora wî biribû û zora Osmaniyan biribû.

Roj bi roj diheliya, nedima. Nizanibû dê çi bike? Êdî bi kesekî re ne dipeyivî. Ji dilê xwe pê dihesiya; her roja ku derbas dibe hîn pirtir dora wî bi xeleka naletê dihate pêçan.

Hersal bi hatina baharê re, li Agirî hemî şivanên wê herêmê, li dora gola Kûpê a ku li navsera çiyê bû, kom dibin, kulavên xwe davêjin ser axa qehwerengî û ser zinarên sor ên ku ji kevirên heste çêbûne, wek xelekê rêz dibin û rûdinin. Hersal hejmara şivanan têt guhertin. Bi rohniya sibê re bilûrên xwe ji milên xwe dadixin, bi hev re li çîroka xezeba çiyayê Agirî dixin. Gava roj diçe ber ava, hêdî hêdî bi hev re bilûrên xwe davêjin milên xwe û radibin. Wê gavê çûkeke biçûk û sipî jî tê, baskekî xwe li ava, golê aşîn û birqonek dixe, difire û diçe. Ji dûr ve, li jor, ji nav berfê, ji bin zinêr hespekî pir girs weke keştiyekî xûya dibe. Di tariya êvarê de taximên wî dibiriqîn. Piştre sîha hespê dibe xeyalek û dikeve ser golê, dişemite, hin bi hin li deştê diçilmise, piç piç dihele û wenda dibe.

Di pey çûna şivanan, dengbêjek din nav konkî de li ser axa biharê a bi nekme, li ser çogan rûdinê, darê xwe dikişîne û dest bi strana xwe dike. Bilûrvanek jî bi wî re li bilûrê dixe.

Ez li ser axa Ahûrê a naletî li ser çogan rûniştim, li ser axa evîna hezar salan û axa bihara hezar salî li ser çogan rûniştim. Min sê caran bang kir, sê caran çiyayê mezin bersîva dengê min da. Li bin bêndera sitêrêkan, li ser kulîlkên sor, şîn û zerê tarî, li ser keska birqonekî, li ser çogan rûniştim. Li pişta çiyê, li ser dilê berfê, li ser çogan rûniştim... Li ber rohnayiya çiyayê ku ji evînên mezin re dilê xwe vekirîye, li ser çogan rûniştim. Min sitrana xezeba mezin got.



Li bin ewrên reş û tarî, di nav bêhna ku mirovan serxweş dike de li ser çogan rûniştim. Li ser pêla pêtiyeke mezin ya ku ji çiyê derdiket rûniştim. Min sê caran bangî çiyê kir. Sê caran bangî dilê axa bihara hezar salî kir. Sê caran jî min bangî guhê axa evinê hezar salî kir. Mi got, şivano, şivano, tu li ku yî? Şivan hat li ber min rawestiya.

Û şivan evîndarê keça Beg bû. Keçik jî evindara şivên bû. Beg ev yek bihîst. Panzdeh gundên beg hebûn. Panzdeh gundên wî jî li geliyê Ahûrî bûn. Beg got ku vî şivanî bigirin, ev şivanê ku dikare evîndarê keça min be, bigirin ez wî sax yan mirî dixwazim.

Çûka evînê bû bizotek û çû li ser dara sipîndarê a bizotî hêlîneke bizotî çêkir. Çûka evînê di wê hêlînê de bicîh bû. Sê çêlikên wê çêbûn. Çûka evînî bi sê çêlikên xwe ên bi zotî firiya. Cihê ku firiya û cihê ku lê venişt kirin bizot. Çiya bû bizot, kevir û ax bûn bizot. Ezman û strêk di nav bizotan de çelqiyan. Meriv hemî bûn bizot. Çûka evînê a bizotî, çû wî aliyê derya û çiyan. Wî aliyê derya bû bizot, pey çiyayan... Kulîlkan bizot vedan. Şînê tarî bizot vekirin, zeran, keskan bizot vedan.

Şivan çû, xwe dispart çiyayê Agirî., Dilê çiyayê Agirî bû bizot. Mêrên panzdeh gundan, ji bo girtin û kuştinê ketin pey şivên, qul bi qul li Agirî geriyan çiyê şivan veşart û parast şivan bû bizot.

Nema debara keçikê hat, wê jî rojekê xwe avêt çiyayê Agirî. Zar, zêç, pîr, xort, jin, mêr, hemî merivên panzdeh gundan îcar ketin pey keçikê. Agirî keçik jî veşart. Keçik bû bizot.

Şivên nema xwe girt. Rojekê ji Agirî destûr xwest û ji cîhê xwe derket got." Bera ez careke din delaliya xwe bibînim. Heger ez bêm kuştin jî bera bikujin" Hat dora gund. Sê roj û sê şevan li dora gund çû û hat. Dixwest mirina xwe bi derengî bixe. Mirin dijwar e. Piştre bi carekê çavên xwe

girt û daket nav gund. Nêrî ku cîhê gund vîkî vala ye. Çû gundê din, çû ê din, dît ku hemî gund meydanên vala ne. Nêrî ku li nêzîkî wî, li nik zinara ku nêzîkî mala wan bû, delaliya wî doş dibe. Herdû delalî gîhaştin hev.

Dilê çiyayê Agirî ji zilm û xerabiyê tije bûye, parçekî xwe bi ser wan de şandiye. Her panzdeh gund, hemî bi hev re, bi meriv û bi tiştên xwe ve di bin wî parçeyî de mane. Çiya ew daqurtandin... Ev xezaba Agirî ye. Çûka evînê bizotek e. Digihê kîjan dilî, dike bizot. Hêlîna evînê bizot e.

Xezeba Agirîyê ye ev. Ev bela Agirîyê ye. Mirov nikare li pêşberî Agirî raweste. Ev laneta Agirîyê ye.

Û her bihar gava kulîlkê dora Gola Kûpê vedibin, hemî şivanên çiyayê Agirî tên rexên golê. Kulavên xwe li ser axa bihara hezar salî radixînin... Û çûka evînê bizotî... Baskê xwe li gola şînî tarî dixe.

Hisoyê Hesinker bi laşê xwe yê nîv tazî, li ber deriyê sarayê heya jê dihat diqîriya, digot:

"Paşe, paşe, te dengê bilûra bilûrvanê baharê bihîst? Tu têgihîştî paşe? Xezaba Agirî bi ser te de bê... Bela Agirî bi ser te de bê. Destên xwe ji sînga wan evîndaran bikşîne."

Mehmût Xan ji peyayên xwe re got:

"Herin wî hesinkerî bînin vir ez binêrim ew çi dibêje? Ez têbigihêjim."


Hiso heya navî, tazî bû. Laşê wî yê xurt ne wekî ê mirovan bû. Gava Mehmût Xan ew bi wî awayî dît, tirs ket dilê wî.

Hesinker pirsî: "Te li dengbêjê ku min ji te re şand, guhdarî kir".

Xan got: "Min guhdarî kir."

"Baş e tu çi dibêjî? Ma qet natirsî" Paşe nepeyivî. Çi hat devê Hiso, got û mîna zinarekî rabû, meşiya. Gava ji derêyî dîwanê derdiket got:

"Tu dizanî paşa. Tu dizanî."



Li pey derketina wî Îsmaîl axa got: "Paşayê min dixwazim çend tiştan ji te bipirsim."

Paşê got: "Bipirse".

"Ma tu caran kes derketiye serê vî ciyayê Agirî."

Paşê got: "Na"

"Ma mirov dikare derkeve wê?"

Paşê got: "Dibe ku karibe derkeve. Lê nikare vegere. Agirî dê wî bigire paşde bernade.

Pir kesan derketina serê Agirî dabûn ber wxe. Lê tu kesê ku çûbû serê çiyayê venegeriyabû."

Tam di navsera jora çiyê de bênderek ar heye. Ji wê navserê kunek dadikeve nivê cîhanê. Pêşî pêşî jar ji wê kunê hatiye girtin. Arê ku mirovan cara pêşî dîtibûn arê dilê çiyayê Agirî bû. Mirovan xwestine wî arî bigirin. Girtine jî... Kesê ku çûbû êr birevîne ji xaqilbûna çiyê destkewtî bûye... Ji bêndera êr, hinek ar jêkiriye û ji çiyê ber bi jêr de reviyaye. Ta daketiye jêr. Tam wê gavê Agirî li xwe hay bûye, nêriye ê ku ar revandiye dûr ketiye. Tavilê li wir ew mêrik rawestandîye û agirê destê wî tavilê kiriye kevir.

Navsera çiyayê Agirî bi merivên ku bûne kevir tijeye. Ê ku derkeve jora navsera çiyê, wê derê bibîne, êr bidize, yan nedize, tu caran efû nebûye û xellas nebûye.

Îsmaîl axa: "Mafir welê ye, pêşniyareke min heye".

"Bêje Îsmaîl"

"Em niha ji Xoşabê re xeberê bişînin... Bera Gulbahar û Ehmed bên vir. Tu bixwazi ez dê herim, wan bînim vir. Heger Ehmed karibe derkeve serê çiyayê Agirî û derketina xwe ji me re bipesirîne em dê bi destên xwe keçê bidinê. Daweta wan jî em dê çêkin. Bi wî awayî em dê jî Ehmed xellas bibin. Ji zimanê zelkê û zilma wan xellas bibin. Gotinek kesî jî namîne."

Paşê got: "Namîne. Rameneke baş e. Îsmaîl. Du sê began bigire nik xwe, here Xoşabê. Bera Ehmed bê, bera

Gulbahar jî were. Heger Ehmed qiyma xwe bi pêşniyara min neyine, ji begê Xoşabê re bibêje, bera keça min bişîne."

Îsmaîl axa, bi pênc kesan re, wê rojê suwar bûn û ketin riya Xoşabê. Ji wan dudo, beg bûn.

Gihaştin keleha Xoşabê. Beg ji hergavî pirtir bi dostayî pêrginiya wan kir. Pir xwarin ji wan re danî. Wê şevê Îsmaîl axa mesele ji Beg re vikir. Beg got:

"Çawa dibe Îsmaîl axa? Ev mirin e. Paşe Ehmed dişîne riya mirinê. Ma heya îro kesek heye ku çûye serê çiya û vegeriya ye? Kesekî dîtiye, bihîstiye?"

Îsmaîl axa got: "Ez nizanim. We digot, hûn çi bixwazin em dê bikin. Va em dixwazin.

Beg bêhêvî got "Em ji Ehmed jî bipirsin, ka bê ew dê çi bibêje"

Heger Ehmed qiyına xwe bi vî daxwaza wan neaniyana, êdî begê Xoşabê ne mecbûr bû û wan di kelehê de bihêle û wan biparêze. Ehmed jî, herkesî jî ev yek dizanibû. A duyem jî gava paşa şer derxe, rewa bû.

Beg bangî Ehmed kir. Li nik Îsmaîl Axa û ên din jê pirsî: Ehmed bê rawestin û bi rûkî xweş got:

"Baş e" ez dê hilkişim serê Agirî. Bi şev li wir agirekî mezin dadim. Paşe dê jî bibine. Em xwe amade bikin."

Begê Xoşabê, Gulbahar û ên mayî, kirin ne kirin, nikaribûn Ehmed ji vê riya man û nemanî bi şûnde bihêlin. Wî dev jê berneda.

Roja duduyan, ji hev xatir xwestin. Suwar bûn berê xwe dan Beyazidî...

Ehmed û Gulbahar çûn mala şêxê karwanan. Hemî xelkên Beyazidê û dora çiyayê agiriyê, hatina wan bihîstin. Hesinker hat mala şêx. Ew û şêx bi hev re li ber Ehmed geriyan. Gotin:

"Ev paşa kafir e. Dixwaze te bikuje."

Ehmed dev ji a xwe berneda. Çiyayî jî hatin li ber Ehmed geriyan. Ehmed li kesî guhdarî nekir.

Sibehekê, çû destê şêx, maç kir, li hespê xwe siwar bû û çû sarayê, derket pêş paşê got:

"Ez derdikevim serê Agirî, paşayê min. Mala te ava be, ku te ez xistim karekî welê dijwar. Heqê te li min heye".

Paşê ji wî re serketin daxwaz kir:

"Hûn dê sê şevan li ser Agirî binêrin. Di demeke sayî de navsera ciyê de biçûrûsîne û bişewite.

Dîsa li hespê xwe siwar bû. Hespê, ew ber bi nawera çiyayê Agirî ve bir.

Qelebalixê, hêdî hêdî meydana Beyazidê, pazara wê û pêşîya sarayê dadigirt. Çiyayî bêdeng, bêdeng ji çiyê weke lehiyekê diherikin û dadiketin, li qezeya Beyazidê dicivîyan. Li jora deştê, ji qiraxa çiyê, meriv dadiketin û dihatin Beyazidê, kom dibûn. Çarşî, kûçe, kolan û mizgeftên qezê dadigirtin. Bêdeng radiwestîyan.

Berî nîvro Îsmaîl axa hat mik paşê. Paşê jê pirsî:

"Ma hîn jî tên. Dawiya wan nehat?"

"Belê hîn tên" got û destên xwe bêhêvî vekirin "pirtir dibin, pirtir tên. Wek lehiyek merivan diherike, diherike û dawiya wê nayê. Çuqas mirov li vî çiyê û li vê deşta me hebûye". Paşê got: "Pir mirov hene, li vê cîhanê pir mirov hene. Lê ji bo tiştekî baş ew çend kom nabim. Ewqas zû ji ku bihîstin ku ew dê hilkişe çiyê? Ji ku bihistin ku tên? Gelo kê hayê wan gîhandê? Ma hîn dê werin?"

Paşe li salona sarayê a bi mermer û pir sitûnî, diçû û dihat. Lingê wî di nav pirça Xalîçê de wenda dibû, rûyê wî dirêj û zer bûbû. Qermiçîna dora çavên wî yên ku wek agir diçirisîn, kûr bûbû.

Piçek bi şerm pirsî: Îsmaîl axa ka a din, a me li ku ye?

Îsmaîl axa qelebalix nîşanî wî kir û got:

"Li wir e. Li pêşiya qelebalixê ye. Nêzîkî gora Ehmedê



Xanê, di nav jinan de ye. Binêre paşayê min, li wir e. Zer li xwe kiriye."

Paşê destê xwe hejand, paşde vegeriya. Dê tiştek bigota, rewayî xwe nedît. Dev jê berda û bê ku li Îsmaîl axa binêre dîsa meşiya. Îsmaîl axa radiwestiya, li hêviya peyva paşê dima. Li pey demeke dirêj, paşe ji nişka ve rawestiya, serê xwe hilda, bi çavên xwe ên mîna bizotê li Îsmaîl axa nêrî û pirsî: "Em nikarin tu tiştî bi vî qelebelixê bikin, em nikarin wan belav bikin. Ma ne waha Îsmaîl axa?"

Îsmaîl axa: "Em nikarin tiştekî bikin; leşkerên me û qişle ji zû ve di nav qelebelixê de wenda bûn. Dê nikaribin tilîyên xwe jî bileqînin. Li sarayê ancax sed û pêncî, dused leşker hene. Bi vê qelebalixê ordî dê nekevin serî."

Paşe keserek kişand û got:

"Nikarin derkevin serî" "Hayde tu here, li qelebalixê binêre, bê hîn tên?"

Wê rojê heya êvarê qelebalix mezin bû. Kom bû. Qeza têra wan nekir, geliyê qezê, deşt başûrê gelî jî tije bûn. Hêdî hêdî bi qiraxa çiyê a jora goristana Ehmedê Xanê ve hilkişiyan. Hîn paşiya qelebalixê nehatibû. Ji çiyê û ji deştê her bêrawestîn xelk dihatin. Piştre ber êvarê kon vebûn, li ber konan agir hate pêxistin, bêhna dohn û bêhna giyayê bişk, tevli bêhna kulîlkên hişk bûn. Lê ev qelebalixa pir mezin, mîna bêcan bû. Bêcan û bêlebat bû. Bê dengî, fena rohniyek bû sîh diçû vî alî û wî aliyê din.

Gava tarî ket erdê, Mehmût xan ji Îsmaîl axa pirsî:

"Ma hîn tên?"

"Erd û ezman bûne meriv, ji stêrkên ezmên, pirtir in. Qelebalixek ku erd wê ranagire..."

"Qet napeyivin?"

"Deng û hîs dernaxînin."

"Ma li cîhekî, li Agirî jî nanêrin?"

"Na, nanêrin, wekê di nav xwe de girtî mane. Tu dibêjî



qey ew qelebalixa mezin radizê. Weke ku axa miriyan ketiye ser wan. Ûsa bêcan in. Di rûyê kesekî de liveke biçûk jî nayê dîtin..."

Şev reş bû. Ezman sayî bû. Li jora qiraxa Agirî stêrk wek ku bi mîxna hatibin sekinandî, kom bûbûn û yek li a din diket. Qor qor rêz bûbûn. Bêdengiyek, wek bêdengiya şînê ketibû ser qezê. Mirovan bêhna xwe jî nedikişandin.

Wê şevê heya sibê xew neket çavên Mehmût Xan... Li sarayê çû û hat. Û ramiya. Di mirin û jiyînê de fikirî. Mirovan, ew mirovên ku li derve bûn, û qelebalixa ku ji van çiyan û deştan hatibûn, difikirî. Ew ji bo bextiyariya jin û mêrikekî, li vir kom bûbûn. Ji derve de waha xûya dikir. Lê di bin wê de pir tişt hebûn. Di bin de, diltengî û aciziyeke mezin hebû. Hîssên serhildana sed hezar salan hebû. Ew hêrsa mezin ku nedipeyivî û ne dileqiya... Hêrsa ku evîna keçik û xortekî kiribû mahne... Hin bi hin dem xerab dibe û gel serî hildide. Îro bi mahna keçikê, dê ser sarayê min de bigirin, dibê dê jî li Istanbolê, bi mahna tiştekî dîtir bi ser saraya padişah bigirin. Ji min re wekê dixûya ku dem hatiye. Heger em çarekê ji vî gelî re ne bînin, serê me hemiyan dê here. Sibe dê zilmê bikin mahne, du sibe dê beşê bikin, sê sibe saraya me, piştî wê dê nên bikin mahne... Û dê kom bibin, kom bibin... Bi êşa sed hezar salan... Fena a nuha bêdeng kom bibin. Û hêzek bi vê qelebalixê nikare. Ordî bi van nikarin. Bi qasî cîhanê ordî hebin bi wan re dernakevin serî. Bera ew nebin yek, ku bûn yek, nema rê li ber wan têt girtin. Çareyek divê. Çareyek ku nikaribin bibin yek...

Rojeke pir rohnî, zelal, li asmanekî vekirî pêket. Û li çiya.piçek derbas bû, rojê xwe bi qiraxa jora Agirî ve girt û piştre jê dûr ket. Bîstekê din dîsa xwe bi Agirî ve girt. Dawiyê ji çiyê baş bi dûrket û rastî çiyê rawestiya. Mehmût xan tu caran ev rewşa rojê nedîtibû. Ji xwe re got, rojê jî

rewşa xwe guhert. Elamet xûya bûn, elametê roja qiyametê...

Piştî ku çêlkên xwe berdidin, mêşên hungiv, kerî kerî li ezmanan digerin. Piştre jî katekî darê peyde dikin û li ser wî hev digirin. Di navbera xwe de qet cîhê vala nahêlin. Vê sibê li qeza Beyazidê jî ûsa bûbû.

Bi avêtina tîrêjên rojê, mêrên bejin dirêj, simbêl dirêj, kumên xwe ên kulavîn, postên xwe ên bizinan, canî û pezkoviyan ên rengoreng li xwe kiribûn, jinên zend zirav çavreş, çavgirs çavê kofiyên xwe yên rengoreng bi zêr û zîv xemilandibû, çend fîstan li ser hev li xwe kiribûn û ketibûn nav hev. Dîsa deng ji wan nedihat.

Dema taştê, di nav qelebalixê de guherînek çêbû. Hemû kesan berê xwe dabûn nav hev, Agiriyê dinêrin û hemî ûsa man.

Mehmût Xan ev tişt dît. Gava ev dît jî pir tirsiya

"Yek car napeyivin ne waha Ismaîl Axa?"

"Qet napeyivin paşayê min. Vaha rawestiyane, bê ku çavên xwe bigirin li çiyê dinêrin. Carekê jî destên xwe ber bi ezmana vekirin û li ber xwedê geriyan.

Ew dê waha sê rojan bipên, gava li serê Agirî rohnahiya êgir nebînin, dê berê xwe bibin sarayê, sarayê hilweşînin, bi erdê re bikin yek, kevir li ser kevir dê nehêlin.

Mehmût Xan got, qey ez bê hoy dikevim tirsê, bê sedem ditirsim"

"Ma hîn tên Îsmaîl Axa?"

"Hin bi hin pir dibin... Ewçend mirov ji ku tên? Kî van tîne? Mehmût Xan bi qîrîn got: "Ew mirdarê pîs, ew kafir, şêxê karwanan. Ew şêx hergav dijminên me ne. Heger em wan nekişînin nik xwe em dê birûxin. Em dê birûxin Îsmaîl Axa em dê birûxin. Hêza wan pir e û di nav xelkê de rîç dane, Îsmail Axa... Rehê wan di kûr de ye. Kokê wan ji sed hezar salan de ketine nava gel, Îsmaîl Axa. Heger em

bi wan re nebin yek... Ji pencerê xelk şanî wî dan "Ha dê waha be, Îsmaîl Axa..."

Îsmaîl Axa got: "Paşayê min, kîjan gava em bixwazin em dê bi wan re bibin yek."

Di serê Mehmût Xan re derbas bû û got, vê şevê ez zar, zêç û peyayên xwe kom bikim û sarayê vikî vale bîhêlim û herim. Ma ew dê nebe tirsokî. Ma haya Îstanbolê dê ji vê yekê çênebe, ramiya, piştre jî... Piştre çarmedora serayê jî pêçane, ma em dê çawa birevin? Ma em dê şer bikin û birevin...?

Bi carkê qîrîya:

"Hele ez ji vir û ji vê rewşê xwe xellas bikim, ez dê serê wî şêxê karwanan û ê wî begê keleha Xoşabê bidim jêkirin. Ez dê serê wan bidim jêkirin. Heger ne ew bûna ew çend qelabalix li dora saraya min nedihatin cem hev. Ez dê bidim jêkirin, bidim jêkirin! Îsmaîl Axa ez dê bidim jêkirin Bera ew bibînin, bibînin."

Heya jê dihat, diqîriya. Damarên gewriyê wî sitûr bûbûn. Ji ser heş çûbû. Got, got, piştre hêdî hêdî bêhna wî derket. Nerm û hêdî bû. "Ez dê bidim jêkirin, bidim jêkirin, ez dê stûyê wan bidim jêkirin. Ez dê ji vê belayê rizgar bibim."

Îsmaîl Axa, li wir, li ber derî, pişta xwe siparti bû sitûneke mermer a sorgevez û li hêviya derbasbûna bêhntengiya Mehmûd Xan bû.

"Ma, dengbêj û bilûrvan jî hatin Îsmaîl Axa?"

"Bi sedan... Bi sedan jî defvan hene. Li hêvîya dawetê ne"

"Îsmaîl axa, xwedê bike li serê çiyê agir pêkeve. Anna..." Mehmût Xan, ji bo ku dîtina xwe û tirsa xwe ji nêzîktirîn destê xwe re got, şerm kir. Di devê xwe de gotin bir û anî û xwest gotina xwe biguherîne, lê bi serneket... serê xwe bera erdê da.

Îsmaîl Axa, têgihişt ku ew poşman bûye, axa serwextî hemî tiştî bû. Axa merivekî vekiribû got:

"Paşa" û dom kir "Paşayê min ev qelebalixa ku dikele, heger îşev li serê çiyê agir nebîne dê bêsebir bibe. Dê bên vê sarayê serûbin bikin. Dê me hemîyan bikujin. Em çima vê yekê ji hev vedişêrin? Çima em nawêrin ji xwe re bibêjin? Ev tiştekî weke qederê ye. Divê em rîya wî bigirin".

Mehmût Xan fena ku can bide got: "Çawa?" "Çareyeke çito?"

"Tu dê dev ji daxwaza xwe berdî paşa. Dev ji daxwaza xwe berde, derkeve ser deriyê sarayê, bibêje, mafir ew çend qelebalix vê yekê dixwaze, ji bo xatirê ve qelebalixê ez jî ji daxwaza xwe derbas dibim. Ji bo xatirê we min keça xwe da Ehmed, herin Ehmed bînin em dawetê li darxin... Tu dê bibêjî, ji bo xatirê we, jî bo dilê we xweş be ez dê dawetê jî çêkim. Piştî wê, ev qelebalix dê te li ser serê xwe bigerîne, ya paşa. Di çavên wan de, tu dê piştî xwedê werî. Weke din jî çare nîne paşeyê min".

"Ez nikarim bikim Îsmaîl axa, dê bizanibin em tirsiyan."

"Tirsa me qet naye bîra wan. Qelebalix fêsadî û tevliheviyê nafikire. Niyeta wan baş e."

"Dê bê bîra wan Îsmaîl. Kesek fena qelebalixê ne bi aqil e".

"Tu çewt î paşe. Xerabkirina sarayê li hîsabê wan nayê. Lê ew mecbûrî xerabkirinê ne. Tevî ku dizanin dê piştre çi bê serê wan, dîsa jî mecbûr in xerab bikin. Mecbûr in me bikujin. Dibe ku nuha Ehmed miribe jî. Dibe ku Agirî ew daqurtandiye, jî... Dibe ku...

"Tu rast dibêjî, tu rast dibêjî. Lê ez nikarim bikim Îsmaîl, Axa, ez nikarim ji gotina xwe vegerim".

"Ew jî ditirsin. Gava tu dev ji biryara xwe berdî ew dê dilşa bibin ji ber wê jî tirsa me nayê bîra wan. Birovaja ew dê te bikin miqqedes. Dê qenciya te derxînin ezmanan. Dê li ser te destanan derxînin."

"Ez nikarim bikim Îsmaîl Axa, ji min nayê. Min bikujin

jî. Him, him, him... Dibe ku derkeve serê çiyê. Dibe îşev em êgir bibînin..."

Îsmaîl Axa bi qîrîn. "Nabe" û qirîya "Agirî nahêle kesek hilkişe jorî wî. Wî digire û dike kevir..."

"Di vê de kerameta şêx heye, dibe ku kerametek..."

"Agirî li kerametan nûnêre. Jî kesekî re keysa, xerabkirina tilisima serê xwe nade."

"Dibe Ehmed neçe serî, li jêr agir pêxe."

Îsmaîl Axa destê xwe avê rîha xwe, keniya. Destên xwe di hev dan, got:

"Ehmed mêrxas e. Dizanibû dê bimire û çû. Dê bigihê serî."

"Îsmaîl Axa ez jî ji a xwe venagerim. Ez ê şer bikim, bikim, bimirim. Rabe here nik leşkeran, bera xwe amade bikin. Leşkerên qişlayê jî bişînin sarayê. Em dê şer bikin û bimirin."

Îsmaîl Axa got: "Dê keysa şer nekeve destê me paşe. Ez qelebalixa waha nas dikim. Heya em çavên xwe vekin û bigirin ew dê me hemiyan paqij bikin."

Paşa bi qîrîn "Bera me nehêlin" qîriya "Em dê di wê dema ku çav têt girtin û vedibin de şer bikin. Here ji wan re bibêje, bera xwe amade bikin ên qişle jî bera bên"

Êdî Îsmaîl Axa nema peyivî. Dizanibû peyva wî kêr nayê. Ji pêkanîna fermana wî pê ve tu çare nema.

Êvar bû, tarî ket erdê. Deşta jêr ji merivan reş dikir.

Hin bi hin mirovên nuh dihatin deştê û çadirên xwe vedikirin. Li ber konan komik komik agir dest bi pêketinê kir.

Dema tarî daket, ew qelebalix jî rabû ser pîyan. Hemiyan serê xwe ber bi Agirî zivirandin. Ewçend kes, bûbûn yek dil û li çiyê dînêrîn. Ev sê roj in ku li hêviya agirê ku wek vedana rojê li serê çiyayê Agirî dê bihatana pêxistin, rawestiyabûn. Hingî dinêrîn, çavên wan bûbûn çarçav.

Mehmût Xan jî li saraya xwe agir dipa. Li hêlekê Mehmût Xan, li hêlekê qelebalix, dilê wan li ber devê wan, li bendî kerameta Agirî bûn.

Keleşêrên nîvê şevê bang dan. Li ezmanan, ji stêrkên ku bi Agirî ve zeliqîbûn, pê ve tiştekî din tunebû. Hêdî hêdî rohniya sibê, xûya dibû. Sitêrka bi terî hêdî hêdî stêrkên xwe yên şîn weşand. Ew sitêrk weke din xuya dikir, weke heyveke seyr xûya dikir.

Îsmaîl Axa bi lez hat, di xûydanê de mabû, got:

"Nuha dest bi gurmînê kirin. Berê xwe jî hêdî hêdî ber bi sarayê ve dan. Ne hemî, hinek ji wan."

Çavên Mehmût Xan bûbûn wek gola xwînê. Destê wî carekê diçû ser şûrê wî, carekê diçû şeşderba nava wî a ku i zêr û qondaxa wê ji diranê fîl çêbûye. Sernaserê şevê destê wî waha çûbû û hatibû. Çavên wî jî her li serê Agirî mabûn.


Îsmaîl Axa Gotê:

"Wekî din rê nîne paşa, wekî din riya rizgariyê..."

Paşa êdî xwe berdabû. Hêdî hêdî, dihijiya û dixwest xwe her kom bike, hêza xwe kom bike. Bi wî awayî ber bi sarayê meşiya ji deriyê mizgeftê derbas bû, li hewşê çend caran lingên wî ber bi paşde diçûn. Xwest vegere, lê nikaribû vegere. Hat ber deriyê hewşê ê mezin, ê ku bi neqişê Selçûkîyan neqişandibû. gava qelebalixê ew dît dengê xwe birî. Wek keviran bêdeng ma. Hilm jî negirtin. Mehmût Xan, demeke dirêj çavên xwe ên girs li ser qelebalixê gerand. Qelebalix a nuha rengê deryayi ku carekê pêlên wî rabûbe û dawiyê daketibe, dida.

Paşe hilkişiya ser mitika ber deriyê sarayê, got:

"Min Ehmed ji bo xatirê we efû kir" û domand. "Daweta wî jî ez ê çêbikim. Mafir hûn ewçend xelk, ewçend kes hatine, nuha ez ê yekî bişînim, Ehmed bidim anîn. Heger di nav we de yekî cansivik û siwarîkî baş hebe,bera xwe bigi



hêne Ehmed, bêje paşe dev jê berda."

Humînîkî ket nav qelebalixê. Pêla deng, çend caran ji alîkî çû aliyê din. Milet bûbû wek tîra kişandî. Şidiyayî bûn hatibûn dereceya teqînê. Paşe serwextî vê yekê bû.

Paşe, jî bi awakî gelek bixwebawer û bêtirs daket. Lê dilê wî ne ûsa bû. Dilê wî kute kut dikir. Bi gavên giran ket sarayê. Peyayê wî sê gava li paş wî dimeşiyan...

Gava Paşe ket hundur, gelek xortên siwarî û peya ketibûn riya Agirî. Qelebalixek weke bifire, herikî ser çiyayî Agirî.

Wê rojê qelebalix sist bû. Dest bi peyivînê kirin. Fena kewara mêşên hungiv li nav hev diketin. Merivan destên xwe bera kêlekên xwe dan, bêkar, li ber tavê, wek pêşmûrdeyan bê ku bizanibe çi dikin û diçin ku, diçûn û dihatin, dizivirîn.

Hesinker bi kêf ketibû nava qelebalixê digot "Kafir hat îmanê." "Tirs ew anî rê. Ew têgihişt ku saraya wî ya zêrî, seraya wî ya zîv û mermerîn dê bête rûxandin. Kafir têgîhişt û hat îmanê."

Herkesî bi dilxweşî li Hisoyê Hesinker dinêrî:

"Heger em hergav, di her tiştî de waha bibin yek, kes nikare zora me bibe. Çiya û şah xwe li ber me nagirin. Kesek... tenê em waha bibin yek."

Li paş wî hinan, ên ku danustandina wan bi sarayê re hebûn, digotin "Agirperest" "Dijminê ol, ji te re çi ye? Em bibin yek an nebin yek tu agirperest î".

Û Hesinker ev gotinên ku li paş wî dihatin kirin ne dibihîstin.

Merivên ku li deştê bûn, carekê hildikişiyan qezê carekê dadiketin jêr xebera ku ji Agiriyê dê bihata, dipan. Hîn ji nuha ve çend kes ji payinê diltengî bûbûn, çûbûn gundên xwe. Her ku dirêj dibû, ên ku dixwestin herin gundên xwe pir dibûn. Ji wê hêrsa wan û sekina wan esreke pir hindik mabû.

Dîsa bû êvar. Roj çû ava. Dengê xelkê ê westiyayî û himîn wan ji kûr dihat. Weke ku ji bin erdê derdiket. Tenê hinan, hinên bi meraq carna serê xwe bilind dikirin, li serê Agirî dinêrîn. Mehmût Xan jî ji nîv seatê, ji seatekê carekê diçû ber pencerê û li ser çiyayê Agirî dinêrî. Tenê yek kes hebû ku çavên xwe ji serê çiyayê nedileqand, ew jî Hesinker bû.

Hesinker digot, min ji wî re pişt da, Agirî dê wî negire. Ew dê wî paşde bişîne. Bi rûmeta rûyê agir û pîran. Agirî

dê ji me re Ehmed bişine.

Û îşev, şeva roja çaran bû. Û bi carekê qîriniya Hesinker ji nav tariyê derket. Paşî wek gumîniya topê, gurmînek, dengek li çiyayê Agirî hat bihîstin. Ji dengê wan çiya lerizî. Ji geliyan, fena teqîna topê, dengê xelkê dihat. Herkesî li serê Agirî nêrî. Li serê Agirî agirekî biçûk diçûrisî, wenda dibû, paşê dîsa xûya dibû, dîsa wenda dibû.

Ew deng bû dilşahî. Dengên dilxweşiyê tariya şevê dagirtin. Dest bi lêdana def û meyê kirin. Keç û xortên ciwan govend gerandin. Daweteke pir mezin destpêkir.

Mehmût Xan got: "Agirî Ehmed negirt, ma çi bû?"

Îsmaîl Axa got: "Ehmed ji Agiriyê ye. Agirî tiştekî bi wan nake."

Mehmût Xan qîriya. "Derew e, di vê de tiştek heye".

Û serê sibê, Ehmed li ser pişta hespê xwe, bi pişta xwe ya rast û bi xwîdan, hat li ber deriyê sarayê rawestiya. Qelebalixê dora wî girt. Nehiştin bikeve sarayê. Ew girtin, birin dikana Hisoyê Hesinker. Ehmed destê Hiso maç kir.

Hiso peyivî. "Pîran alîkariya te kirin, ji vê şûnde jî, bera pîr bi te re bin." Û li ser serê Ehmed peşkên agirê hesin weşand û ew pîroz kir.

Gulbahar hatibû, li qozîkê rawestiyabû. Ehmed li wê ne nêrî jî. Gulbahar ji ber vî rewşa wî dilteng bû. Nepeyivî. Ma ew dê waha bibûna? Wê gavê, çima vî mêrikî wilo canê xwe avêtibû mirinê û li serê çiya ar pêxistibû? Gulbahar serwextî her tiştî dibû. Bi wî awayî, evîna dilê wê jî dibû acizî.

Li pey Ehmed derket derve got: "Em herin"

Ehmed: "Em herin".

Neçûn sarayê. Li qelebalixê nenêrîn. Daweta ku ji bo wan lidar ketibû, nedîtin. Destê şêxê karwanan maç nekirin. Li hespên xwe siwar bûn, carke din ajotin çiyê.

Li navsera çiyayê Agirî golek heye. Fena cîhê bêndereke



ye. Ava wê şînekî tarî ye. Hersal gava bahar tê, her cîhî, sibekê hemî şivanên Agirî, tên ser vê golê. Kulavên xwe davêjin ser zinarên golê yên sar û axa qehweyî. Li ser axa evîna hezar salan rûdinin. Hemî bi hev re bi bilûrên xwe sitrana xezeba Agirî dibêjin. Gava êvar dibe jî, çûkekî sipî û pir biçûk tê, bazkekî xwe li şîna birqonek dixe, difire dere. Piştî wî, li ciyekî ne dûr siya hespekî ber bi golê ve têt û bi hatina xwe re jî wenda dibe. Roj diçe ava, naçe ava, şivan jî bi hev re bilûrên xwe dibirin û di nav tarîtiya çiyayê Agirî de wenda dibin, tevli tariyê dibin.

Berê hespên xwe dan şikefta ku li jora gola Kûpê ye. Li meydana ku li jora şikeftê bû, çadir danîbûn û li qiraxên jêr jî kon vegirtibûn. Rohniya konan a kêm li Agiriyê belav bûbû û dadiket. Ji çaralî bêhnek xurt û tûj ku serê merivan doş dikir, dihat. Demsala payizê ev bêhn hîn xurttir dikir. Hemî bêhn wek bêhna şêvên xerabûyî dihatin. Gîhayên ku şewitibûn û kulilkên sotayî û qemirî xişxiş dikirin. Hesp bi devîkê ve girêdan. Ehmed bi hestê xwe mijûl bû, xebitî û agirek pêxist. Gulbaharê ji derûdor çilo û darik kom kirin. Bi hev re li ber êgir rûniştin. Ehmed ji heqîbê xwe nan, penîrê sîrik derxist, bi hev re xwarin. Yek car ne peyivîn, nikaribûn li çavên hev binêrin. Tenê, gava agir qels dibû, Gulbahar diçû ji derve qeflek hejik dianî. Dûmanê qirika wan dişewitand. Lê herdu jî lê hay ne dibûn.

Ji dûr ve, ji gelî dengên pir xurt ku çiya dihejandin, dihatin. Gumînî pir dihat. Weke ku bi sedan aşit bi hev re diketin. Ev deng ji qeşa ku ji derûdara çiyê jêdibû û diket, dihat û derûdor tije dikir. Û di her demsalê de ji, Agirî qeşayên mezin, mezin wek zinarên biçûk diketin. Dengê ketina wan li geliyan mezin dibû û deng vedida.

Gulbahar ji tirs û êşa dilê xwe, çena xwe danîbû ser çogên xwe û xwe kom kiribû. Bi qasê lepekî mabû. Li der ve bahozekî destpêkir. Û derbas bû. Aramek destpêkir. Pi-

ştre hewa xweş bû. Wext nîvê şevê derbas bûbû, ew her waha li hember hev rûniştibûn. Çavên wan li ser agirê vêketî û welê mabûn.

Ne ew dikare dest bi peyivê bike ne jî ê din.

Aciziya dilê Gulbaharê hîn bi hîn gurtir dibû. Evîna wê çend xurt û kûr ve bû, diltgengiya wê ji ew çend xurt dibû. Bi carekê re teqiya got:

"Bêje Ehmed, tiştek di dilê te de heye, wî bibêje".

Ehmed çavên xwe ên girs û şaş bûyî, vekir, haya wî ji hebûna Gulbaharê çêbû. Weke ku ji pir salan virde, cara pêşî Gulbaharê didît. Weke ku Gulbahar hevaleke wî ya pir kevin bû û dixwest wê binê bîra xwe, ji nêrîna wî ev tişt diyar dibû.

Ehmed nikaribû bipeyive, nizanibû çi bibêje. Dengê Gulbaharê mîna şewatê bû. Diviya bersiva wê bihata dayîn. Ehmed li rûyê Gulbaharê nêrî û waha ma. Paşê hêdî hêdî wek mirinê bi dijwarî:

"Te ez çawa rizgar kirim, Gulbahar? Te çi da Memo û te canê min kirî? Memo çi girt ku canê xwe xist ber canê min? Gava Memo ez berdam, ma nizanibû, ew dê bimire? Vêna ji min re bibêje, zanibû ya nizanibû?"

Rawestiya li çavên Gulbaharê nêrî ma.

Gulbahar got: "Dizanibû. Ew dergevanê ku deriyê zîndanê veke, tu caran li tu cihî, nikare bijî û nikare xwe bisipêre tu welatan, Memo ev zanibû. Ji lew re, şer kir şer kir û çû, xwe ji birca kelehê avêt jêr."

"Te zêr danê da, ku canê xwe da?"

"Na"

"Te saray danê ku canê xwe da?"

"Te çi dayê, Gulbahar, te çi dayê ku li hember wê, canê wî jê girt? Canê xwe bi ê min guhert?".

Got: Min tiştek nedayê Ehmed" "Wî tiştek nexwest".

"Ji bo min rizgar bike?"

Gulbaharê peyva wî birî û got. "Min ji wî re got, tu çi bixwazî ez dê bidim. Wî çi bixwestana min dê bidana û canê te bikiriya, lê wî tiştek nexwest."

"Te ji wî re got, tu çi bixwazî ez dê bidim ne waha?"

"Min got tu çi bixwazî ez dê bidim, wî tu tişt nexwest".

Û bêdeng man.

Agir hêdî hêdî vedimirî. Ji bo Gulbaharê êdî hertişt xelas bûbû. Ew baş tê gihiştîbû ku Ehmed dixwaze çi bêje.

Ehmed rabû yamçiya ser hespê anî, li erda gîha rast kir. Ji giyayê Agirî a bêhnxweş balgîv çêkir. Şûrê di bin rohniya êgir de mat mat biriqî. Dirêj bû, postê xwe kişand ser xwe.

Gulbahar derket derve, destek gîha û çirpî anî, xist ser êgir. Agir gur bû. Bi dilbijokî, bi hesret û birçîtî li rûyê Ehmed nêrî. Çuqas dinêrî, dixwest hîn pirtir binêre. Têr ne dibû, çuqas dinêrî, evîna wê gurtir dibû. Di nav bêçaretiyê de, dipertpitî. Her tişt, her tişt temam bûbû...

Her tişt. Ev êşa malkambax tam di dilê xwe de bihîst. Nikaribû bikişîne. Nuha dê çi bikira? Dê biçûna ku, xwe dê bispartana kê? Heya hestiyên wê bi evînê tije bûbûn. Ma birastî ji Ehmed hez nekiribû? Heger hez bikirana, bi mirina wî qiyma xwe dianî û ... Bi memo...

Derket derve. Dihejiya. Stêrk li nav hev ketin. Daketin ser Agirî û hilkişiyan. Agirî carekê ket û rabû. Stêrk û dengê Agirî di nav hev de wenda bûn. Qêrîn pêket û hilweşiya. Gulbahar bi hembêzek şewate ket hundur, dihejiya Agirî gur bû. Her diçû rûyê Ehmed xweş dibû û bi evîn dibû. Ehmed di xew de bû. Di evînê de bû yan wek miriyê westiyayî bû? Hindik mabû Gulbahar bifetise. Her ku dinêrî, rûyê Ehmed xweşiktir dibû. Agir gûr dibû, rohnî dibû, mezin dibû.Gulbahar perpitî.Dinê li ser wê doş dibû. Kevirên şikeftê bidengekî mezin deng derdixistin. Li derve stêrk difirîn û li hev diketin. Li derûdor deng derdiket. Qiyamet

radibû.

Bi carekê re çavên Gulbaharê tarî bûn. Di tariyê de tenê rûyê Ehmed... Destê Gulbaharê çû ser qebza xencera wî. Bêrawestin xencer li derna xist. Heya milê wê qerimî û nema kar kir.

Gava çavên xwe vekirin, roj hêdî hêdî rohnî dibû. Bayekî hênik, bêhna xweş li derûdor digerand. Gulbaharê li ser zinara hember, di nav gulekekî rohnî de rûyê Ehmed ê nîvtarî dît. Xwe avêt berbi Ehmed de:

"Ehmed, Ehmed, Ehmed, were were meçe... Ehmed, Ehmed, Ehmed!"

Dengê wê li hemî çiyayê Agirî hate bihîstin û vegeriya. Ji dengê vê aşît ketin geliyan. Çiya ji kûr ve hejiya.

Her ku Gulbahar ber bi wî de diçû, Ehmed ji wê dûr diket. Gulbahar radiwestiya ew jî radiwestiya. Gulbahar dimeşiya, ew jî dûr diket. Waha, waha hatin ser gola Kûpê Gulbahar, Ehmed di Gola Kûpê de wenda kir. Rûyên xwe girt nav destên xwe li ser axa gola Kûpê a qehwerengî rûnişt. Zîq, zîq li ava şîn a bîrqonek nêrî.

Ji wê rojê vir de, ên ku ji ber gola Kûpê derbas dibin, Gulbahara ku li ser golê rûniştiye, porê xwe yê reşê tarî biser pişta xwe de berdaye, dibînin. Serê wê di nav destê wê de ye zîq zîq li ava şîn dinêre. Hin caran di nav ava golê de Ehmed li ber çavên wê xûya dibe û Gulbahar dest û sînga xwe vedike, ber bi Ehmed de dimeşe û diqîre. "Ehmed, Ehmed! Tu jî li cîhê min bûna, te dê waha bikira. Bes êdî. were Ehmed, Ehmed, Ehmed!"

Gol dikele. Ehmed wenda dibe. Gulbahar wenda dibe çûkekî sipî têt, baskekî xwe li ava şîn dixe, dawiyê ji siya hespê tê ser golê û derbas dibe.

Her sal, gava kulîlkên biharê vedibin, li cîhan deng tije dibin, şivanên çiyayê Agirî ji çarmedor tên, kulavên xwe davêjin ser axa golê a qehwerengî û li ser wan rûdinin. Li

ser axa evîna hezar salan rûdinin. Gava rohniya sibê davêje, bilûrên xwe ji milên xwe dadixin, li sitrana xezeba çiyayê Agirî dixin û roava çûkekî sipî tê...

Li navsera çiyayê Agirî, di bilindahiya çar hezar û dused metroyan de golek heye. Jê re gola Kûpê dibêjin. Şivanên Agirî ên çeleng, çavreşê bi kul, girs xwedî tiliyên zirav û dirêj jî, berî avêtina tirêjên rojê li bin stêrkên Agirî, ên kom bûyî û bîrqonek, bilûrên xwe ji milên xwe datînin û dest bi lêdana xezeba çiyayê Agirî dikin.

Ev, ji avêtina rojê heya roava berdewam dike. Wê gavê, dema roj diçe ava, li ser golê çûkekî sipî û biçûk difire, doş dibe. Çûkê ku bi hemî hêza xwe difire, mîna birûskekê li erdê dikeve, dadikeve golê. Baskekî xwe li axa şîn dixe û radibe. Bi wî awayî sê caran lêdixe. Paşê jî difire, diçe, ji ber çavan wenda dibe. Di pey çûkê sipî re, şivan jî bîdeng yeko yeko, dido dido ji wê diçin, di nav tariyê de wenda dibin. Û Yaşar Kemal dest bi çîroka evîna Gulbahar û Ehmed dike.

Efsaneya çiyayê Agirî, berhemeke hêja ye. Û bi awakî helbestî hatiye nivîsandin.



**Weşanxana Çanda Kurdî**

ISBN 91 861 46 31 9